

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

hejmar 68 | 2017






- ◆ Civîna Bîrnebûnê li Darmstadê
- ◆ Asîmilasyon û rewşa zimanê kurdî di nav kurdên Anatolyayê de
 - ◆ Bermekiyên kurd di kûraniya dîrokê da
 - ◆ Klamên me

<http://apecpublishing.com>



GRANIAS TĀRAR



Weşanxaneya APECê



Roja rojnamegerîya kurdî 22 bihara navîn (nîsan) 1898

Rojnameya Kurdistan di sala 1898an de derketîye. Ev rojname di 22ê bihara navîn de dest bi weşanê kirîye. Loma 22ê bihara navîn wekî salvegera rojnamegeriya kurdî tê pîrozkirin. Li Kurdistanana başûr jî ev roj bi awayekî fermî wekî roja “Rojnamegeriya Kurdî” hatîye qebûlkirin. Ev rojname li derveyî welêt derketiye.

Rojnameya Kurdistan ji alîye **Miqdad Mîdhet Bedirxan** ve li Qahîreyê hatîye derxistin. Piştî **Miqdad Mîdhet Bedirxan** birayê wî **Ebdurrehman Bedirxan** dest bi weşandina wê kirîye. Rojnameya Kurdistan piştî **Qahîrê** li **Swîsrê** û **Londonê** jî hatîye derxistin. Hejmarê dawîya Rojnameya Kurdistan (no: 30-31) li 14ê bihara pêşîn di sala 1902an de derketîye.

Di dîroka weşangeriya kurdî de pîranîya kovar û rojname li derveyê

welêt, li sirgûnîyê hatine weşandin. Herçiqas îro, li welêt, bi pîranî li Kurdistanana başûr medya kurdî wek; radyo, televîzyon, rojname, kovar, kitêb û li ser înternetê, bi sedan kovar û rojname tên weşandin jî hê bi dehan, kovar û rojname li derveyî welêt têne weşandin. Yek ji wan jî kovara me, **Bîrnebûn** e ku îsal 20salîya xwe tije dike. Mixabin piştî 20 salan hê jî me nikaribû em li welêt ji ber rewşa siyasî bi riheî **Bîrnebûnê** biweşînin û belav bikin!

Roja rojnamegeriya kurdî li welêt û derveyî welêt bi semîner û kombûna hat bibîranin. Li **Stockholmê** jî li kitêbxaneyaya kurdî bi minasebeta roja rojnamegerîya kurdî **Dr. Magded Sapan** li ser *rewşa medyayê li başûrê Kurdistanê* û **Dr. Ekrem Önen** li ser *radyoyên kurdî di sedsala 20 û 21an de* gotarên hêja pêşkêş kirin.

Alî Çiftçî

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 68 | 2017

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Dr. Mikailî, Xizan Şilan, Memê Mala Hine,
Nuh Ateş, Seyfi Doğan, Mem Xelikan, Dr. Sozdar
Mîdi (E. Xelil), Mustefa Reşîd, Bavê Lezgin-Evdi
Hesqera-Ezman B, Durxaneya Cellikanî,
Dr. Zerdesh Haco, Tëymurê Xelil, Nurî Aldur

Adress

Navnişana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apetryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Têkili/Kontakt

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK • Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224


Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Bask: Apec-Tryck AB



Wêne: SvD

Ji mitinga li dijî êrişa teroristi li Stockholmê ya 7ê nisanê, 16-04-2017 li Sergelstorga Stockholmê

Wêneyên bergê: ji firca Lukman Ahmed

Berga pêşi: Diyaloga muzikî

Berga paşi: Zarok û helikopter

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.

Mafe redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

- Ji bîrnebûnê 6
Alî Çiftçi
- Erîşa terorîstî li Stockholmê 8
Alî Çiftçi
- Konferensa li ser kurdên Anatoliya Navîn 9
Nuh Ateş
- Ji bo serxwaşiyê li ba tora medya Rûdawê 11
Muzaffer Özgür
- Civina Birnebûnê li Darmstadê 12
Seyfi Doğan
- Ziyareta kitêpxana kurdî 15
Seyfi Doğan
- Asîmilasyon û rewşa zimanê
kurdî di nav kurdên Anatoliyayê de 17
Memê Mala Hine
- Hekata Hemê Mamê 25
Muzaffer Özgür
- Şopên dema xatirxwaztinê - VIII- 27
Nuh Ateş
- Wêne 30
Seyfi Doğan
- Kerme 32
Seyfi Doğan
- Mîna xewneke şeva 34
Nurî Aldur
- 37 Pêkenî- Serhatî
Nuh Ateş
- 39 Kum û bin kum
Nuh Ateş
- 41 Bipêşveçûna dîrokî ya zimanê kurdî
û hin taybetmendiyên wî yên xweser
Dr. Zerdeşt Haco
- 53 Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da-2-
Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)
- 56 Sîyarê Têrika -11
Dr. Mikailî
- 63 Kilamên me
Mem Xelikan
- 68 Dara Merxê çawa bû Dara Mestê?
Û Hamidiye an Celikan
Durxaneya Cellikanî
- 75 Xewa şevên serpas
Xizan Şilan
- 76 Roja gulanê
Seyfi Doğan
- 77 Kilama Elê Hecî
Bavê Lezgîn-Evdî Hesqera-Ezman B.
- 85 Gelkujîya ermenîyan
gelkujîya êzdîyan jî bû
Têmûrê Xelîl

Ji bîrnebûnê

Bihar wek destpêka jîyanê jî tê binavkirin, ji ber bi destpêka biharê re li ser rûyê dunê, her tiştê ku jîyan tê de hebe; xweza, darûber xwe ji nû ve direngînin, kulîlk bi rengên nu hêvîyeka xweş û geş didin jîyanê.

Kurd di bihara pêşîn de, bi hati-na Newrozê re biharê wek destpêka jîyaneka nû pîroz dikin. Li gel vê şahîyê mixabin, rojên me yên xemgînîyê jî dîsan di destpêka biharê, di mehên adar û nîsanê de hene ku divê em wek kurd hersal bi bir binin! Wek 16ê adarê, roja Helebçê, 14ê nîsanê, En-fala kurdên me yên başûr, 22ê nîsanê bi qirkirina ermenîyan re kuştin û malwêraniya kurdên me yên êzidî û di vê dawîyê de jî Şingal, Şirnex, Ciz-re, Lîcê u.h.d. hêjî kuştin, malwêranî, pênerberî û derbederî ji ber derîyê kurdan neçûye!

Ev hemû zilm û zordariya ku li ser erdê me dibe jiber bêtoleransîya nîjadên wek ereb û tirkan tê ku tahamûla wan ji tu bîrûbaweriyên din re tune! Di van salên dawî de bi rêxistinên radîkal ên îslamî, jîyan li Rojhilata Navîn tarûmar kirin û bi wê jî neman dewleta tirka ew komên radîkal li Suriyê û li Iraqê li hember kurdan pir bi kar anîn. Niha jî dîtin

ku ew bi wê jî bi ser neketin di van rojan de bi balafirên bê insan erdê kurdan li rojava û başûr bombebaran dikin. Dixwazin van destkevtiyên kurdan têk bibin. Bi van êrîşên hovane dijminîya xwe ya li hember kurdan pir vekirî nîşan didin.

Îro, kurd li cîhanê di rojevê de ne. Li seranserê cîhanê dewlet û millet nema ne ku dostaniya kurdan nekin ji derveyî cîranên kurdan; tirk, ereb û faris! Ji nav wan yê pir eşkere dijmintîyê dike û bêtoleransîya xwe nîşan dide dewleta Tirkîyê ye.

Li Tirkîyê referenduma ku di 16ê nîsanê de di rewşeka awerte ya mercên newekhev de bû bi rêjeyeka pir hindik, partiya AKPê û alîgirên "Erê" ji sedî 51.4 wegirtin û bi vê re demokrasiya ku bi nav hebû jî bi hîlbijartinê ji holê rakirin. Di vê referandumê de tiştê bo me giring ew bû ku li bajarên sereke yên Kurdistanê di vê rewşa dijwar de jî dîsan nerazîbûna xwe bi rêjeyeka bilind nîşan dan. Lê li nav kurdên me yên Anatoliyayê metirsiya ku hebû pir vekirî xuya kir. Li gor hîlbijartinên berê em dibînin ku xelkê me nikaribû bi raya xwe ya azad herin ser sandiqan. Ji metirsiya ku dê rastî êrîşên nîjatperestiya tirkan bibin, piranîyê gotin "erê".

Tenê bi kurdî

Di kombûna hevkarên Bîrnebûnê yên li Darmstadtê, di 18.02.2017an de biryar hat girtin ku zimanê kovarê û weşanên li ser înternetê, wek medya civakî û malperê tenê bi kurdî be. Birêz Seyfî Doğan bi sernivîsa *Civîna Bîrnebûnê li Darmstadtê* li ser kombûna hevkarên Bîrnebûnê nivîsiye.

Ew kesên ku kovarê dişopînin û dixwînin, dibînin ku ji destpêkê heta niha, sal bi sal kurdî zêde bûye, heta van salên dawî piraniya hejmaran tenê bi zimanê kurdî hatine weşandin. Ev helbet hem daxwez û hem jî hewildanek bû. Ji ber herçiqas îmkanên fêrbûn, pêşxêstin û parastina zimên zêde bûye jî di eynê wextê de têkçûn û asimilasyon û heta dereceyekê tirkîbûn jî di nav kurdên Anatoliyê de zêde bûye. Em vê rastîyê, rojane li ser medya civakî, di şîn û şahîyên xwe de dibînin û dijîn! Nimûneyeka biçûk: rojane her kurdekî ji Anatoliya Navîn dikare li ser facebookê vê nimûneyê bibîne. Niha bûye edet, her cara ku şîn an jî şahîyek dibe însanên me bi rêya facebookê ji hev re peyamên dilşikeştîyê an dilşahîyê dişînin. Ew peyam ji sedî 99ên wan bi zimanê tirkî ne.

Birêz Memê Mala Hine bi sernivîsa *Asimilasyon û rewşa zimanê kurdî li nav kurdên Anatoliyayê* ev metirsiya ku li jor min bi tirkbûnê bi nav kiriye, wî bi berfirehî şirove kiriye.

Ev hejmar jî dîsan bi nivîsên lêkolînî yên li ser dîrokê, ziman û folklorê û herwiha serpêhatî, yaranî û helbestan ve hatiye dagirtin.

Birêz Têymûrê Xelîl bi sernivîsa *Gelkujîya ermenîyan gelkujîya êzdîyan jî bû* bi têbînîyeka balkêş dest avêtîye bîrîneka kur ku bi salan e li ser pir nehatiye nivîsandin. Nemaze bi qirkirina ermenîyan re qirkirina kurdên me yên êzîdî û yên din ên wek "gayrî muslîm" hatine binavkirin, ji aliyê dewleta tirkan ve sistematîk ji 1915an heta 1922an ew kuştin berdeawam bûn. Ji ber êrîşên ku niha dîsan bi eynê dîtina wê demê, li ser kurdên me tê kirin, ev têbînîya birêz Têymûrê Xelîl girîng e ku bê rojevê.

Û yek ji musîbetên bihara îsal jî ew bû ku **Dr. Helin Burkay** di bûyereka trafîkê de ji aliyê du kesên beredayê de can da. Ji ber vê bûyerê hemû kurdên Swêdê, heval û dostên wê yên din xemgîn kir.

Dema me ev hejmara kovarê bo çapê amade dikir, dîsan bi xebereke mirinê, em xemgînî bûn; **Efe Özcan**, gundîyê min, heval û welatparêzê hêja ji ber nexweşîyeka dûr û dirêj wefat kir. Em li vir ji malbatên Helîn Burkay û Efe Özcan re dibêin; serê we sax be!

Lê dîsa jî bila bihara we bi xêr be.

Êrîşa terorîstî li Stockholmê



Şuna ku êrîşa terorîstî bû, Drottninggatan

Piştî ku pozîsyona DAIŞê li Suriyê û Iraqê kêmbû, êrîşen li ser bajarên welatên Ewropayê jî zêde bû. Ji bo ku li welatên Ewropayê, bêstîkrarî çêbe êrîşên terorîstî bi kar tînin. Di 7ê nîsanê de li bajarê Stockholmê, li ser cadeya Drottninggatanê jî bi eynê armancê êrîşeka terorîstî bi kar anîn. Pênc însanên bêsuç û bêguneh kuştin û bi dehan birîndar û seqet man!

Li ser van êrîşên terorîstî *Global Terrorism Index* rapor hazir kirine. Li gor rapora wan a 2016an; ji sala 2014an heta dawîya 2016an 50 600 kes li cîhanê bi terore hatine kuştin. Ji van, li dora ji sedî 85 hemû ji terorîzma misilmanên li welatên îslamî yê cîhanê de bûne. Perçeyek ji van, li welatên rojavayê (Ewropa) bi motîvên radîkalîzma îslamî ve hatiye diyarkirin.

Tenê sala borî nêzikî 10.000 êrîşên terorîstî li seranserê cîhanê û ji sedî 90 ji van êrîşana li welatên ku mafê mirovan hatine binpêkirin çêbûne, wek Iraq, Afganîstan, Pakîstan, Nîjerya, Suriyê: welatên ku rêjeyeka bilind şênîyên xwe mi-

silman in. Di van êrîşana de 18 000 kes hatî kuştin, ji van 14 722 kes ji wan pênc welatên misilman in. Li pey wan pênc welatan, yê din ku piranî kuştî lê çêbûne; Hîndîstan, Somalî, Filîpîn, Yemen, Tayland Kenya, Misir û Lubnan e. Dîsan li gor rapora *Global Terrorism Index a 2016an* ji sala 2012an vir ve di nav welatên OECDyê de êrîşên terorîstî li Tirkîye, Meksîka û Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê çêbûne.

Ji sedî 66ê van êrîşên terorîstî li cîhanê ji aliyê çar komên îslamî yê radîkal ve bûne. Ev al-Qaîde, Talîban, Dewleta Îslamî û Boko Haram e, li gor vê raporê.

Bi giştî li 60 welatan ji êrîşên terorîstî kuştin çêbûne. Ev jî nîşan dide ku teror zêde dibe û bi tundî li cîhanê belav dibe û belaya herî zêde jî li ser erdê kurdan e! Ji ber yê ku rû bi rû, sîng bi sîng li hember êrîşên van komên radîkal li başûr, bakur û rojavayê welêt sekinîne, kurd in!..

Ali Çiftçî



Brüksel: Konferensa li ser kurdên Anatolîya Navîn

Nuh Ateş

Li 27ê bihara navîn (nîsan) 2017an li Brukselê, paytexta Belçîkayê konferensek li ser kurdên Anatolîya Navîn hat çekirin. Konferens bi destê Platforma Kurdên Anatolîya Navîn (PKAN) û alîkariya Gruba Sosyalîst a Parlamentoya Awropayê, KNK û Enstîtuya Kurdî hat lidarxistin. Nunerên Parlamentoya Ewropayê, Josef Weidenholzer, Ulrike Lunacek, Costas Mavider beşdarî konferensê bûn û peyamê piştgirtîyê pêşkêş kirin. Nivîskarê lêkolîner Mehmet Bayrak, Vekîlmiletê HDP, Pirof. Kadrî Yildirim,

nivîskar Şoreş Reşî û Ahmet Gezer gotarvanên konferense bûn.

Gotara destpêkirina konferensê hevseroka PKANê, **Dîlan Biçer** pêşkêş kir. Xanim Biçer armanca konferensê wekî, “berçavkirina bindestitîya kurdên Anatolîyayê û derd û daxwazîyên wan û bi vî awayî pûçkirina sîyaseta hêlandinê”, bi nav kir. Daxwazeke di cih da ye, lê zimanê konferensê ne li gor wê bû. Çi heyf e, him gotara xanim Biçer û him jî zimanê konferensê bi tirkî bû.

Pirof. Kadrî Yildirim, di gotare xwe da behsa dîroka kurdên

Anatolîyayê, îskankirin û bicîhwarbûna wan li Anatolîyayê kir. Wî balkişande ser nivisarên Şikani û ew wekî kevntirîn jêderên bidestketî yên li ser kurdên Anatolîyayê binavkirin. Li gor gotara wî, modan kevntirîn eşîra kurd ya ku hatiya Haymanê ye û kurdan di sedsala 15an da gundên xwe yên sifte li wir avakirine.

Şoreş Reşî di dengkirina xwe de, got; “ji avûrûyê tevgera eşîrtiyê ya dorliwegirtî hêşyarîya netewî li ba kurdên Anatolîyayê pêşva neçûbû. Lê di saye pêşketina tevgera kurdî û belavbûna dezgehên ragihandinê da, hêşyarîyeke cidî ya netewî li nav kurdên Anatolîyayê peyda bû. Pir ferdên kurdên Anatolîyayê sewa vê canê xwe fedakirin.” Reşî ji saziyên Ewropayê xwest ku ew piştgirtîya mafê perwerdeyî û kulturî ji bo kurdên Anatolîyê bikin.

Peyivdarê PKANê, Ahmet Gezer derbarê armanca konferensê û xebatên PKANê da beşdarên konferensê hayadar kirin. Gezer got: “Birêxistinkirina kurdên Anatolîya Navîn, geşkirina kultura wan, xebata li dijî hêlandinê armanca PKANê ye!”

Nivîskarê lêkolîner, Mehmet Bayrak di konferensê da gotarek peşkêş kir. Bayrak behsa dîroka kurdan kir û amedekirina konferenseke weha erênî wesifand û rexne li tenggirtina çarçiveya tevlêbûnê girt. Ji bo konferensê weha di pêşerojê da, wî gerekîya tevlêbûna hemû aliyên pêwendidar, anî ziman. Bi vê va girêdayî, Bayrak qala kovara Bîrnebûnê û giringîya kar û xebatên wê kir.

Çavkanî: ANF Brüksel,
perşembe, 27 Nisan 2017



Dr. Fikret Yıldız

Muzaffer Özgür

Em wek kovara bîrnebûnê ji bo serxwaşiyê, li ba tora medya Rûdawê bûn.

Muzaffer Özgür

Me roja 24.3.2017an ji bo serxwaşî dayînê, buroya Rûdawê ya li bajarê Düsseldorfa Almanyayê ziyaret kir.

Wek tê zanîn karmenda Rûdawê rojnamevan **Şîfa Gerdî**, ji bo xeber û agahdariyan bigirê, li enîya şer a Musilê li ser şopên xwînxwarên DAÎŞê bû. Dema bombeyeka veşartî diteqe jî şehîd ketibû. Hevalê xwe kameraman Yunus Mustafa jî giran birîndar

bûbû. Şîfa Gerdî karmendeka hêja û jê hatibû. Ew sterka Rûdawê bû û di karûbarê xwe de bi serkeftîbû. Herroj bi rêya Rûdaw TVê li malên kurda bû, wek kesekî malbatê dihat nasîn.

Carek din ma serê karmendên tora Rûdawê, malbata Şîfa Gerdî, gelê kurd û malbata rojnamavanî ya kurdî sax be. Kameraman Yunus Mustafa re xwaşiyê dixwazin.

Şîfa Gerdî kî bû?

Malbata Gerdî di salên 1980yê de jiber zilma Saddam koçî rojhelata Kurdistanê dike. Şîfa Gerdî di sala 1986'da li Rojhelata Kurdistanê li gundê Zewe te dine. Şîfa Gerdî, di sala 2006 da Enstîtûya Teknikê ya Kompitorê xelas dike. Di sala 2013an de jî di Zanîngeha Selahaddîn de beşa ragihandinê xelas dike. Di sala 2006an de dest bi rojnamevaniyê dike. Navbera salên 2007-2010an mamostetî jî kiriye.

Çavkanî: www.rudaw.net

Civîna Bîrnebûnê li Darmstadê

2017-02-18

Seyfi Doğan

Dinê bi însanan şîrin e. Hele hele ew însanên ku mîrov demeke dûr û dirêj bi hev ra berhem peyda kirine û dikine. Ew berhemên ku jîyanê xelkî Kurdên Anatolîyê Navîn diparêzê û ji nêsilên ku werin re dokumentasyoneke dirokî, folklorî, çandî û zimanî miras cîhdîlê. Mala wanan heft caran ava be û lingên wanan li kervan nekevin pir gûne bibînîn.

Ez û Elî Çiftçi, em roja îne li balafirê sîwar bûn û me berîyê xwe da Frankfurtê. Rîya me gelek kin bû. Tabîi ya kin were. Em ketin nav sohbetên kûr û tîr. Me gelek pirsên dinê hal kirin. Eger, pîlot bi gurê ma bikira, demeke ku em di ser Baltikumê re difirîn, me xwest li wir bi pêya bibîn û problemên ku di nav Rusya û welatên Baltikum hene hebikira û dûra ma rîya xwe berdewamkira. Neysê, ew pirsê ma wexteke din.

Em tam di wextê xwe da li Frankfurtê bûn.

Nuhî Hecî Malê Herşîd, Yusuf Polat û Eyo berve me hatibûn. Ma-

la wanan ava be. Eyo, hevalê min î kevn î ji sala 1973 virda ye. Ji Wêranşehrê ye, Nuh, pixaltîyê min î delal û Usif Polat ji Xelka jêr e û emekdarê kovarê ye.

Em li erebê sîwar bûn. Eyo berve restaurana ku em lê şîvkinî ajot. Restaruang nezîkî cihên ku ez baş nasdikim e. Doralîyê Unîversîteya Johan Wolfgang von Goethe ye. Dema ku ez li Frankfurtê dijîyam, wan derana heremên jîyanê min bûn.

Sala 1973an hatim Frankfurtê. Dem, dema serhildanê cîvanên dinê û şerê Wiyetnamêyê yî wek agirê ku petîyê xwe bilind, dor aliyê xwe ronî dikir.

Di xanîyê Ewangelische studentenheimê ya ku li ser cadde Lessing Strasse da bû, timam.

Ji meşekê dimeşême meşekê. Ji-teacîngekê derdikevime dikevime cîvîneke xanî îşqal kirinê. Bi pîranî meş kedexa bûn. Dawîyê meşan, polis ji bo ku meşan belav bike, gaz û av bi kar dîna. Lê meşan dîsa jî berdewam dikirin. Piştî meşan li



Ji civîna Bînebûnê li Darmstadê

universîtê kom bibe û rewzê meşan binerxîne.

Di ber Menza kevne re derbas bûn. Dil û mêjoyê min zîz bûn. Bîranina xwe da kelekê min. Çi roj bûn. Herroj li ber derî menzê, bi hezaran belevok, ji alîyê partiyan û rexistina da dihatin belavkirin. Me jî belav dikir.

Rojên xweş, serhildan, berxwedan û hevîyên dewlemend hatin bîrya min. Rojên ku ji bo doza kurd û Kurdîstanê li ber xwe dida û li Universita Frankfurtê li aulê, cara yekem, seminêr li ser rewza Kurdistanê hate dayîn. Kursa zimanê kurmancîyê li Dietrich-Bonhoeffer Hausê destpêkir.

Dema cîvanîyê! Karîyêr û milk tu qiymetê xwe, li ba wan keç û xor-

tan tunebûn. Însanên fedakar bûn. Pîvangê fezilêtê yê wêk durustîyê, etîk, moral, cemerî û nefsbîçûkiyê hebûn. Ne wêk îro gewrî gemarî û nefsbirçî bûn. Agahdarî ji bo teach-in, meeting û kundgebung dihatin anons kirin. Jîyan hebû. Cîvanan dixwestin hebin û bifikirin.

Dema ku em katin hundirî restorantê ku Hesmenê Şemlî Zaxê Xoca yî di ber me, ji Berlînê hatiye. Xwe bi cîh kîriyê û qehve xwe vedixwê. Hesman birayê xanimê min e û li Berlînê dijî.

Piştî demekê Fikret Yildiz ji Duisburgê, Muzaffer Özgür ji Kölnê û Mustafa Mih ji Berlînê hatin.

Me henek û yarîniyên xwe kirin û xwarina xwe xwar û dev da berve otelê. Mala hevalên Almanya ava

be heqê xwarina me ji berîyân xwe dan.

Li otelê em gavekê li lobiyê rûştin û wexteke baş derbas kir.

Dora dinê re piştî taştê, em li ereban sîwar bûn çûn Darmstad, cîhê civînê. Darmstad, bajarekî nezîkî Frankfurtê ye. Ew jî wek Frankfurt li eyaleta Hessen e.

Mala dostên Elmanyayê ava be. Cîyê civînê û taştê hezîr kiribûn. Me bi hemdî xwe caran dudîya jî taştê xwar. Halî ku nexî heye!!! Çayê teze, penêrî sipî yê mîhe ya, nanê teze û zeytinên reş û dostaniya însanên colê. A terî baş dostaniya wan însanan û hewake aram bû. Wan însanan ji bo ku em rehet bikin, xwe ji me re kuştin. Di dora me gerîyan.

Dest xweş bin; Suna, Sultan, Bariş, Vahit û Milla û hvd!

Ji geyrî dostên din, Vahit, Heci û Ehsan ji teve civînê bûn.

Nuhî Hecî Malê Herşîd civîn îdare kir û Îhsan Türkmen jî katîbî kir. Cîvîn, bi dirustî gelek aram, intelektual, empatîk û bi rûnermiyê derbas bû. Însanên hişgehîstî ne. Na weng buya; Bîrnebûn bist salan berdewam nedikir û ew hevalana bist salan bi hevdi re wek şaxsên azad kar nedikirin û xebat nedimeşî.

Her kesî sempatiyê xwe yê sîyasî ji xwe re diparast û dîtinên xwe yê politîk dernedixistin pêş. Wana dizanî ku xebata zimên û nasnamê karakî sîyasî bi wesayîten cuda ye.

Konsepta Bîrnebûnê ya ku ji bo zimên û nasnamê bingehiya serkeftinê ye. Ew dikane ji gelek insanan re bibe nimune û rehber.

Civîne me bi dil û xetir qedîya. Me henek bîryar girtin. Ew bîryarana me di protokolêda nivîsandin.

Mala insanên colê ava be. Zîkê me bi nîvro jî, bi şîvên xweş têr kirin. Eee, zîkê me têr bû şunda, em edî diskinin. Me berî xwe berve Frankfurtê kir û di demeke kin em gehîştinî otela xwe.

Piştî îhtiyacan, em li lobby gehîştin hevdu û bi saetan li wir rûniştin û henek, yarinî, li ser zimên, serhevde û sîyasetê deng kir.

Dora dinê rê roja yekşemiyê, Mizefer, em bi erebe xwe gehandinî balafirgeha Farnkfurtê.

Mala hemîya ava be. Yusuf Polat cîhê otelê halkirî bû. Mizefer; bara giran li ser milên wî bûn.

Vahî, Sultan, Suna, Bariş, Mille û dostên colê mêwanparîyêke ji dilda em bextêwar kirin.




Ziyareta kitêbxana kurdî

Seyfî Doğan

Elî Çiftçî, ez 2017-01-21ê dewate Kîtêbxanêya Kurdî ya li Stockholmê kirim û got; li wir, Weşawxana APECê kîtebekê bide naskirin.

Kîtêbxaneya kurdî nêzîkî Stockholm City, li mehelêya Alvikê ye. Cîkî biçûk û şîrin e. Mirov dema ku wiqas kitêban li ser kurdan li kelekê hevdu dibîne şa dibe û xwebawerîya xwe bilind dibe. Ez herkî kîtêbxanê ziyaret dikim, kêfxweş dibim û hêvîya min ji pêşaroj re zêda dibe.

Berpîrsîyarê Kîtêbxanê Newzad Hîrorî însanekî pir nazîk û aram



e. Ji dil da ber ve me hat û çay û qehwe îkram kir.

Gelek însan hatibûn. Dorhêle-keke gelek samîmî û germ hebû. Ciwanên ku di kîtêbê da nivîsên xwe heyî jî hatibûn.

Piştî ku Elî Çiftçî, xêrhatin kir, mamostê kurdî, pêşdestî û berhevkerê kîtêbê Îhsan Espar, behsa armanc û metoda kîtêbê kir.

Piştî agahdarîya Îhsan Espar, nîrxandinan li ser kîtêbê berdewam kir. Minaqêşe, li gor min, ne li ser armanc û metoda kîtêbê bû. Mîneqêşe ne ewrimî û ne jî diyalektîk bû. Ew li ser metodên ku zimanên azad bi hezaran salan, bi zimanî xwe deng dikine û dinivîsîne û zimanên ku wesita perwerda û îdareyê mineqêşe dikirin.

Pêwîst e ku meri li ser minaqêşa bike lê çîh û dem jî bo kurmancîyê gelek mihûm e. Zimanekî ku xwe vejîn dike, divê mîrov bi pîvanên objektîv binêre.

Kîtêb, jî nivîsên xwendekarên Îhsan Espar amade bûye. Ew telebe jî her derê Kurdistanê û jî Anatoliyê Navîn hatine.

Ji bo min, naveroka nivîsan û metoda ku kîtêb bê hatîye nivîsandin hêja ye, lê ya terî hêja jî bo min, li vê rojê û merhelê bi kurdî nivîsandin e.

Bi kurdî nivîsandin, jî alîyê pisikolojîyê da, zordarîya kolonyalîst a ku bi salan mejoyê me felc û dinê li ser ruhî me teng kirî, berteref dike, dişkêne û xwebawerîya wan insanên ku bi kurdî dinivîsîn bilind dike.

Bi kurmancî nivîsandin, jî zîmanî xwe, war û jî nasnamê xwe hezkirin e.

Ji bo min fikra kîtêbêka weng û bi kurdî nivîsandin delal û giring e.

Neyar, bi salan jî bo ku asîmilasyon biserkeve, du ceza bi me hînkirin: Yek huqûq û dîn, sûc û guneh e.

Ya din jî ku dijmin jî bo asimilasyonê bi kar tîna û tîne, jî aslî xwe yî ku li ser zîman tê sazîkirin, nefretîkirin û jî nasnamê xwe yê netewî fedîkirin e.

Wan telebeyan, bi alîkarîya mamostê xwe, Îhsan Espar bi nivîsên xwe piştî neyar gehandine erdê û hewldana neyaran boşê derxistin. Pisikolojîya dijminê serdest peremparçe kirin.

Vê kîtêbê kîtebxaneyê me dewlemend kir.

Hûn her bijîn.

2017-02-20 Stockholm

Asîmîlasyon û rewşa zimanê kurdî di nav kurdên Anatolyayê de

Memê Mala Hine

Di vê nivîsê de ez ê ewil behsa têgeha asîmîlasyonê bikim. Gelo têgeha asîmîlasyonê wan dîyardeyên ku di nav kurdan de tê dîtîn û wan polîtîkayên zimanî yên ku di nav kurdan de ji hêla dewletên serwer ve tên birêvebirin, bi awayekî têkûz pênase dike an na? Ez ê li bersiva vê pirsê bigerim û li dewsa vê têgehê, ji bo pênasekirina qedexeya zimanê kurdî û ji navbirina çand û zimanê kurdî têgeheke din pêşniyaz bikim. Di beşa duwem a vê nivîsê de ez ê qala rewşa zimanê kurdî di nav kurdên Anatolyayê de bikim.

Destpêkê ez dixwazim behsa têgeha asîmîlasyonê bikim.

Destnîşankirina çarçoveya konseptî asîmîlasyonê, eşkerekirina paşxaneyî dîrokî ya wê gelek zehmet e. Belê, ev têgeh ji zimanê latînî ketiye nav zimanên rojavayî. Koka wê têgehê ji similo ango kopîkirin, teqlîtîkirin an jî şibandin e. Gelek manayên wê têgehê hene. Ev têgeh

ewil di bîyolojîyê de dûre jî di zanista civaknasîyê de hate bikaranîn. Têgeh di civaknasîyê de tê wê maneyê ku mirov xwe li gor civakê diguherînin ango xwe dişibînin civakê. Ango bi gotineke din manaya wê têgehê li gor civakê xweguncandina takekesan e. Bêtir jî ji bo wan penaber û koçberan tê gotin ku xwedî çand û zimanekî cihê ne û çand û zimanê civaka nû ya ku tê de ne hîn dibin.

Bêguman gelek modelên asîmîlasyonê hene ku gelek dewletên cihê bi rê ve birine. Lê em dikarin van modelan bikin du beş. Li gor modela beşa ewil a asîmîlasyonê divê ew kesên ku tên nava civaka nû, çand û zimanê xwe yê berê ji bîr bike. Ango li gor van modelan biserketina asîmîlasyonê bi jibîrkirina çand û zimanê berê tê destnîşankirin.

Berîya sala 1960'an li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê ji koçberan

dihat xwestin ku raborîya xwe biterikînin û nirx û normên çandî yên anglo-sakson bipejirînin. Heta demekê dewletên DYA, Kanada û Awustralyayê nedihîşt komên ku nayên asîmîlekirin (wekî çînîyan) koçî welatê wan bikin. Li gor modela duyem jî şert nîn e ku koçber çand û zimanê xwe yê berê ji bîr bike. Ya girîng ew e ku xwe li gor çand û nirxên civaka nû biguncîne. Ev model her ku diçe bêtir tê hilbijartin û birêvebirin.

Têgeha asîmîlasyonê bêtir ji bo takekesan an jî malbatan tên bikaranîn û ji bo neteweyekê nayê bikaranîn. Lêbelê têgeha asîmîlasyonê di nav kurdan de bêtir di maneya jibîrkirina çand û zimanê resen tê bikaranîn û ne ji bo tak an jî komek, lêbelê ji bo neteweyekê, angû ji bo neteweya kurdan tê bikaranîn. Dema ku em ji kurdekê/i re bêjin asîmîle bûye, ev yek tê wê maneyê ku ew kes digel ku malbata wî/wê kurd e, kurdî nizane. Angû têgeha asîmîlasyonê li gor modela duyem ku me berê behs kiribû nas dikin. Lêbelê kurd bi giştî çî li Kurdistanê bin çî li derveyî Kurdistanê bin vê têgehê ji bo jibîrkirina çand û zimanê kurdan bi kar tînin. Lêbelê li gor gelek vekoleran asîmîlasyon

ne di nav gelên ku li welatê xwe bi awayekî otokton dijîn de, di nav wan kes û komên ku ji welatê xwe diçin welatekî din de pêk tê. Angû em têgeha asîmîlasyonê ji bo wan kes û komên ku koçî derveyî Kurdistanê yên mîna Stenbol, Enqere, Şam, Tehran û welatên Ewropayê hwd. bûne dikarin bi kar bînin. Lêbelê em nikarin têgeha asîmîlasyonê ji bo kurdên ku li welatê xwe, angû li Kurdistanê dijîn bi kar bînin.

Li gelek welatên Ewropayê di bernameya asîmîlasyona koçberan de ji zarokên koçberan re hînkirina zimanê resen heye. Di van welatan de zanîn û bikaranîna zimanê resen wekî astengî li ber asîmîlasyonê nayê dîtîn. Heta di gelek lêkolînan de zanîn û hînbûna zimanê resen di rêjeya asîmîlasyona mirovan de wek taybetîyeke baş tê dîtîn. Lê belê li Tirkîye rewş cihê ye. Lewre li Tirkîyeyê polîtîkayên dewletê li ser jibîrkirina çand û zimanê kurdî ye. Dewlet hewl dide ku kurd, bi taybetî jî nifşên nû yên kurdan zimanê kurdî yan ji bîr bikin, yan qet hîn nebin û kurdî bi tu awayî bi kar neynin. Ji bo vê yekê jî dewlet rê li ber xebat û derfetên hînkirin û bikaranîna zimanê kurdî

li nîşên nû yên kurdan digire. Ji ber vê yekê mirov dikare bêje ku têgeha asîmîlasyonê qedexekirina perwerdeya bi zimanê kurdî, qedexekirina zimanê kurdî di nav sazîyên dewletê û nehiştina ziman û çanda kurdî di nîşên nû yên kurdên li Kurdistanê de rave nake. Ji bo pênasêkirina vê rewşê divê em têgeheke din bibînin.

Bi dîtina min jî ev têgeh jenosîd e û li bakurê Kurdistanê wekî tirkkirin tê pêkanîn. Bêguman ev polîtîka li Sûrîye û Rojavaya Kurdistanê erebkirin û li Îran û Rohhilata Kurdistanê jî fariskirin e. Ji ber ku niha li başûrê Kurdistanê kurdan gelek mafên xwe yên neteweyî bi dest xistine û ji mêj ve ye kurdên wî perçeyî bi zimanê kurdî perwerde dibin mirov nikare behsa erebkirinê li vî perçeyî bike.

Lê belê berê dewleta Iraqê polîtîkaya erebkirinê bi awayekî din bi rê ve biribû ku ji bo vê polîtîkayê peyva "taarîb" ango erebkirinê dihat bikaranîn. Armanca vê polîtîkayê jî erebkirina kurdan zêdetir erebkirina navçeyên Kurdistanî bû. Ji ber vê yekê niştecihên kurd yan bi awayekî girseyî dihatin kuştin wekî ku di Enfalê de qewimî yan jî dihatin

sirgûnkirin û li dewsa wan ereb dihatin bicihkirin. Polîtîkayê nêzî vê jî hêla dewleta Sûrîyeyê ve li Rojavaya Kurdistanê hatibû birêvebirin ku ev polîtîka wek "Kembera Erebi" dihat binavkirin. Niştecihên ereb ên ku li rojavaya Reqeyê di bin ava bendava li ser çemê Firat bimana li nav Rojavaya Kurdistanê wekî gund hatin niştecihkirin. Gelek erdên kurdan ji hêla dewletê ve hatin girtin û li van ereban hatin belavkirin.

Wekî ku tê dîtin armanca van polîtîkayan guherandina mirovan zêdetir guherandina demografîya Kurdistanê bû. Polîtîkayên wisa di serdema Împaratorîyeta Osmanîyan de li hember kurdan hatibûn bikaranîn. Bi taybetî jî li rojavaya bakurê Kurdistanê eşîrên kurd ji serdema Yavuz Sultan Selîm û şûnde ber bi deverên cihê hatin sirgûnkirin û her wisa li wan deveran eşîr û malbatên tirk hatin bicihkirin.

Dema ku em li polîtîkayên se-reke yên dewleta Tirkîyê û Îran û Sûrîyeyê dinihêrin, em dibînin ku dewletên navborî bi qedexekirina perwerdehîya bi zimanê kurdî û nehiştina bikaranîna zimanê kurdî di sazîyên fermî de hewl dide ku

kurdan li bakurê welêt bike tirk, li rojhilata welêt bike faris û li Rojavaya welêt bike ereb. Ji ber vê yekê jî bi dîtina min têgeha asîmîlasyonê vê rewşê nikare pênase bike. Di gelek lêkolînên akademîk de têgeha asîmîlasyon û tirkkirin wekî hev hatîye dîtin û bi hev re hatine bikaranin. Lêbelê bi dîtina min em têgeha asîmîlasyonê ji bo kurdên ku li derveyî Kurdistanê dijîn bi kar bînin û ji bo wê polîtîkaya ku armanca vê jinavbirina kurdan e bibêjin tirkkirin, fariskirin û erebkirin dê baştir be.

Ez ê niha derbasî beşa duwem a nivîsê bikim. Bêguman ew yasayên fermî yên ku li kurdên bakurê Kurdistanê û kurdên Anatolyayê hatine zalkirin mîna hev in. Lêbelê ji hêla asta bikaranîna kurdî ve di navbera herdu alîyan de cihêtiyeke berçav heye. Gelo sedemên wê çi ne? Em ê di vê beşê de li bersiva vê pirsê bigerin. Her wisa bi bawerîya min eger em van sedeman destnîşan bikin, dibe ku em taybetmendiyên kurdên li bakurê Kurdistanê yên ku xwe li ber polîtîkayên digirin destnîşan bikin û bi rêya van taybetmendîyan derfetên nû yên têkbirina vê sîyaseta tirkkirinê ava bikin.

Ji bo ku em rewşa zimanê kurdî di nav kurdên Anatolyayê de baş derxin holê, divê em hinek bala xwe bidin kurtedîroka wan kurdên ku li Anatolyayê bi cih bûne. Herçiqas çîroka koçberîya kurdan a ber bi Anatolyayê gelek kevn be jî, ew koçberî di demografiya Anatolyayê de guhertineke mezin nekiriye. Lê belê ew koçberîya ku di dawîya sedsala 18'an û destpêka sedsala 19'an de qewimîye mirov dikare bêje ku devereke kurdî îro dikeve navbera wîlayetên Enqere, Qonye, Kirşehîr û Aksarayê, pêk anîye. Her çiqas gelek eşîrên cihê yên kurdan di vê heyamê de hatibin Anatolyayê jî mirov dikare behsa sê eşîrên sereke bike ku piraniya kurdên Anatolyayê pêk tînin: reşvan, canbeg û şêxbizinî. Wekî ku tê zanîn reşvan û canbeg berê di navbera Semsûr, Meletî û Xarpêtê de bi awayekî nîvkoçerî mane.

Eşîra şêxbizinî jî ji navçeya Kerkûkê koç kiriye û piştî pêvajoyeke dirêj li wê devera ku dikeve navbera Haymana û Kuluyê bi cih bûye. Eşîra reşvan û canbegan kurmanc in, lê belê eşîra şêxbizinî li gor gelek vekoleran lek in. Heta di salnameyên Osmanîyan de eşîra şêxbizinî wekî ekrad-i lek

ango kurdên lek hatine binavkirin. **Eşîra reşvan û canbegan** û eşîrên din ên kurmanç ji bo zimanê xwe "kurmançî" dibêjin, lêbelê eşîra şêxbizinî ji bo zimanê xwe "kurdî" dibêjin. Di navbera herdu dîyalektan de gelek cihêti hene. Ji ber vê jî eşîrên kurmanç û eşîra şêxbizinî gelek bi zehmetî ji hevdu fêmdikin. Ji bilî eşîrên kurmanç û şêxbizinî li devera Aksarayê jî nêzî deh gundan Kurdên ku bi dîyalekta Dimilî qise dikin hene.

Bi giştî li Anatolyayê nêzî 300 gundên kurdan hene ku piraînya van gundan dikeve navbera Enqere, Qonye û Kirşehîrê. Li Enqereyê di navçeyên Polatli, Haymana, Bala û Koşhîsarê de, li Qonyeyê di navçeyên Cihanbeylî, Kulu, Yunak, Çeltik û Sarayonuyê de, li Kirşehîrê jî di navçeya Kirşehîr, Kaman, Çiçekdaği û Boztepeyê de, li Aksarayê, li Çankiri, Çorum, Yozgat, Tokat û Amasyayê jî hin gundên kurdan hene. Eşîrên kurdên Anatolyayê ku berê bi xweyîkirina pez debara xwe dikirin, heta dawîya sedsala 19'an bi temamî di gundan de bi cih bûne û piştî hêdî hêdî bi çandinîyê re mijûl bûne. Piştî pêşketina çandinîya bi makîna û pêkhatina derfetên kar a li bajaran,

bi taybetî jî ji salên 1960an şûnve ji gundên xwe çûne wan bajarên ku gundên wan bi awayekî îdarî girêdayî ne û her wisa çûne bajarên mîna Enqere, Qonye, Kirşehîr û Eskişehirê. Ji bilî vê, rêjeya kurdên Anatolyayê yê ku çûne Ewropayê jî zêde ye. Bi taybetî jî ji Cihanbeylî û Kuluyê gelek kurd niha li Ewropayê niştecih in.

Bêguman qedexa û astengiyên li ber zimanê kurdî li bakurê Kurdistanê bi awayekî fermî çawa be, di nav kurdên Anatolyayê de jî wisa ye. Lêbelê gelek faktorên cihê hene ku bandor li ser rewşa rêjeye axaftina kurdî di nav kurdên Anatolyayê de dike. Wek mînak, rêjeya koçberîya gundan ber bi bajaran di nav kurdên Anatolyayê de li gor bakurê Kurdistanê zêdetir e û ev yek jî bandoreke wisa dike ku asta bikaranîna zimanê kurdî di nav kurdên Anatolyayê de kêmtir bike.

Kurdên Anatolyayê deverên cihê yê Kurdistanê hatine û ji ber vê yekê jî devok û dîyalektên cihê yê zimanê kurdî di nav wan de tê qisekirin. Vê yekê jî bandoreke neyînî li ser asta bikaranîna kurdî dike. Wek mînak di navbera kurdên kurmanç, şêxbizinî û dimilî de zimanê ragîhandinê tirkî ye.

Di nav kurdên Anatolyayê de çanda medreseyên kurdî tune ye. Lêbelê heta dawîya sedsala 20'an jî li bakurê Kurdistanê medreseyên kurdî çalak bûn û mele bi zimanê kurdî karên olî bi rê ve dibirin. Heta gelek feqî û mele bi kurdî berhemên wêjeyî afirandine û van berhemên xwe gîhandine gel. Lêbelê di nav kurdên Anatolyayê de mele bêtir bi zimanê tirkî karên olî bi rê ve birin. Vê yekê jî bandoreke wisa kiriye ku asta bikaranîna kurdî kêmîr be.

Di nav kurdên Anatolyayê de çanda dengbêjîyê çî mixabin tune ye. Sedemên vê yekê cihê ne. Qasî ku em dizanin li wan deverên ku kurdên Anatolyayê jê koçber bûne çanda dengbêjîyê ne bi hêz e û her wisa li bakurê Kurdistanê çanda dengbêjîyê piştî ku kurdên Anatolyayê ji bakurê Kurdistanê koçber bûne, geştir bûye. Çanda dengbêjîyê di veguhastina ziman û çanda kurdî de ji bo nifşên nû de roleke gelek girîng bi cih anîye. Herçiqas çanda dengbêjîyê di nav Kurdên Anatolyayê de tune be jî, çanda stranbêjîyê di nav van kurdan de pêşketî ye. Stranbêjê navdar ê kurdên Anatolyayê Kurd Remzî, ango Remzîyê Elî Kino ku bixwe

ji gundê Bazikana bi ser Haymanayê ve bû, di salên 1970'an de stranên kurdî digotin û kasetên wî di nav kurdên Anatolyayê de dihatin guhdarîkirin. Kurd Remzî heta salên 1990an, ango heta ku wefat kir stranên kurdî, bi gotina kurdên Anatolyayê kilamên kurdî gotin. Di salên 1990an de gelek stranbêjên kurd ên mîna Serbulent Kanat, Bîlal Ercanê rehmetî, Koma Xelîkan, Îsmet Ornek, Nurretîn Çiçek hwd. dest bi gotina kilamên kurdî kirin. Niha bi dehan stranbêjên kurdên Anatolyayê bi awayekî aktîf stranan dibêjin û bi taybetî jî di dawetên kurdên Anatolyayê de stranên kurdî dibêjin.

Her wisa di salên 1940 û 1950'an de li piraniya gundên kurdên Anatolyayê de dibistanên seretayî hatine danîn û rêjeya xwendina di van dibistanan de gelek zêde bû. Vê yekê jî wisa kir zarokên kurd di temenên biçûk de hînî tirkî bibin û ji kurdî dûr kevin. Gelek malbat jî ji bo ku zarokên wan di dibistanê de serkeftî bibin hewl didin bi zarokên xwe re bi tirkî xeber bidin. Ji ber vê jî di nav gelek malbatan de ji ber bikaranîna zimanên cihê problemên mezin derketine.

Her çiqas kurdên Anatolyayê wekî girseyî û li devereke dîyar bi awayekî homojen bi cih bibin jî di nîveka pêşîn a sedsala 20an de hin eşîrên yoruk ên bakurê Torosan, bi taybetî jî yorukên alîyê Spartayê di navbera gundên kurdan de wekî gund hatin bicihkirin. Vê yekê bandoreke xirab li ser parastina çand û zimanê kurdî di navbera kurdên Anatolyayê de kiriye. Her wiha hin teterên ku ji Kirimê di nîveka sedsala 20an de hatine Tirkîyeyê di nav hin gundên kurdên Anatolyayê de hatin bicihkirin. Herçiqas ev teterên ku di nav gundên kurdan de hatin bicihkirin, hînî kurdî bûbûn jî tesîreke neyînî li ser parastina çand û zimanê kurdî kir.

Bajarên ku kurdên Anatolyayê lê bi cih bûne bêtir bajarên tirknişîn in. Ango zimanê bazarên wan bajarên tirkî bûye. Ji ber vê jî kurdên Anatolyayê li bajarên naçar in ku tîkîlîyên xwe bi zimanê tirkî daynin. Her wisa rêjeya zewaca bi etnîsîteyên din re, bi taybetî jî bi tirkan re li gor bakurê Kurdistanê zêde ye. Vê yekê jî wisa kiriye ku rêjeya axaftina kurdî di navbera kurdanên Anatolyayê de kêmtir be. Malbat carna naçar dimînin ji ber

bûk an jî zavayê tirk her tim bi tirkî bipeyvin.

Ji ber ku hêzên siyasî yên kurdan û sazîyên çand û zimanî yên kurdan li deverên ku kurdên Anatolyayê lê ne qels in, sazî û dezgehên hînkirin û lêkolandina zimanê kurdî gelek kêmtir in. Ew kursên hînkirina kurdî yên li bakurê Kurdistanê hene, çî mixabin li wan bajarên ku kurdên Anatolyayê lê dimînin tune ne. Vê yekê jî bandoreke wisa dike ku asta vejandina zimanê kurdî di nav kurdên Anatolyayê de kêmtir be.

Di vê navberê de em divê behsa hewlên vejandina çand û zimanê kurdî di navbera kurdên Anatolyayê de bikin. Yek ji van hewlên girîng kovara Bîrnebûnê ye. Ev kovar ji hêla hin rewşenbîrên kurd ên Anatolyayê ve di sala 1997an de hate derxistin. Ew kovar heta niha bi awayekî berdewamî ango 20 sal in tê derxistin. Di vê kovarê de gelek xebatên lêkolînî, folklorî û wêjeyî yên kurdên Anatolyayê hatin belavkirin. Ji ber vê kovarê rewşenbîr û entelektuelên kurdên Anatolyayê ji bo vejandin û pêşxistina çanda kurdî ya kurdên Anatolyayê roleke girîng bi cih anî. Her wisa di sala 2015an de li Enqereyê bi navê Komkurd-an

ango Komeleya Kurdên Anatolyaya Navîn komeleyek hate vekirin. Ev komele heta niha çalakîyên cur bi cur li ser çand û zimanê kurdên Anatolyayê bi rê ve dibe.

Di çend salên dawîn de li bakurê Kurdistanê hin deveran di dibistana seretayî de zimanê kurdî wek dersên hîlbijartî tîn xwendin. Li bakurê Kurdistanê dehan hezar xwendekar sûd ji van dersan digirin. Lêbelê li dibistanên wan bajarên ku kurdên Anatolyayê lê ne dersên kurdî wek dersên hîlbijartinê nayên xwendin. Dema ku xelk van dersan daxwaz dikin, rayedarên wan dibistanên nebûna mamosteyên kurdî wek hincet nîşan didin û vê dersê nadin xwendin. Va yeka jî bandoreke xirab li ser hînbûn û pêşxistina zimanê kurdî di nav zarokên kurdên Anatolyayê de dike.

Wekî serencam dikarin bêjin ku ziman hewza hemû nîrxên çandî yên gelan e. Dema ku ziman were jibîrkirin, ew hewz têk diçe û ew nîrxên çandî yên wî gelî jî ber bi deverên cihê cihê diherike û bi wextê re ji nav diçe. Ji ber vê yekê jî dewletên disthilatdar ên li ser Kurdistanê her tim li ber kurdî astengî danîne û wî zimanî qedexe kirine. Astengîyên li pêş zimanê kurdî yên ku li derveyî Kurdistanê hatine danîn mirov dikare wek asîmîlasyon bi nav bike ku ya ku di nav kurdên Anatolyayê de tê pêkanîn jî ev e. Lêbelê ew astengîyên li pêş zimanê kurdî yên li Kurdistanê jî wek beşeke sereke ya jenosîda kurdan ango li bakurê Kurdistanê tirkirin, li rojhilata Kurdistanê fariskirin û li Sûrîyeyê erebkirin e.

Pîrozbahîya 20 saliya
kovara *Bîrnebûnê* li Stockholmê
di 7ê payîza navîn(oktober)
li Restauranga **Parabolenê**,
Rudsjöterrassen 2, Haninge çêdibe.

Hekata Hemê Mamê

Muzaffer Özgür

Gundekî girêdayî qeza Haymana hebûye. Li vî gundî pir salan berê kesekî belangaz hebûye û navê xwe jî Hem bûye

Çiroka belangaz pir bi êş bûye. Bavê Hemê ji ber nexwaşiyêka giran dimire û Hem li ba apê xwe mezin dibe. Dibe xortekî bejn dirêj, bi aqil û dilgerm. Gundî ji Hemê gelek hez-dikin. Ew jî ji cîrana re karê rojana dike û tere pêzê wan. Şivanekî çoyê xwe yî qêm û xortekî ji xwe xaş e.

Hem li ber berî ya malbateka cîran û xismên mala bavê xwe her dem alikariya wan dike. Dema jinên malê li ber hevşoyê xwe pêz didoşin, Hem û keçika malê jî berîvantiyê dikin. Her dem çavên van li hev dikevin, dile van li hemberî hev germ dibe û dilê xwe dikeve keçika malê. Ji hev hezdikin.

Navê keçikê jî Cemîle bûye. Cemîle bejn zirav û por dirêj bûye. rinda gund, xezala dê û bavê xwe bûye. Di malê de li ser destan dihatiye girtin. Pir caran gundiya Cemîle ji malbata wê xwastine lê Cemilê nexwastiye, dê û bavê wê jî gotina û biryara keçika xwe dane berçavan û xazginî erê nekirine.

Çend dem û demsal derbas dibin. Hem û Cemîle hevûdu dibînin, destê didin hev û evîna xwe ji hev re eşkere dikin. Cemîle destmala xwe dide Hemê. Şora xwe dikin yek ku bihev re bigêhejin miradê zevacê. Hem xwe amade dike ku Cemilê ji malbata wê bixwaze. Hem ji çend jinepîrên cîran re evîna xwe eşkere dike û ji bo xwastina Cemilê alikariya wan dixwaze. Jinepîr radibin terin mala Cemilê û bi dayika wê re deng dikin. Dema êvar bû dayika Cemilê bitirs ji merê xwe re pirsê eşkere dike. Bavê Cemilê hers dibe û qebûl nake. Dibêje;

-Nabe ku em delala xwe bi şivanê xwe din! Qet nabe!

Çend roja bi şûnda bavê Cemilê bi hêrs radibe tere fêza gund, ba Hemê. Li Hemê belangaz heqeretiye dike. Hem li ber xwe dide ku bavê hezkira xwe bi sebir û dilxwaşiyê aş bike lê bi ser nakeve. Bavê Cemilê ji piştî xwe sîleha xwe derdixwe û dixwazê Hemê bikûje. Camerê belangaz li ber digere lê tu fedê nake. Hem edi bêçare dimê û daxwaz dike kû sîleha bavê Cemilê ji dest bigire ku pirs mezin nebe. Bilez xwe

davêje destên wî. Di nav di hevra çûyîne de Hem bavê Cemîlê dikûje. Bavê Cemîlê li erdê dirêj dibe û di nav xwînê de dimê. Hem şaşûmat dimê. Li ser çokan dikeve erdê û bi dengê bilind digirî. Hestirkên wî wek mîna baranê dibarin. Bê çare dimê. Bi dengê kurşinê gundî berva fêza gund dimeşin.

Hemê belangaz radibe û ji gund dûr dikeve, tere li qezê teslimî leşkera dibe. Hem li paytaxta welat tê ber dadgehê. Xwe diparêze. Hekata bûyerê bi girî ji dadgehê re eşkere dike. Li dawiyê 9 salan ceza lê tê birîn. Di hepsê de dimê. Apê Cemîlê jî bi erêkirina malbatê, wê dide mérékî din. Cemîlê dibê:

*"Hemê hemê Mamê
Bi şev tere bi roj tê
Qûrbana Hemî Mamê
Navî dilgirtiya xwe Cemîle ye."*

Neh sal, sîûşê demsal derbas dibin û rojekê Hem ji hepsa Polathîsarê derdikeve û te gundê xwe. Kesek vî nasnake. Tere ba merivên xwe dibe mevan. Xwe dide nasîn. Bi şîn û dilêşiyê hevûdu hembez di-

kin. Ji merivên xwe hekata Cemîlê dibihîze. Dilê xwe diêşê. Agir dikeve canê vî. Xwe ji mala davêje mala. Eşa vî kê nabe. Xwûşkên wî ji ber çavên vî dûrnakevin. Ap û xalanê wî jî li ber xwe didin ku alikariya wî bikin lê bisernakevin. Evarekê tifinga li oda malê de hatî lidarxistin heydine û tere fêza gund. Desmala Cemîlê dayibû ji berîka xwe derdixê li serî tifingê girêdide. Li şûna xwîna bavê Cemîlê disekine, li wir tifingê dide ber seriyê xwe û xwe dikûje. Xwîna Hemê diherike ser cîhe xwîna bavê Cemîlê, erd sor dibe.

Sibê malbat dibîne ku Hem li şûna xwe tûneyê. Şivanê gund meytê Hemê Mamê di nav xwîn, meş û mozan de dibînin. Xeberê didin gund. Gundî dimeşin berva fêza gund terin. Gundî bi bûyerê gelek xemgîn dibin. Meytê Hemê tînin gund û binax dikin. Xwanga Hemê gotiyê:

*Bira bira Hemo bira
Xwîna Hemê neqîtî ser kevira
Hemê birê min bûyê para gura
Kuçik no! we ji me xêr e?"
Di mala me de Zemîde û Deylak a wana⁽¹⁾*

⁽¹⁾Zemîde û Deylak navên du bûkên mala malbata Hemo ne. Ew ji malbata Cemîle ne. Çavkanî: jineka gund. Nexwast navê xwe bê nivisandin

ŞOPÊN DEMA XATIRXWAZTINÊ - VIII -

Nuhê Hecî Malê Herşîd

Hevgirtin (1)

Piranîya kesên li qismê ku Simo di firma Telefunkenê ya li Konstanzê da kar dikirin yad bûn; tirk, kurd, yugoslav, yunan, îtalîyan. Alman li vî qismî pir hendik bûn. Simo bi çend kesên din va parçeyên radyoya bi girbînê (bûyûtec) kontrol dikirin û yên bi xeta ji yên bêxeta vedidan û sewa bidûnê (tamirê) yên bi xeta nişan dikirin. Rojê heyşt seatan, bi girbîna li ber çavekî, ew li xetayên parçeyên radyoyê digeriya. Carina bi nîvyarenî di ber xwe da digot, „êz î bûme gerok; li kar li şaşiyên parçeyên radyoyan û li dervayî kar li nasnameya xwe ya netewî û li hevreyên doza azadî û sozyalîzmê digerime!“

Li cihê kar jî Simo xwe bi nasnameya xwe ya kurd dida naskirin. Lê heyf e ku pir kesan nedizanin kurd kî yan çi ne û welatê wan ku der e! Li qismê ku Simo lê kar dikir, ji almanan tenê yekî, ku navê wî Herder bû, kurd nas dikirin.

Ji ber ku wî kîtaba nivîskarê alman, Karl May a bi navê, “Durch Wilde Kurdistan” (Li Kurdistana Wehşî) xwandibû. Simo bi bihîstina hebûna kitaba Karl May ya ku wî ê paşê bixwanda, şa bibû. Herder bi eslê xwe almanekî ji Macarîstanê bû û barkiribû Almanyayê. Wî destê xwe bi ser Simo ra digirt, qîreta wî dikişand. Ew wekî leşker beşdarî şerê cihanê yê duduyan bûbû. Di vî şerî da, wî lingê xwe yê rastê hetanî textikê juni wenda kiribû. Ew bi ling û çîpeke ji text û hêsin pêdakirî birê diçû û li ser hêla çêpê dikûliya. Ew bi zehmet radibû û rûdinişt. Her ku Simo kûlîna Herder didît, dilê wî pê dişewitî, xwe dikire şûna wî.

Cara yekem bû ku Simo ji nêzik da bi malûlêkî şerê cihanê yê duyemîn va rûbirû dibû. Herder bi kûlîn û bi zehmetkêşîya birêçûnê li ba Simo abîdeyêke zindî a şer bû. Ew yek ji milyonan qurbanî û

zîyankêşên şerê cihanê yê duyemîn bû. Şerekî ku bi hejmara qurbanî û wêrankariyên xwe di ser şeran ra bû. Şahbêtarek bû ew. Kesên wekî Herder yên ku ji şerê cihanê zîyan dîtibûn li Konstanzê kêr bi ber çavan diketin. Ji ber ku ev bajar li ser li hududê Îswîçre ye û hududê bajarokê Îswîçre, Kreuzlingenê di nava Konstanzê ra derbas dibe, li herba cihanê a duduyan nehatibû bombebaran kirin. Loma li wir meriv, wekî li bajarên Almanyayê yên ku hatibûn bombebaran kirin, raste nîşanên avahiyên herifi û wêranbûyî û merivên ku destûling û piyên xwe wenda kirî nedihat.

Bi nenasî û bêhayîya derheqê hebûna kurdan û nasnameya wan ya netewî da Simo ber xwe diket. Li firmayê birek tirk, çend kurd ji tevê, bi xwenasandina Simo ya bi nasnameya kurd razî nedibûn û va wekî cihêkarî mitala dikirin. Bi gotin û fikrên han Simo dilşikestî dibû û pê heta dêv dihat. Ew bi mêranî li hember wan dadiwestî û di lêgerîna li nasnameya xwe da her ku diçû curetkar dibû.

Carcaran Memo û Simo diçûn serdana xal û birayê Memo yên ku li eynê bajarî di holika ku ji bo karkirên yad hatibû çêkirin

da diman. Cara siftê, çend rojan ji hatina Simo şûnda ew çûbûn serdana wan. Xalê Memo, Huso bi rêya resmî hatibû almanyayê û di firmayeke ku avahiyê da kar dikir. Birayê Memo, Oso wekî turîst hatibû û paşê li firmaya ku xalê wî tê da kar dikir bi şûn bûbû. Xalê, sewa ku Oso di firma xwe da bi cîh bike, gustilkeke zêrîni mîna udekê dayibû berpirsekî firmayê. Ji ber ve jî, Oso ji xalê ra bi midare bû, yeke wî nedirkir dudu. Xal û xwarzî pir caran rojên şemiyê jî dişuxilîn. Holika wan li perê bajêr bû û ji textan hatibû çêkirin. Li gorê ku dihate qalkirin meriv tê da havînan ji germa û zivistanê jî ji serma nedihêvîye. Wexta ku meriv dikete hundirê holikê û di meweynîyê ra bi rê diçû, texte dabanê dikirin qirçeqirç û çîrkeçîrk. Xalê Memo Huso û brayê Memo Oso di odeyeke biçûk da rûdiniştin. Li nava odeyê maseyek û du sendelye û li kenarê diwarên odeyê jî du nivînê karyolayî hewûn. Aşxane û hemam li der odeyê û hevpar bû. Simo û Memo li ser karyoleyan rûniştibûn.

Ji hal û xatir pirsînê şûnda, Huso berê qala hesreta welat kir û paşê jî çend şîretên xwe anîn ziman. Wî bi

gotinên xemlêbar yên ku pê dengê wî kelegirî dibû, destpê kir, got; „Xwarzîno, yadbûnê pir bi qahr e! Meriv li xerîbîyê mîna mesumekî bê war e! Li yad meriv bîra her tiştî, pirtir jî bîra germîya nivînê xwe yê li gund û bîra kur û kulfeta xwe dike!“ Gava ku van gotinên xalê bi guhê Oso ketin, ew di xeyalan da çû gundê xwe, ba hezkirên xwe. Jina wî û her du keçikên wî hatin ber çavan. Wî çav tijî kirin. Sewa kû hestiran nebarîne, wî palikên çawa rind jihevkişîbûn û bi giranhêjandina serî gotinên xalê tesdîq dikirin. Memo û Simo serî di ber da, bêdeng û neliv mîna ajcîyê li şînekê rûniştîbûn. Bistekê ji bêdengîya ji xeman barkirî şûnda, Huso keserek kûr kişand û dûv ra ji Memo û Simo ra got; „Lêêê, xwarzîno ji yar û waran dûrbûn derdekî giran e. Lê ne ji kesên mîna we ra. Hun ê bi tenî serî xwe ne, ciwan û berzewac in. Almanya xercê kesên mîna we ye. Heta ku ji destê wê tê bixwinin, bibin xwedîyê diploma û meslegan! Yek jî goştî xinzir mexin, heram e! Şîretên ku ez li we bikim vana ne!“ Oso dîsa bi serîbakirinê xal tesdîq dikir û bi rû da jî got, „şîretên ku xalê Huso dike di cîh da ne û wana

bi guhên xwe va kin, haaa!“ Pêçêk neçû, „Heqîqeten çima goştê xinzir heram e“ Simo pirs kir. Huso lêvegerand û got, „dîne me xwarina goştê xinzir men dike, çima ku xinzir nakayî û heyvanekî bi qilêr e û tiştên pîs dixwe,..!“ Simo xwe negirt û got; „Mîrîşkên me jî li gund ji nav gilûgemarê dernakevin û heta ku bi gû gihê dixwin û nakeyîn jî, lê em goştên wan dixwin!“ Pêçêkê bêdengîyê dagirte odeye. Huso rûyê xwe qerçimandin û di ber xwe da bi serîbakirinê nerazîbûna xwe nişan da. Oso, mîna ku xwastibe şorê biguhere, got „de bes e, wer in, em mewzûyê biguhêrin!“ û pê ra jî rabû ser xwe, rahîştê çaydankê û çay berda kaseyan.

Şeş mahen ji hatina xwe ya Konstanzê şûnda Simo heval û nasên Memo yên ku bi pêy dewa kurdan ketibûn ji nêzîk da nas kirin û êdî bû yek ji wan. Hefte carekê ew ji bo kar û xebatên siyasî, çandî û komeletî kom dibûn. Komeke piçûk ji kurdên Kurdistana Bakur yên li Almanyayê û piranî li bajarê Konstanzê berî pênc salan rêxistineke bidizî, bi navî „Hevgirtin— Rexistina Şoreşvanên Kurd“ çêkiribûn.

Almanya-Mainz, 13.03.2017

WÊNE

Seyfî Doğan

Wêne kîngê hatîye qeydkirin û kê qeyd kirîyê ezî nizanime. Wêneyî rengîn e. Rengên tabîî.

Payîza dereng an jî devebihar e. Şili û şapelî ye. Giranîyê objêyên wêne yê li aliyê rastê ne. Çîyayê ku di ser malan re xuya dike ser bi berf e. Li ber xanîyekî erebekê dawestîye û mêrekî li keleka erebê li ser linga ye û yekî wek xortekî li ber derî xanî ye. Derî xênî vekirîye ne weng bûya wîqas tarî xuya nedikir.

Erd ji baranê an jî ji berfê ku hêliye yî bi çamûr û şopên lastikên wasitên bi motor xuya dikine û şopên teze ne. Kîrîşên elektrikan û kabloyên di ser malan re xuya dikine. Xanî hene bi cati ne û henê seri bi coraxe girti ne.

Rewzêke xemgîn û bendewarî heye. Mij û dûman e. Ewrên dake-tine erdê. Tarî ye lê ne şev e. Wekî din bûya işikê lamban xuya bikirana. Kowboy film hûnî bîrya min. Bêdengîya berî teşkelê. Kowboy filmî yê ku şûnê hespan, bi taksî!

Erebe wek taksî xuya dike. Îhtimaleke pir nezîkî rastîyê ye. Li ser camê pêşîyê qereltiyekê mi-

na lewha taksîyê ye û li ser derî çepê aliyê şofêr nivis hene. Şoforê taksîyê bîyanî ye û mala ku herê an jî rîya gundekî pirsdikê û xortê li ber derî xanî guhdida ser dialogê di navbarê şofer û wî merî. Minak ew xorte dorê xwe dipê an jî wexte ku pêwîst bû teva şorê bibe. Meriyê ku li keleka teksîyê, ji xwe emîn xuya dike.

Wextê ku mîrov li şopên wasitên ku li ber xanî wedigerin mêsdike, ew xanîyê wek cihêkî taybêtî û pêwîst xuya dike. Kes li ortalixê tune. Deriyê xanîyê din ê hatine girtin.

Wêneyî, li Xelka Jor hatîye qeyd kirin. Navande gund û ber camîyê. Camîyê li ser pî çepê ye û xuya nakê. Parçekî ji kanîyê malê Şêxê yî li ser pî rastê xuya dikê. Nuha ew kanîya tune. Bi navî modernîzmê rakirin. Bi hezaran insanen serpehatîyên xwe li ser wê kanîyê hene û şahîda dîrokê gund in. Qeytanên nevbare dûh û îro qetîya. Îro sewî ma.

Ew xanîyê ku derî jeve, dîkana Uskî Umê ye. Ūsîf, tekeli bayî



bû. Wê wextê bes Êsif titûn, çay û şekir difiro. Gayrî wî, kedexe bû ku malî tekêlê bifirojî. Loma wiqas şop li ber dikanê hene.

Serpêhatiyên xweş hatin bîra min. Apoyê Fatê Qirê însanî kî pir yarancî û zekî bû.

Apo ji qargazî (keciboynuza) pir hezdkir. Lê, li gund tu dikanê nefiroşine. Çend caran ji xwediyên dikanên din û ji Usifî Malê Milomer re dibê jî feda neke. Ji ber ku cand bakalan, di wexteke da hûnin lê kesi nestand û bi ser dikancîyan da ma û jê zerar kirin.

Apo mêzedike ku ve yê wang nebê. Çend zarokan pere didê

û vê re dibê; herin bi wan perên qargazîya bistînin û perên alî jorî jî ma ê we bin.

Çend zarok terin û dest boş we-digerin. Birayê Êsif, Bektaşî Umê hevparê dikanê û mezinê Êsif e. Bektaşî wê rojê tesadûfên li dikanê bûyê. Bektaşî bi Êsif re dibê, çar-rak din tu çûyî bajêr çalek qargazî bikire. Êsif, daxwaziya birayê xwe venagerî.

Êsif, demek ku ji bo dan û standinê tere bajêr, çalek qargazî dikire. Ji Apo bitir kesî keciboynuza nakire. Apo bi dilî xwe kîngê îsteha xwe dixwaze qargazên ji xwe re dikire.

KERME

Seyfî Doğan

Roj, bê rûşwet û bêzehmet bû mêvanê taştê me. Dinê me dewlemend, roni û germ kir.

Min berê xwe berve rojê teze kir û got; Hamata, Hakhata û Hvarşta. Min tirejên rojê wek gulên biharê di seri xamimê da danan û germiye rojê bi can û ruhê xwe, ji kedexê Cem vewxar.

Serî sibê, li wê rojê teze yê dewatkar ku insanan bi hemdî xwe bextiyar dike, ruhê xwe li nav gund pixwes gerand û li bexcî rojê çavên xwe bi tîrêjên rojê şuştin.

Min çiyayên me yê aram û rûnerm temeşa kirin; çiyayên tazî, çiyayên ku bi şev mala şivanan û fêzên kariya. Çiyayên ku zinarên xwe berpalgîyê conan/dajonan. Çiyayên ku aşiqan ji dilda hembêz û veşêr dikin. Çiyayên ku zîndîyê xwe guh didin ser bilûrê şivanî bi tene û xeyalperest. Çiyên ku zîndîyê xwe, bi avê kanîyê bandê û bi curnên xwe avdikin.

Min dara sêva, darê hejasor, dara kîrazê û dara şefteliya nişan dayê û got, ew hemî meywê yên ku te xulk kirine. Binêre! Reng û şêklên

wanan, weng reng û şêklê te ne. Sor, zer û gilover. Roj, xenê bû û xwe li min pêça. Can û ruhê min rehat û germ bû. Ez î hîn di wê merhele da bûm ku dengê derî herime hat. Î hat ku, Hesmenê Sêmlî Zexê Xoca ye. Birayê xanimê min e. Porê wî yî sipî li piştê, îşlikekî gewr lê, wek ruhbanekî dine Mazdaizme bû.

Hesmên, li gor ditîn û bawerîya xwe dijî. Ji bîr û baweriyên însanên re hurmet fikir û dixwest ew jî, ji wî re hurmet bikin. Kinc û bergên wî li gor dilî wî bûn.

Dilî xwe dixwest bi îşlikekî dirî û Fotêreke hesirî ye qulqulkî li nav gund bigere. Ew ji bo xwe dijî û wek şaxis azad bû. Ji bo xwarin, vexwarin, jîyan û kincan neyî paşverî ye.

Min tenekê dereng ferq kir ku di bin çengî wî da kermekê heye.

Hela hela! Bi xwe û xwe fikrîm! Ew çî ye! Ewçî hal e!

Ne zivistan e ku tê bê em bişewtininî. Ne wexta mektebê ku tu ji mektebe re di bin çengî xwe kî. Gêrçî havîn e ji bo kinç şuştinê, bulgur kelandinê, serşuştinê û hwd

re jî kerme lazim dibûn. Wênêkî surrealîst! Xanimê min mat bû û bi ber xwe ket. Çiqas bê birangê xwe ye.

Min bi xwe û xwe got; wî hevda sist kirine!? Ahura Mazda li me hune xêr e!.. Vê, kele kele teboxê û va kerma! Xer e! şer e!

Ma sewêk, kes kermê nebîne, xanimê gelek li berxweda. Xwest kerme verşêke. Hesmên, li teras an jî cîhêkî ku kes nebîne bi cîh bike. Lê çî fêda...

Me bi çavên pirsker lê nerî lê tu tişteki anormal tune bû. Hesmên, dêmekî rewzê me yê fehm kiriyê ku î di bin simêlan re dikenê.

Hesmên dît ku em ê êndîşe dikinî, nîyête xwe aşîkar kir.

Kermê, di dîrok û folklorê kurdan da, role xwe yê teybetî heyê. Bi xezar salan kerman em germkirin. Em ji qilêr û gemarê parastin. Konê me ronî û warê me germ kir. Kanîya energîyê me bû.

Şevên zivistanê sar û dirêj, germ û ronî dikirin. Bereketa mala bû. Temele agir. Agir jî bingehê medenîyetê. Di dînê Zerduştî de agir qutsî ye û rojê temsîl dike. Hunê pir meraq dikine, ez hal hekatê kerme ji ve re qat kim.

Nuhî Hecî Malê Herşîd, xaniyê kî xwe yî ava kiriyê. Li gor dilî xwe. Ez jî herime mala wî xêrkime.

Ew kerme jî, xelate min ê ji bo malê wî yê.

Kerme sêmbolê germîyê, bereketê, hûzûrû û ewleyî ye. Ez î dixwazime mala wî him fîzîkî û him jî sosyal germ bibe. Wextên bextiwar, li mala xwe bi zar û zêcên xwe re derbas bikin.

Xenimê min şor heyne û got; tê bîrya we! Berê, bûkan kerme bi xwe re dibirin male xazura. Ji bo jîyaneke ronî û bextiwar.

Mîna xewneke şeva

Nurî Aldur

Dema ez ji xetên derve yên firokxaneyaya Ataturkê derbasî xetên hindirû/cihê firokeyên Batmanê bûm, dengê kurmançiya delal ya mentîqa ramîyan-torê, mina zengilê di sukra pezên ku havîna dihata ber avê, tanî bîra min. Jinên kurd li gel zarokan û kesên mezin li gel hev diaxifin û sohbetên ne dirêj dikirin. Bê goman eva ji bo kesekî an jî kesên ku li wir dijîn ne tiştêkî balkêş e û ne ecêb e jî. Lê bo min mîna refleksekê bû ku ez şîyar û agadar dikirim. Min her dixwest guhdarî bikim û dengê kurmançiya min î torê her werê guhê min û di hiş û mêjîyê min de rawestê (cîh bigrê) û xweşikêkê bidê laş û canê min.

Ew hîsên ku min di firokeyan Stambol–Batmanê de hîs dikir – di firoka nabeyna Stockholm – Stambolê de hîç min ferqnedikir, ji ber ku tenê dengê zimane tirkî di firokeyên de hakîm bû û evan hîsan helbet belkî jî tabîî be, ji ber ku piraniya kesên li vir dibê ku tirk bin! Min tiştêkî baş li vir dît ku tirkan a-

nonsa ku bi ”ladies and gentleman” her dem dihata gotin, îlawekeke nû kirine ku ew jî ev e ”dear children” û di vateya ku perspektîfa zarokan aktuel dikin û bê goman ev karekî pozîtîv û hêja ye. Xwezî di hemî awayên jiyana rojane de tirkan bikarîna ku perspektîvên human û demokrat xistibana jiyana kes û mirovan de.

Ez qala gera xwe ya bo yek hefte di bihara 2016an de bo Tirkîye û bakurê Kurdistanê dikim û di vê hefteyê de min kes û kusên xwe yên li Batman –Midyad/Mizîzex û Kertwênê (Kertwên 9-10 km nêzîkî Nisêbînê ye) dîtî û bi wan re sohbet dikir û hesreta salan derbasdikir. Ev 18 sal bûn ku min welat û welatîyên xwe nedîtibûn û bi vê gera min, min daxwazîke xwe yî xweş û muqades bicih dikir. Bê goman gelek tişt hatibûna guhertin; wek mîsal ez karim bibêjim ku gelek bînayên 6-7 qat li Midyadê wek tar û mahale hatine avakirin û ev fênomen bi xwe re maxaza û dikanên mezin jî

anîne holê, teknîkeke bilind (elektirik, assansör, telefon/digital) ketîya xizmeta însanan û helbet ev proseseke baş e û pêwîste jî. Lê gelek tiştên/ guherînên ecêb û negatîv jî ketine jîyana kesên me û mîna norm têne qabulkirin: li her tar û mahalên Midyadê mînareyên bilind, lokalên /enstitûyên (mîna dersxane, qurankursî) dînî hatina çêkirin û tirseke bê hidûd ketîye serî û dilên kesên me ku ewan mîna gêjan kirine. Helbet her dem ew kesên jêhatî/zana û bi cesaret wê hebin û niha jî hene – lê li gor analîza min ewan kesan pir pir kêr in û mina min berê jî got ne xeletî û sucê civaka me ye – lê sîstema hişk û gran wa kirîye ku kesan gelek qûral û adetên xwe yî aslî binpêkirine û mîna bayên ku berê wî ne dîyar e ku bi kuve ye, her diçin û dijîn. Sîstema olî û malxerabî dest û rayên xwe xistine nava mal û malbatan, nav tevgera aborîya kes û gruban ku ewan kesan/gruban/civakan bûne esîrên olî/dînî an jî pasîv in û mîna kerr û gêjan li wan hatîye. Xizmeka min jî min re weha got: ”di vê bîna me de 16 malbat hene; 11 ji wan hevalbendên partîya olî ne û 5 jî yê partîya kurdan in”. Hîngî min jê pirsî, erê xatuna delal ma tu çilo dizani ku ev tişt weha ye

û wê bersiva min weha da: ”em jin li gel hev diaxivin û pevra didin û distînin” û min dîse jê pirsî ku ma gelo ewan hevalbendên partîya olî çî dibêjin ku çima ewan piştgirîya partîya olî dikin û xizma min got ku ”ewan dibêjin ku serokê wê partîyê/ serokkomar misilmanekî xwedê ye”. Û da ka vêce bibêje ku merov wê çî îzah û analîzên din bikarê bike: dîsa dîn û îman – dîsa ol û quran û disa bi vî navê xwedan hîle, xap û derewan, mîna demên 1800-1900an û mîna niha vê dema 2000an.

Li gundê min Mizîzexê (8 km nêzîkî Midyadê ye) ez mêvanê xizmekî min î ku salên wî dor 80î ye bûm û li dora me çend kesên din jî hebûn û vî xizmî pirseke weha ji min kir: ”ma çî aqilê we yê li Awrupa jî vê sîyaseta dewleta me digrê?” Û hingê jî şerên xendeka li Nisêbînê germ û gran bû û gelek nas û xizm ji Nisêbînê koçkiribûn/hatibûna Midyadê û Mizîzexe û li vir bi cih bûbûn û rewşeke gelekî melûl û dilşewatî li vir dîyar û xwîya dikir. Mi xwest bersiva pismamê xwe bidim û min weha jê re got: dewlet me, kesên li va deran mîna dijminan dibîne û ev tê wê wateyê ku mesela dijminatîyê ye û ne tiştêkî din e. Pismamê min hew

hîç axivî û yek gotineke din jî hew got. Helbet çima nexwest berde-wam bike min fam nekir, lê dibêt ku ne li benda bersiveke weha bû, an jî ji hinek ji wan kesên li civata me bûn, ne êmin bû an jî belkî se-bebeke din hebû ku ez nizanibim. Ez dixwazim vê bibêjim; ku welat û gelê me di bin sîyaseta mêtîngerîyê de ye (kolonyalîzm) û eva bi xwe re belengazî/hejarî – tîrsa fizîkî/psîkî, bê norm û adetan diafirîne. Xebata dijî vê sîyasetê ne hêsan e û ne jî karê amatorîyê ye. Bê goman çare ne teslîmbûn an jî devjêberdan e – çare ew e ku em li gelê xwe vegerin û bi rêxistinî û bi metodên zanyarîyê (modernîzm: bi awayên teknîkî, hûmanîstî û demokratî) organîze bibin û xebata xwe li gund û bajaran û li hemî derên welêt bikin û hêvîyan bidin kes û merovê me – civaka me/gelê me.

Piştî ku ez vegerîyam Swêdê û li gel malbata xwe axivîm/sohbet kir – bo wan qala xizim, dost û rewşa welat kir û bersiva pirs û dîtînan wan dan û bo demek kurt hizirîm ku ma gelo rastbû ku ez çûme bakurî Kurdistan / Warê bav û kalan-nav heval û dostan/can û canan? Û dema ku ez bi xwe tenha dimam, xwe bi xwe dihizirîm û min ji xwe di pirsî ku

ma gelo rast e ku ez çûbûme welêt? Belê, rast e ku ez çûme welêt û ev hemî rezalet û nexweşîyên ku min di wan heft rojan de dîtînan – realîte ne û ew jîyana me kurdan e – lê divê ez vê jî bibêjim ku ev gera min î bi lez û bez û hem xweş û hem nexweş car carna ne mina ku rastîkek be hîsdikim. Ez ev gera xwe mîna **xew-neke şevan** dibînim.

Têbînîyêk: min 4ê nîsanê li gel xwarzê Latîf – xizmê min Silêman teslîmî neweşxana Batmanê kir, lê wî jîyana xwe malesef di nav destên doktorên me yê Amedê de ji dest da – cihê te bihişt be Silêman û serê malbat û gelê te sax be. Piştî 18 salan dîtina Silêman berî koça wî ya dawî dîse jî bêhnferehikek da min.

Ez çar şevan li mala Silêman bûm û di dema ku me sohbet û gotubêjên dirêj ta derengê şevan li ser rewşa me kurdan dikir – wî carek weha got: ”dibe ku tirk hemi daxwazên kurda qabûlbikin, lê ewan tucarî xaka/axa Kurdistan bernadin û wê qabûl jî nekin ku navê Kurdistan çêbibêt”. Û va ye gotina Silêman li gor wî û bo wî jî rast derket – ji ber ku wî azadî û xweşîya Kurdistanê nedît û çû ser heqîya xwe.

Oxirbe, Silêmanê delal!

PÊKENÎ – SERHATÎ

Nuh Ateş
nuhates@web.de

cezayê serî

Di salên heyştêyî yên sedsala rabirtî da, hikumeta alman bi şerdeke bertîlê (tazmînat) teşwîqê li karkerên yad (xerîb) belav dikir. Çima û bi çi şerdê? Bi şerda ku karkerên yad (xerîb) yên bêkarmayî Almanyayê ji ebediyê ra terk bikin û vegezin welatê xwe. Lê piraniya vê bertîlê heqê karkeran bi xwe bû. Bi gotineke din hikumetê perên bêkartîyê yên ku karkeran distandin bi avakî komkirî û çend kurûş ji didan ser û li wan belav dikir. Mesto yê ji kurdên Anatoliyayê jî hîngê ji vê imkanê istifade kiriye û devê şorê ye, bi berîya germkirî, Almanya ji ebediyê ra terk kiriye. Pir kesên din jî mîna Mesto ji vê imkanê istifade kiribûn û heqê xwe kuştibûn û Almanya ji ebediyê ra terk kiribûn.

Neh û deh sal derbas bûne, Mesto pere teva kirine. Bi gotina wan derên me, wi avêtîye fîtê. Ew porûpoşman bûye ku ebedî vegeziyaye. Wî lomayên giran li xwe dikirine û bi mistan li junîyên

xwe dixistiye. Bi kutan bi serî xwe va didaye û digotiye “serîyooo û serîyo, tu di herdê reş ketiyo, min ji avûrûyê te da pir çile kişandin û Almanya xwe ya wekî zêr ebedî terk kir!” Rojekê jî, mîna ku ceza bide serîyê xwe, çûye berber, porê xwe kur kirîye, serî daye ustureye. Dûv ra çûye ser dawetekê. Hen kesan mês kirine ku Mesto serîyê xwe î reqûrût kiriye. Jê pîrskirine û gotine, “Mesto te serîyê xwe çima ver kiriye!?” Mesto lêvegerandiya û gotiye; “Min ceza da wî! Ji avûrûyê wî da, min Almanya terk kir û xwe û malbata xwe perîşan kir. Va cezaya ji wî ra hendike bilem!”

qula ofisê

Ofisa ziraetê bo teşwîqê pere belav dikirine. Gundiyar diçûne ji ofisê pere distandine. Yên ku diçûne ofisê, serê xwe di gîşeya ofisê ra dikirine û pere distandine. Çelo jî rojekê bi nasekî xwe va çûye ofisê û bûye şahîdê vê. Mês kiriye yên ku tên serî xwe radidine gîşeya ofisê û pere distînine. Ew çerxe nasê xwe

bûye û jê ra gotiye: “Ezî xêrnêdî me, min carekê serîyê xwe di qulê ofîsê ra raneda!”

Gurê bi xêr

Li gorê ku qal tê kirin, Çelo bi birayê xwe, Hecmistefê va di nav hewla jihevcihêbûnê da bûne. Tevehev 25 mîyên wan ên ku ji bavê da mayî hewûne. Çelo dixwastiye ku parvakirina wan bi avayekî adilane yanê bi du parên wekî hev bibe. Lê va jî bi zehmet bûye. Hecmistefa birayê mezin bûye. Hînge yê mezin tim dixwastin ku para

wan tozikê ser ya piçûkan ra be û para zêde bikeve histê wan. Çelo li ser vê meselê ketiye nav fikir û mitaleyan ka ew ê vê hing û şer 25 mîyan çing li hev adil parva bikin. Va mesela jê ra bûye xemeke giran, ditirsîye ku di navberê wan da nerindîyê çê bibin. De tu ware, di vê navbarê da, şevêkê gur ketiye nav pezê wan mîyek jê biriye. Çelo çing va bihîstiye xenê bûye û gotiye: “Ha ku ez bi qurbana wî gurî bim, em ji şerê bira parastin!”

Almanya, 11.04.2017

Bang

Bi minesebeta 20 salîya kovara Bîrnebûnê, hejmara bê dê hejmareka taybet be. Loma jî em ji hevkar, nivîskar, hevalbend û aboneyên kovarê hêvî dikin ku hûn dîtînen xwe li ser kovarê ji me ra bişînin. Ev dîtînen we dikarin ji bo pêşeroja kovarê ji me re bibin alîkar. Em ê bikaribin kovareka hîn bi rêkûpêk û li gor pêwîstiyên hene, derxînin. Ev dikare nîvrupel an rûpelaka kovarê be. Rexne û dîtînen we dê hem kêmasîyên ku hene kêmtir bike û hem jî me serwest bike.

Editorên kovarê

Kum û bin kum*

Nuh Ateş
nuhates@web.de

Gotin û bûyer hene, ew bi xwe ne muhim in, lê ew, pir caran bi axaftin û rexnekirinên li ser wan, balkêş dibin. Gotina keça Rafsanjanî Faîzeyê yêke weha bû. Fayîze bi bavê xwe va hatibû Tirkîyeyê. Wê di xebardana xwe da got; „Rewşa Tirkîye wekî ya dema dawîya şahtîyê ye.“ Tiştêkî balkêş di vê gotinê da tune. Lê ew, ji ber ku medya û kemalist pê bi hêrs ketin û rexne lê kirin, bi qîmet bû.

Mesaj di gotina Fayîze da çi ye? Ew dixwaze ku bibêje, Tirkîye, demeke ne dûr, dê derbazî rejîma îslamî bibe, ango xelas bibe! Na can im, ma Îran xelas bû? Na, ew ji destê zorbazêkî filitî û kete hembêza yekî din. Şah ne bi rû bû. Ew, bi kinc an rabûn û rûniştinên xwe, „modern“ bû, lê bi kirin û fikirinên xwe diktator bû. Rejîma şahtîyê totalîter û zorbaz bû. Şah qîmet dida şahtî, kedxwarî, pere, sileh, şahbanû û şahşahîyê. Demokrasî, heq û edalet, wekhevîya millet û komikan di şahnama wî da tune bûn. Şah li hember Kurdan jî pir zilimkar bû.

Wî Kurdên serî sivik, bi gotinên wekî „Kurd û Faris bira ne, ji kok da yêk in û Arî ne“ dixapandin. Kurdên milletperwer û azadîxwaz jî didan kuştin.

Paşê dezgeha wî hilweşîya. Dû ra Meleyên serî pêçayî û rû berdayî hatin ser têxt. Wana jî zû dest bi zorê kirin û rejîmekê totalîter saz kirin. Bi navê Xwedê û Quranê hîn jî fermanê kuştinê didin. Sala 1979an li Îranê helbijartin çêbû. Kurdan jî wekîmiletên xwe helbijartin û şandin parlamena Teheranê. Lê Meleyên kevneperest wekîlîya wan qebûl nekirin û bo wan fermana kuştinê dan. Pê ra cihad êlan kirin, leşker û pasdar berdand ser Kurdan. Mele Talaganî, hîngê xweş bû, wekî meleyekî bi aqil dihata nasîn. Wî, wê demê, gotibû „Keştîyên cengê bajon ser Kurdistanê.“ Bimbarêko, ji Quranê bêtir tu tişt nexwandî bû. Li ba wî Kurdistan derya bû. Meleyên Îranê, di warê zorbazî da ji Şah nediman, heta ji wî derbaz bûn. Zorbaz zorbaz e, ha serqot û bi kincên Ewropî, ha serpêçayî û bi cilên Îslamî.

*Ev nivîsa min, bîst sala di ber vê, li tarîxa 1-7/02/1997an, di rojnameya hefteyî, HEVÎ da hatibû weşandin:

Şah zorbazekî bê îman bû, Mele zorbazên bi îman in, ma çi ferq heye? Kurdan ji her duyan jî xêr nedîtin.

Çîroka Antoîne de S'aînt-Exupery ya bi navê „Mîrê Piçûk“ meşhur e. Di beşekî wê da, di derheqa „kerameta“ kincan da, weha tê gotin: „Seyaroka ku Mîrê Piçûk jê hatiye, Astroyîd B 612 ye. Va seyaroka cara siftê, di sala 1909an da, ji aliyê astronomekî Tirk va, bi dûrbînê, hatiye dîtin. Wî, wê demê, di civîna astronoman ya navnetewî da, beyannameke dirêj li ser îcata xwe pêşkêş kiribû. Lê kesî, ji ber sebebên piçûk, bawerîya xwe bi wî ne anî bû. Çima ku kincên wî kevn an ne baş bûn. Merivên mezin weha ne. Dîsa jî şansê parastina nav û dengê Astoroyîda B 612 hebû, ji ber ku diktatorekî Tirk ji xelkê xwe ra fermana kuştinê dabû, ger ew kincên Ewropî li xwe neke. Astronom di sala 1920an da beyanname xwe, vê carê bi kincên Ewropî, car din pêşkêş kirîye û vê carê her kesî heq daye wî...”

Çi ecêb e, ne? Ehmeqên ku, mîna diktator û mezinên di çîroka „Mîrê Piçûk“ da, qimeteke mezin didin kinc û sembolan, li Tirkîye pir in. Ma keramet di cil-coran da ye? Astronom, îcat û beyanname wî yên berê bûn, tenê kinc hatibûn guhertin. Van ro-

jan li Tirkîye mineqêşeyên giran li ser pirsên wekî gotina Fayîzeyê, pêwendiyên Muslum û Fadîmeyê, cilên Acizmandîyan û daweta Erbakan bo serokên terîqetan çê dibin. Hinek dixwazin bi vî awayî bernama Tirkîyeyê ya rast şelî bikin, biguherin.

Hakimekî, Acizmend ji salona mehkemeyê derxistine. Ji ber ku cilên wan ne li gora qanuna „cil-cor û şebqan“ bûye. Vana ji cilan çi dixwazin? Berdin, bila azadîya kinc bijartinê hebe û her kes li gor a dil û cuzdanê xwe kincan li xwe ke.

Him Kemalîst him Îslamîst, qanûnen wan yên kincan hene. Her du jî, her çiqas dijî hev bin, di pir alîyan da nêzikî hev in. Her du jî totalîter in û qimetek mezin didin îdolojî û dogmên hîşk. Demoqrasî, wekhevî, mafên merivan û azadîya fikirî û cûretiyê di deftera wan da tune. Ewan li ser qeyda yêk tîp insan, yêk tîp îdolojî û yêk tîp kinc dimeşin. Yêk dibêje Tirk nijadekî bi qîmet e. Yê din dibêje olê îslamê bi rûmettir e. Bi kum an bê kum, keçel keçel e! Axa axa ye, ha bi şal-şapik, ha bi qirewat û fotir! Keramet ne di kum û ne jî di kum guhertinê da ye. Merifete w e ku bin kum bê guhertin!

Kumê Kemalîst û Îslamîstan ji hev cûda ye, lê bin kumê wan yek e!

Bipêşveçûna dîrokî ya zimanê kurdî û hin taybetmendiyan wî yên xweser

Dr. Zerdeşt Haco

Daketina nav mijarê

Berî ko ez dakevime nav naveroka vê mijarê, ez dixwazim destpêkê giringiya ziman weke nasnameya çanda gelan bi giştî û weke nasnameya gelê kurd bi taybetî bênime ber çavan.

Ez dixwazim vê yekê bêjim, da ko mirov bipêşveçûna dîrokî ya zimanê kurdî, û hin taybetmendiyan wî yên xweser baştir têbigihe, gava em zimanê xwe û zimanine di bidine ber hev.

Bêgoman em li ser wê yekê li hev dikin, ko ziman stûna çanda gelan e. Ziman ne tenê nişana çand û welêt e, ew ji bo naskirina nasnameya mirovekî ji cihê ko ew lê mezin bûye jî, giringtir e.

Ji ber ziman bi dirêjbûna jiyana me ji me venaqete, heta gava em bê çare ji welatên xwe birevin jî, û li koçberiyê jî bijîn, ew bi me re dimêne û dest ji me naberde.

Di heman demê de ziman dîrok û pêşeroja gelan e.

Ew dîroka gelan e, ji ber tenê di rêya zimên re em dikarin li raman û bîr baweriyên pêşiyên xwe binihêrin û dîtînen wan di berhemên wan î ko bi ziman hatine nivîsîn de, binirxênin.

Û ziman pêşeroja gelan e, ji ber tenê bi rêya alavê ziman gel dikarin bernameyan ji jiyana xwe yê li pêş re deynin.

Êdî mirov dikare bêje, ko gel para mezin bi zimanên xwe tene nas kirin.

Ev encama ko em gehîştinê, dikare bi taybetî ji gelê kurd re bê gotin. Ji ber îro ne dewleteke Kurdan î serbixwe heye, ya ko Kurd pê bêne nas kirin û ne jî ew xurû ji yek dînê taybetî ne, ko ew bi wî bêne nas kirin.

Vêce ji ber ko ziman taybetmendiyeke wiha serbixwe ye ji nasnameya neteweya kurd re, ew di dîrokê û di dema niha de jî, tim bûye armanc ji hêrişên dagîrkerên welatê Kurdan re.

Belê pêşî ez dixwazim werime ser têgîna „Zimanê Kurdî“ û bipirsim, ka gelo wateya vê têgîne çi ye?

Ev pirsra ha ji destpêkê ve xwe davêje ber me, ji ber dewleteke Kurdan nîn e, heta ko mirov yekser bêje ev ziman yê vê dewletê ye.

Êdî ji ber sedemên siyasî di dîroka Kurdistanê de ne dewleta Kurdan û ne zimanekî kurdî yekgirtî û bilind heye.

Li aliyê din pirsra ko zimanekî kurdî serbixwe heye, û bi ser zaravên xwe yên tével de ji zimanên din bi sînor e, di vê navê de bûye rastiyeke zanistî û êdî herkes vê yekê dizane.

Li ser vê rastiya ha ji sedsala 19an û heya roja îro, heme bêje, hemû zanyarên zimên, yên ko li ser zimanê kurdî nivîsî ne, di yek baweriyê de ne.

Ji ber xizmayetiya teng di navbera zimanê kurdî û zimanê farisî de, berê baweriyek hebû, digot, ko zimanê kurdî zaravek ji zaravên Farisiya Nû ye.

Di pişt re zanyarine ewropî navdar, weke Maurizio Garzoni, Albert Socin, Peter Lerch, Alexandre Jaba, Hugo Makas û Ferdinand Justi bi nivîsên xwe yên zanistî derketin û dane xuya kirin, ko xizmayetiya di navbera zimanê kurdî û zimanê

farisî de ne bihtir e, ji xizmayetiya di navbera zimanê farisî û zimanên din î hindo-ewropî de.

Peter Lerch di berhema xwe de, ya bi navê „Forschungen über die Kurden und die iranischen Nordchaldier“ 1857 li ser xizmayetiya di navbera zimanê kurdî û zimanê farisî de wiha nivîsiye:

„Herdû qurmên zimanî (ango qurmê zimanê kurdî û qurmê zimanê farisî) ji hev gelekî dûr in, belê wan gelek çeng, mil û çiqulîk hilgirtine, yên ko du malan ava dikin. Endamên van herdû malan xwe ji hev nêzîk dikin û êdî ji hev têdigihin“

Bi vê yekê Peter Lerch dixwest bide xuya kirin, ko di navbera hin zaravên zimanê kurdî, û bi taybetî devokên Kurmanciya Başur û zimanê farisî de, bihtir ji hin devokên Kurmanciya Bakur û Farisî de, xizmayetiyeke meztir heye.

Hin, "zimanzanên" tirkan, bi awayekî çewtezanistî hewldidin, ko serxwebûna zimanê kurdî nayînin bikin.

Raperestê tirk Bedrî Noyan sala 1982an di gotareke xwe de li ser peyva „Kurd û Kurdên Tirk“ ev yek nivîsiye: „zimanekî bêbingeh, zimanekî tevlihev, zimanekî ko bi

gelek awan hati be cûtin, peyvên wî weke kêstekên ko ji her alî ve hati bine ba hev.“

Belê ev hewldanên han di cihana şarezayên zimanan de bê bawerî dimênin, ji ber ew bi rengekî hişkere dibine alavên propogenda derewan ya dewleta tirk li dijî hebûna zimanê kurdî û bi vê yekê li dijî hebûna gelê kurd.

Ka li hember vê em li baweriya zanyarekî elman î navdar, yê ko li zanîngeha Essenê xebat dikir, temaşe bikin.

Vî zimanzanê elman, Prof. Dr. Johannes Meyer-Ingwersen di vê biwarê de nivîsiye: „Ev yek bi rastî dêmagogiyê xurû ye, gava li Tirkîyayê tim tê gotin, ko bi xwe kurd ew eşîrên tirkan in (tirkên çiyayî), yên ko bi demê re „farisiyêke xirabûyî“ wergirtine.

Ya pêşî, zimanê kurdî zimanekî serbixwe ye, û ya didiwan, kurd û zimanê kurdî hê bi demeke gelekî dirêj berî tirkan di wî cihê de ne.

Dîrok bi zîzî bervajî vê dîtina tirkan e. Di dema ko rojavayê Enedolê (bi rêjeyî dereng) hate tirkkirin de, zimanê xwecihê navçeya kurdan hê berî hatina êlên tirkan serbixwe bû“.

Di derbarê rêzkirina zanistî ya zimanê kurdî de divê mirov bêje, ko

zimanê kurdî zimanek ji zimanên bakur-rojava yên koma îranî ya malbata hindo-ewropî ye.

Û bi vê yekê ji zimanên hawîr xizmayetiya zimanê kurdî tenê bi zimanê farisî û zimanê ermenî re heye.

Zimanê tirkî û zimanê erebî, heryek ji wan ji malbateke dûr î di ye.

Di navbera van hersê zimanan de tenê dan û standineke guhestina hin bêje û rewşên rêzimanî heye.

Li vir divê mirov bêje, ko giraniya ko zimanê erebî ji dema misilmankirinê ve li zimanê kurdî kiriye (çawa ko li gelek zimanên dî jî kiriye) ji giraniya ko hin zimanên din li kurdî kiriye, meztir e.

Nebûna zimanekî kurdî yekgirtî û bilind îro rastiyeke şîndarî (xembar e) ye, divê em wê bipejirênin.

Bi ser wê de gelek zaravên zimanê kurdî yên herêmî û jihevçida hene. Û bi ser vê de jî gelek devokên xwecihî yên her zaravekî hene.

Ev rastiya rewşa îro encama dîroka siyasî ya gelê kurd e.

Mercên rêzanî (siyasî) di dîrokê de rê ne dan, da gelê kurd li ser xaka welatê xwe dewleta xwe ya neteweyî ava bike û piştgîriya bipêşveçûna zimanekî kurdî bilind û neteweyî

bike. Zaravên zimanê kurdî kîjan in û li kîjan herêman têne axaftin?

Zimanê kurdî parçeyek erd ji nêzikî 500 000 km² himbêz dike.

Sînorê başur ji bakurê Kendava Farisî dest pê dike, hildikişe bakur û di ber wilayeta îranî Ezirbêcanê re dipere, di beşekî biçûk ji komara Ermenistanê re derbas dibe, di Erzerûmê re diçe Sêwas û Mereşê li rojava, xwe digihîne Afrîn û Hîşiça li başûr-rojave diçe başur û di Şingal, Mûsil, Badrê û Şuster re dîse vedigere bakurê Kendava Farisî.

Li ser hijmara mirovên ko bi zimanê kurdî diaxivin tu serjimêrên zîz û fermî nîn in, lê tê gotin, ko hijmara axêverên kurd digihe 40 miliyon kesî.

Zimanê kurdî yan jî zimanê kurmancî, çawa ko kurd zimanê xwe bi nav dikin, li ser du zaravên sereke tê parve kirin. Di her zaravêkî sereke de çend devokên xwecihî hene.

Zaravên sereke

Kurmanciya bakur û kurmanciya navîn in. Xeta Urmiya, Rawendûz, Hewlêr dikare weke sînora di navbera van herdû zaravên sereke de were temaşe kirin.

Bakurê vê xetê piraniya Kurdan (ji derveyê navçeyên Bîngul û

Dêrsimê) bi Kurmanciya Bakur diaxivin, başur-rojhilatê vê xetê piraniya Kurdan bi Kurmanciya Navîn diaxivin. Kurmanciya Bakur bi xwe jî 3 beş in:

1. Kurmanciya herêmên Dihok, Hekarî, Cizîr û Şernexê, yên ko bi navên badînanî, bayezîdî û botanî têne bi nav kirin. Ji devoka van herêman re mirov dikare devoka botanî bêje.
2. Kurmanciya herêmen Ûrmiya, Şingal, Sêrt, Amed, Batman, Mêrdîn, Hîşiçe, Efrîn, Riha, Agrî, Qers û kurmanciya kurdên Qefqasiyayê. Mirov dikare van devokan bi navê devoka şingalê bi nav bike.
3. Kurmanciya herêmen Dîlok (întanb), Semsûr (Adiyeman), Mereş, Sêwas, Erzingan û kurmanciya kurdên Xurasanê. Ji van devokan re mirov dikare devoka Mereşê bêje.

Kurmanciya kavîn, bi gelemperî devokên wê yên herêmî ev in: sineyî, silêmanî, erdalanî, kerkûkî, germiyanî, hewlêrî, soranî, mukrî, şarbajêrî û pijderî.

Zaravên tenişt yên zimanê kurmancî

Di zimanê Kurmancî de du komên din yên zaravan hene.

1. Kurmanciya başur, devokên wê yên herêmi bi gelemperî ev in: feylî, kirmanşanî, lekî, kelhorî, xaneqînî û lorî.

2. Kirmancî (ya ko bi şaşî navê Zaza lê hatiye kirin) –Goranî

a. Kirmmancî

Ev zaravê zimanê kurdî heta niha bi awayekî şaş û nezanistî hatiye bi nav kirin. Kurdên ko bi vî zaravî diaxivin, ji xwe re nabêjin zaza. Gava ew bahsa zimanê xwe dikin, yan dibêjin, **zonê me** ango zimanê me, û yan jî, **kirmancî** dibêjin.

Li gelek deveran kurdên ko bi vî zaravî dipeyivin dengê ş(sh) dixine s û dengê j dixine z.

Ne gelekî dûrî baweriyê ye, ko kurdên bi kurmanciya bakur diaxivin, ji ber vê diyardeyê ji wan re -bi tinazî– *zaza* dibêjin.

Mirov ji vê rastiye bihtir nêzîk dibe, gava mirov zanibe, ko kurdên kirmanc ji kurdên ko bi kurmanciya bakur diaxivin re, *here-were* dibêjin.

Vêce heke bi rastî bêjeya *here-were* weke navê gelê kurd ji kurdên kurmanciya bakur re were pejran-

din, hingê mirov dikare bêjeya *,zaza'* jî ji kurdên kirmanc re bipejirîne.

Bi gotineke dî, heke bi rastî bêjeya *'here-were'* navekî dîrokî û zanistî ye beşekî ji gelê kurd be, hingê *,zaza'* jî navekî dîrokî û zanistî ye beşekî dî ji gelê kurd e.

Her weke vê, bêjeya *,dimilî/dûmilî'* jî ya ko hin vî zaravê kurdî pê bi nav dikin, ne zanistî û şaş e. Ji ber dimilî navê êleke kurdî ye û ne navê zaravêkî kurdî ye.

Li aliyekî din hin kes ji vî zaravê kurdî re *,kirdkî'* dibêjin.

Ev peyva *,kirdkî'* jî ne peyveke dîrokî ye. Hin zimanzanên kurd, yên ko xwestine xwe ji bêjeya *,zaza'* rizgar bikin, peyva *,kirdkî'* nû danîne.

Ji ber vê yekê wê ya rast ew be, gava em kurd bi xwe di axaftin û nivîsên xwe de dest ji bêjeyên *,zaza'*, *,dimilî'* û *,kirdkî'* berdin û li şûna wan bêjeya *,kirmancî'* ji vî zaravê kurdî re bidine xebatê.

Vêce kengî me peyva *,kurmancî'* bi kar anî, hingê em li ser hemû zaravên zimanê kurdî dibêjin, ango *kurmanciya bakur kurmanciya navîn, kurmanciya başur* û *kirmancî-goranî*.

Û kengî me got, *,kirmancî'* hingê em li ser zaravê *'kirmancî'* dibêjin,

yê ko heta niha bi çewtî zaza, dimilî û kirdkî jê re hatiye gotin. Heta ko ev rastiya ha xwe di nav hemû kurdan de bide pejrandin, divê beşek ji kurdên başur (Îraq) jî, yên ko bêjeya ‚kirmanc‘ bi giştî li şûna ‚kurmanç‘ dibêjin, xwe ji vê bawerîya me nêzîk bikin.

Zaravê kirmancî bi xwe jî li ser du koman beş dibe:

1. Devoka Dêrsimê (kirmanciya rojava) û
2. Devoka Bîngolê (kirmanciya rojhilat)

Ev herdû devokên zaravê kirmancî ji nêzîkî sê milyon kurd ve li van herêmên Kurdistanê têne axaftin:

Dêrsim, Bîngol, Elezîz, Xerpût, Maden, Palo, hawîrê Amedê û li Siwêrekê.

Bi ser ko herêmên ko kirmancî û Goranî li wan têne axaftin, dûrî hev in jî, xizmayetiyek di nav herdû zaravan de heye.

Ev jî mirov dikare bi wê yekê şirove bike, ko berê axêverên herdû zaravan li yek herêmê dijîn, û bi sedema hin bûyerên dîrokî, êline kurdî ji wan, yan bi dilê xwe, yan jî bi zorê cihê xwe berdane û li herêmine din î Kurdistanê niştecê bûne. Derbarê rewşa wêjeya nivîskî ya zaravê

kirmancî de mirov bipêşveçûneke li ber çav dibîne. Nivîskarên kirmanc berê berhemên xwe bi kurmanciya bakur dinivîsandin, belê îro ew li zaravê xwe xwedî derdikevin, pê dinivîsin û wî bi pêş ve dibin.

Ev jî cihê şehnazîyeke mezin e, ji ber bi vê yekê ew vî zaravê kurdî yî xweş, yê ko mixabin li ber tîrsa çûnê ye, rizgar dikin û xezîna zimanê neteweya kurd pê dewlemendtir dikin.

b. Goranî:

Devokên zaravê ‚goranî‘ li navçeyên Hewraman, Zengene û Kerkûkê têne axaftin. Kurdên kakeyî jî bi devoka goranî diaxivin.

Devoka ‚goranî‘ berê weke zaravê wêjeyî dihate bi kar anîn.

Ew bibû zimanê bilind û nivîskî yê Mîrevaniya Erdelanê û demekê bûbû zimanê bilind yê Mîrevaniya Baban jî. Hin helbestvanên navdar ên kurdan weke Xaneyî, Qubadî û Mewlewî berhemên xwe bi vî zaravî nivîsandine.

1. Bipêşveçûna dîrokî ya

zimanê kurdî

Binyata zimanê kurdî

Herwekî min li pêş jî da xuya kirin, ji derveyî her sê parêzgehên başurê Kurdistanê, yên ku hê serxwebûneke

tijî nestandine, zimanê kurdî bi giştî bê dewlet e.

Ji aliyekî dî ve ne ji berjewendiyên mîriyên dewletên dagîrker e, ko bihêlin lêkolînên zanistî li ser zimanê kurdî werine kirin.

Bêhtir ji vê, ew di rêya hevpeymanên xwe yên siyasî û çandî re giraniyê li dewletên derveyî jî dikin, da ew guhê xwe nedine çanda gelê kurd û bi vê bihêlin, ko ew were ji bîr û winda kirin.

Heta ji dest mîriyên dewletên dagîrker tê, ew nahêlin beşên Kurdologî li xwendegê û zanîngehên welatên derve jî werine vekirin. Çi gava mîriya dewletekê bixwaze, beşekî Kurdologî li zanîngeheke xwe veke, dewletên dagîrker, dengê xwe radikî û dibêjin, hûn xwe tev kar û barên hindirê dewleta me dikin, hûn piştgîriya parçebûna welatê me, ango ‚Seperatismus‘ dikin û ev yek li gor zagonên navneteweyî qedexe ye.

Ji ber vê yekê, heta roja îro ne li Kurdistanê, û ne li derveyî Kurdistanê xebateke zanistî ji dîl li ser zimanê kurdî nîn e.

Ew zanyarên derveyî û bêhtir yên ewropî, gava bixwazin bi serê xwe li ser ziman û çanda gelê kurd xebatekê bikin, rastî gelek dijwariyan tên.

Ew di zanîngehê de dijwariyan ji aliyê sorokê beşê xwe ve û ji aliyê serokê zanîngehê bi xwe ve dibînin, ji ber serokê zanîngehê bi şalyarî, ango wezaretê perwerde û lêkolînê ve girêdayî ye, û ji xwe diyar e, wezaret, ango mîrî/hikûmet diravê zanîngehê dide û bi vê yekê ew biryara hebûna vî yan wî beşê zanyarî li gor berjewendiyên dewleta xwe dide.

Wekî dî ew zanyarên ewropî, yên ko dixwazin bi serê xwe li ser zimanê kurdî bixebitin di çapkirin, weşan û firotina berhemên xwe de rastî gelek çetnahiyan tên û ew di tevayiya civakê de mirovine yekane dimênin û nayêne pejrandin.

Li aliyekî dî li vir yan li wir hin zanyarên ewropî derdikevin û li tembûra dewletên dagîrker didin, ango dixwazin bi navê zanyariyê li gorî dilê mîriya dewleta trik bêjin, ko zimanekî kurdî serbixwe nîn e, û weke ew dibêjin ‚zazakî‘ zimanekî serbixwe ye û ne zaravekî kurdî ye û bi vî awayî ji siyaseta dewletên dagîrker re dibine alîkar.

Mixabin ew mirovên kurd, yên ko xwendinên xwe yên ziman zanyarî li zanîngehên welatên derveyî bi dawî anîne, ne di wê rewşê de ne, ko weke tê xwestin, rojê ji 6-8 seetan

lêkolinên xwe bikin. Zanyarekî li zanîngehê xwedî kar karê xwe bi xebata xwe ya zanistî dibe serî, û êvarî vedigere malê xwe, xwe vedihesîne, da roja dî dîse kari be berhemên li ber çav bide.

Zanyarê kurd divê here, rojê 6-8 seetan li derve, ne di beşê xwendina xwe de kar bike, da mercên jiyana xwe pêkbêne û gava vedigere mal, dixwaze bi wê hêza xwe ya mayî berhemeke zanistî bide.

Ji ber vê rewşa ha em dibînîn, ko zanîna me ya îro li ser zimanê kurdî gelekî kême e, û gava em dixwazin li ser dîroka zimanê kurdî binivîsin, berî hertiştî em pala xwe berdidin ser encama xebata zanyarên sedsala 19an ko yek ji wan Ferdinand Justî ye, yê di wê baweriyê de bû, ko hin nîşan hene, dihêlin, em bawer bikin, ko zimanê kurdî zimanekî kevin e, û heye, ko ew ji zimanê mêdî hati be.

Justî di pirtûka xwe de, ya ko wî sala 1880yê li St. Petersburgê di bin sernavê “*Kurdische Grammatik*” de da weşandin, nivîsiye:

"Ne dût e, ko di wan peyvan de kevnariyeke zimandarî mêdî, ya ko wekî dî wînda bû ye, xwe parasti be."

Herwekî vê rojhilatnasê navdar Vladimir Minorskî di xebatên xwe

yî zanistî de giha bû wê encamê, ko girêdaneke zimanê kurdî bi Mêdiyan re heye.

Wî li gorî baweriyaya xwe nivîsiye, ko zaravên kurdî di nav xwe de yekîtiyeke wisa peyde dikin, ya dihêle mirov bigihe wê baweriyê, ko ew zarav bi tevayiya xwe zimanekî taybetmend û serbixwe, yê ko gelekî (miletêkî) mezin û giring weke Mêdiyan pê diaxivî, ava dikin.

Belê li gorî asta zanyarî ya îro, ya ko dibêje tenê 12 peyvên mêdî li ber destê me hene, û ew ji navê gund û deveran in, mirov nikare bigihe encameke zanistî ya bawerdar.

Destpêka wêje û zimanê kurdî yê nivîskî û bipêşveçûna wan heya roja îro.

Ji şirovekirina, ko min heya niha kir, mirov nêzikî wê baweriyê dibê, ko di nava wêje û zimanê kurdî yî nivîskî de heya niha tenê herdû zaravên sereke têne bi kar anîn.

Her yek ji herdû zaravan xwedî dîrokeke dirêj û têvel e.

Bi ser ko zimanê kurdî ne xwedî dewlet e, û hêzeke siyasî nîn e, ko guhê xwe bide zimanê kurdî, wî xwedî bike û bipêşve bibe, û bi ser ko zimanekî kurdî nivîskî yekgirtî û bilind nîn e, divê mirov bêje, ko hij-

mareke mezin ji berhemên nivîskî yên bilind û bipêşevçûyî bi herdû zaravên kurdî yî sereke derketine.

Mirov dikare bi bawerî bêje, ko asta heryekî ji herdû zaravan ji zimanekî dewletî û fermî gelekî nêzik e.

Wêjeya kurdî ya nivîskî, ya ko îro li ber destê me ye, ji sedsala 11an ve heye, û bi helbestên helbestvanê kurd Elî Herîrî dest pê dike.

Rojhilatnasê rûsî Aleksender Jaba di pirtûka xwe, ya bi navê “Recuîl de notices et recits kurdes“ de nivîsiye: „Helbestvanê Kurdan yê pêşî Elî Herîrî ye, ... ew di navbera sala 1009 û 1010an de ji dayk bûye“¹.

Wejeya kurdî ya sedsalên 15an, 16an, 17an û 18an bi navên helbestvanên kurd, yên weke Ehmed Melayê Batê, Feqiyê Teyran, Melayê Cizîrî, Selîmê Silêman, Ehmedê Xanî, Xarisê Bedlîsî, Pertew Begê Hekarî, Şêx Xalid û Siyahpûş xemilandiye.

Wejeya nivîskî ya sedsala 19an bi herdû zaravên sereke bi giştî babetên welatperwerî û romantik ji xwe re kiriye mijar.

Piştî cenga cihanî ya pêşî bi giştî wêjeyeke jiyana rastî ya rojane û ber

bi siyast ve heya roja me ya îro xwe daye pêş.

Ew zimanzan, nivîskar, rojnamevan û siyasetmedarê kurd Mîr Celadet Bedirxan bû, yê ko kovara xwe HAWAR di 15.Tebaxa sala 1932an de derxist û rêzimana kurmanciya bakur danî, ya ko em li gor wê heya roja îro em dixwînin û dinivîsin.

Ji vê demê ve mirov dikare bêje, ko zimanekî nivîskî bilind û yekgirtî, ango standard ji bo zaravê Kurmanciya Bakur hatiye efrandin. çend kêmayiyên rastnivîsê nikarin vê rastiyê ji bilindiya wê bînine xwarê.

Bangewaziya min li mîriya başurê Kurdistanê ew e, ko ew li deverên ko Kurmanciya Bakur tê axaftin, dest ji tîpên erebî berdin û di xwendegeh û zanîngehan de êdî rêzimana Mîr Celadet Bedirxan bidine xwendin, da li seranserê deverên ko Kurmanciya Bakur tê axaftin, bi yek zimanî were nivîsîn û xwendin.

Bi ser ko em dibînin, ko di Kurmanciya Bakur de, li gorî devokan, bêjeyên têvel (newekhev) ji yek tiştî re hene, dîse ji axêverê vî zaravî dikare berhemên kurdî, li kû û ji kê ve, li Kurdistanê yan li derve hati bîne nivîsîn, bixwêne û têbigihe.

¹ Tarîxa Edebyeta Kurdî, rûpel 57, Qenatê Kurdo

Hin ferhengên kurdî, yên ko di vê dema paşî de hatine weşandin, dikarin araîkariya yê xwendevan bikin, ko ew peyvîne di devoka wî de nebin, bibîne û têbigihe.

Herweke wê di zaravê Kurmanciya Navîn de jî zimanekî bilind û yekgirtî xwe daye pêş.

Bi bervajê Kurmanciya Bakur, ev nêzikî nîvsedsalekî ye, ko Kurmanciya Navîn bi vî yan bi wî awayî di xwendegê û zanîngehan de tê xwendin û xwedî kirin.

Piştî cenga cihanî ya pêşî û heya niha jî bi çoşeke mezin wêjeya kurdî bi vî zaravî tê efrandin, bi sedan pirtûk, kovar û rojname pê hatine nivîsîn û weşandin, bi awayekî ko mirov dikare bêje, bi rastî zimanekî dewletî yekgirtî û bilind, ango standard xwe daye efrandin.

Mixabin ji ber mercên siyasî ev zaravê ha heya roja îro bi tîpên erebî tê nivîsîn û diwariyeke mezin dixê riya xwejihevîzîkrina herdû zaravên sereke yên zimanê me.

Di vê babetê de ez dixwazim bêjim, ko pîrsa nivîsîna bi tîpên erebî li ser yekîtiya neteweya me jî bivokeye (xetereke) mezin peyde dike.

Vece ji ber ne di warê ziman-zanyarî de -tîpên erebî ji zimanên

malbata samî re hatine efrandin- û ne jî di warê siyasî de ji berjewendiyên neteweya me ye, ko ev zarav bi tîpên erebî tê nivîsîn.

Ji ber vê yekê ji mîriya başurê Kurdistanê tê xwestin, ko ew biryareke dîrokî bigire û dest bi pêşvebirina nivîsînê bi tîpên latînî bike. Ew jî li gor bernameyêke zanistî û sal bi sal.

Wekî dî em tevgereke xurt di nav axêverên herdû zaravan de dibînin. Gelek Kurd îro bi çoşeke mezin li wêjeya kurdî ya devkî xwedî derdikevin, çîrokên têvel, helbest, stran, qewlên qewalan û her wekî dî didine hev û dinivîsîn.

c) **Bi pêşveçûna peyvên derveyî (interferenz) di zimanê kurdî de**

Gava em giraniya ko zimanên derveyî li zimanê kurdî kiriye, bidine ber hev û li berhemên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî temaşe bikin, em di rêya mezinbûna hijmara peyvên erebî û farsî re dibînin, ko zimanê kurdî yê wê serdemê ketibû bin giraniyeke mezin ya zimanê erebî û farsî.

Di daneberheveke wisa de mirov cawaziya di navbera berhemên kevin û nû de derbarê giraniya zimanên derveyî li ser zimanê kurdî, zû dibîne.

Belê sedemên wê yekê çî ne, ko zimanê kurdî careke dî dixwaze li bingih û rayên xwe vegere, bi ser ko ew bindest e, û zilim û zoriyeke mezin li ser heye?

Belkî ji xwe ev bindestî û ev zor bin, yên ko dihêlin, ko axêverên Kurmancî ji windabûna çanda xwe bitirsin û ji ber vê yekê "dîlpakiya ziman" ji xwe re dikine weke mertalekî parastinê.

Di bin têgîna "dîlpakiya ziman" de di zanyariya giştî ya zimanan de çê li wê yekê tê kirin, ya ko dibêje, dîlpakiya ziman ew rewşa bilind ya jixwepiştrastbûnê ye.

Dîlpakiya Ziman ew rewş e, ya ko ziman tê de yekgirtineke tevayî li hember zimanên din peydedike.

Êdî dîlpakiya ziman li ba mirovên xwe dibe xwedî bilindayiyeke taybetî, ew bilindayiya ko hêja ye, were himbêz kirin û li ser destan were ragirtin û parastin.

Daxwaza ko dibêje, divê zimanê kurmancî li rayên xwe vegere, serhildanekê dide xuyakirin.

Rayên vê dîlpakiyê, ne weke ko hin bawer dikin, di netewperestiyêke çavkor de ye, nexêr ew di wê hestê de ye, ya ko ji xwezayê ve di dilê her mirovekî de heye.

Ew ew hest e, ya ko her mirovekî, -çawa ew hê ji biçûkaniya xwe ve hîn bûye- bi zimanê dayika wî ve girê dide, û ji ber vê yekê daxwaza wî ya xweza ew e, ko ew zimanê dayika xwe biparêze.

Belê zimanê kurmancî stûneke neteweyî ye, wî barê çanda civakê gelê kurd hilgirtiye ser milên xwe. Ew zimanê hemû Kurdan e û alavê rêzanî (siyasî) ye, ji bo nasnameya gelê kurd were parastin û ji windabûnê were rizgarkirin.

Encam:

I. Zimanê kurdî û zaravên wî îro:

1. Zimanê kurdî, zimanekî serbixwe ye, ew ji zimanên din yên cihane bi sînor e.

2. Îro du zaravên sereke di zimanê kurdî de hene,

a. Kurmanciya bakur

b. Kurmanciya navîn (Naverast)

3. Di warê nivîskî de herdû zaravan, heryekî li gor xwe, xwe gihandiye asta zimanekî nivîskî standad û bilind. Îro bi herdû zaravan hijmareke mezin ji berhemên nivîskî derdikevin.

4. Rûbarîna nasîna gotina 'Sprachloyalität' li ba Uriel Weinrich, çavkaniya jor, r. 131 bike.

5. Di warê devkî de

a. Di kurmanciya navîn de, an-

go di soranê de zimanekî bilind yê devkî jî ji Radiyo û televiziyonê re peyde bûye.

b. Di kurmanciya bakur de, ango di kurmanciya bakur de herçendî zimanekî bilind ji radiyo û televiziyonê re, çawa ku tê xwestin peyde ne bûye jî, belê ev zarav jî li ser rêya standardbûn û bilindbûnê ye.

6. Îro du zaravên zimanê kurdî yên tenîst jî hene. Binavkirina wan weke zaravên tenîst tenê ji bo cidabûna teknîkî ye. Herdû zarav jî bi giringiya xwe ji zaravên din ne kêmtir in:

- a. kurmanciya başur û
- b. kirmancî – goranî

II. Pêşniyar ji bo avakirina zimanekî kurdî bilind û standard di pêvajoya îro de:

1. Divê hemû rêxistinên siyasî yên Kurdan di kongireyên xwe yên giştî de biryareke siyasî bigirin, ko Kurd hemû bi yek Alfebêta binivîsin. Ew jî alfebêta latînî ye, ji ber sedemên zanistî.

2. Divê hemû rêxistinên siyasî yên Kurdan biryareke siyasî bigirin, ko rêzimanî, ango grammatik û rêzikên rastnivîsînê, yên ko Mîr Celadet Bedirxan ji Kurmanciya Bakur re pêşniyar kirine, ji bo vî zaravî bibin bingeh.

3. Divê li navçeyên rizgarkirî ji Kurdistanê û li derveyî welêt mamosteyên zimanê kurdî bi herdû zaravên sereke û herdû zaravên tenîst werine perwerde kirin.

4. Divê li deverên Kurdistanê kîjan zarav, zaravê dayikê û xwecihî be, ew zarav bibin zaravê sereke yê xwendinê. Di ber zaravê sereke re şagirt û dê û bavên wan dikarin di pêngavên 1, 2 û 3 yên navendî de zaravêkî ji her sê zaravên mayî ji xwe re hilbijêrin.

5. Divê zanyarên zimanê kurdî bi mebesta jihevnişikkirina zaravên kurdî û avakirina zimanekî kurdî yekgirtî lêkolînan li zaravên kurdî bikin, û di konferansên zanistî de encamên xebata xwe pêşkêş bikin.

Bermekiyên Kurd di kûraniya dîrokê da

-2-



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



Wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Xeleka Gotaran: **Kurd û Îslama Siyasî**

2 – Wezîr Xalid kurê

Bermekê Bermekî

Piştî ku me da xuyakirin, malbata *Bermekî* ji kok û binyateka Kurde, ka em bi hev ra taybetmendiyên kesayetiyên *Bermekiyên* yên navdar û keda wan di *Dewleta Ebbasî* û rola wan di geşkirina wê da bişopînin. Emê bi *Xalid Qurê Bermek* destpêbikin.

Jînenîgariya Xalid kurê

Bermek:

Xalid Qurê Bermek qurmê bingehîn yê malbata *Bermekî* di heyama îslamî da ye. Ew sala 90-ê goçî (709-ê z.) ji dayîk bûye û ew yek ji alîgirên *Ebbasiyan* li Xurasanê bû. Gava rêberê Kurd *Ebo Muslimê Xurasanî* rêveberiya şoreşa *Sî'î* li dijî *Dewleta Umewî* dikir *Xalid Qurê Bermek* serokê dîwana xeracê li wê herêmê bû. Asta ku ew têda bû wek asta wezîrê darayiyê di de-

ma niha da bû. Helbet, bêyî zanîn û şiyana wî ya berbiçav di warê rêveberiyê da û baweriyaya *Îmam Îbrahîmê Ebbasî* bi wî, wê ev asta bilind nedaba wî û ev peywîr û wezîfeya girîng bi wî hilnepesarta.

Gava *Dewleta Umewî* hate roxandin û *Ebbasî* gihîştin xîlafetê, asta *Xalidê Bermekî* hên bilindtir bû. Xelîfeyê Ebbasî yê yekem *Ebo El Ebbas Eseffah* piştî kuştina wezîr *Ebo Seleme El Xellal*, *Xalid* kir wezîrê dewletê yê herî bilind. Divêt bê gotin ku ast û peywîra wezîrê yekem di wê demê da mîna asta serokwezîr di vê dema me da ye. Wek tê zanîn pêwîstiya her dewleteka nû bi kesên zana û hêjayî rêveberiyê heye. Hilpesartina vê peywîrê bi *Xalidê Bermekî* wê rastiye dide xuyakirin ku ev kesayetî bi taybetmendiya xwe hêjayî vê asta rêveberiyê ya bilind bû. Heya bi wexerkirina xelîfe *Eseffah* *Xalid*

wek wezîr dimîne û xelîfeyê duwem Ebo *Ce'hfer El Mensor* jî wî di vê asta bilind da dihêle heyanî dema ku li derdorên Mûsilê serhildaneka Kurdan pêktê. Wê hîngê xelîfe *El Mensor* rêveberiya leşkeriyê dide Xalid da ku wek metelok tê gotin „*hesin bi hesin bikute*“. Bi vî awayî Xalid dest ji wezaretîyê berdide¹.

Xalidê Bermekî xwedî taybetmendiyên berz û cuda bû ku hişt ew têkeve cihê serwerî û rêveberiyê. Ew mirovekî comerd, payedar, aqilmend û xwediyê sincî û demînên bilind bû. Wî ticaran çikûsî li tikesî nekiribû, ew kesê yekem bû ku navê mêhvan yan vexwendî li kesên ku pêwîstiya wan bi alîkariya diravî hebû, dikir. Ji parsekan ra jî „*xwedî pirs*“ digot. Di vê babetê da, *Îbrahîm El Solî*, yek ji mezinên rewşenbîrên wê demê, dibêje: „*Ji wezîrên Dewleta Ebassî tikes bi rûmet û comerdîyê nagihîne asta Xalidê Bermekî*“². Xalid di kesayetîya xwe da hemû taybetmendiyên rêveberê xwedî şîyan û îmkân dicivand.

Ew xwedî zîmanekî resen û petî bû, mirovekî dilêr, rewşenbîr û di nivîsê da wêjevan bû. Wezîr *Ebo Ubeydullah* derbarê wî da gotiye: „*Min tikes mîna Xalid nedîtîn ku her tişt têda hatibe civandin, bi zîmanê xwe yî resen mîna xelkên welatê Şamê ye, bi dilêriya xwe mîna xelkên Xurasanê ye, bi torevaniya xwe mîna xelkên Îraqê ye, û bi nivîsandina xwe mîna xelkên Sewadê (başûrê Îraqê) ye*“³.

Gava hin şoreşan li welatê Faris û Kurdistanê li dijî *Dewleta Ebbasî* destpêkir - wek me berê jî got- *Ebo Ce'hfer El Mensor* Xalid şand ku wan şoreşan vemirîne. Xalid di vî karî da biserket. Di pey ra ew kir waliyê Mûsilê û di pey ra yê Azerbeycanê. *Ibin Xeldûn* gotiye: „*Xalid kurê Bermek yek ji mezinên Şî'iyanê. Ew yek ji stûnên xurt yên dewletê ye, wî astên bilind li pey hev standine; El Mensor ew kiriye waliyê Mûsil û Azerbeycanê*“⁴. *Ehmed Bin Sewar El Mûsilî* jî dibêje:

1 Ibin Al Jauzi: *El Muntezem fi Tarîx Al Muluk we El Umem*, 7/299. Ibin Kesir: *El Bidaye we El Nihaye*, 10/60. Ibin Xellikan, *Wefeyat El E'hyan*, 1/332.

2 El Zahabi, *Tarix El Islam*, çapa 1412 goçî, rûpel 5/104.

3 Al Zemexshari, Rabih Al Abrar, çapa 1412 goçî, 104/5. Xelkê Sewadê navê gelê başûrê Îraqê yê berê Îslametiyê ye û di jêderên erebî da bi navê El Nebet hatine naskirin.

4 Ibin Xeldûn, *Tarix Ibin Xeldûn*, 3/279.

*“Ti walî û mîr bi heybeta Xalid kurê Bermek nehatin ser me, bêyî ku ew sezayên mezin bide me; me zordarî jê nedît, lê heybeta wî dilê me tiji dikir”*⁵.

Ev bûyera li jêr nimûneyeka başe derbarê aqilmendiya Xalid di demên dijwar da:

Ebo Muslimê Xurasanî yek ji rêveberên xwe yêr leşkerî bi navê *Qehtebe Bin Şebîb* şande şerê walyê Umewiyan yê li ser Kurdistan û Îraqê. Wê hingê *Xalidê Bermekî* jî bi *Qehtebe* ra bû. Ew bi rê da li gundekî peyabûn.

Dema ku wan li ser banê xaniyekî firavîn dixwar, nihêrîn ku ji biyabanê da keriyên xezalan, keriyên kovî û hoviyan ber bi wan va tên heya ku gihîştin nav leşkerê wan. Xalid rabû ji *Qehtebe* ra got:

*“Mîrê min! Gazî gel bike, fermanê bide leşkerê ku zînên hespan li wan bikin, gep û liwanên wan girêdin berî ku siwarên dijmin êrişê tînin ser me. Qehtebe bi tirs rabû ser xwe, lê belê tişteki bi tirs nedît. Rabû ji Xalid ra got: Ev çi bawerî ye?. Xalid got: Dijmin êriş me dike! Tu keriyên hoviyan nabînî çawa tên? Li paş wan hêzeka mezin heye. Gava ew siwar bûn, dîtin ku li paş toz û moranê leşkerê dijmin tê. Heger ne ji Xalid bûya, ewê têkbiçûna”*⁶.

Wexerkirina Xalid divêt di sala 163-ê goçî (780-ê z.) da be.

5 Al Tabari, *Tarix Al Tabari*, çapa 1387 goçî, rûpel 8/56.

6 Ibin Xellikan, *Wefeyat El E'hyân*, 6/220.

Siyarê Têrika – 11

Bi zaravayê mikailiyên Polatliyê

Dr. Mikailî

drfyildiz@hotmail.de

Li dû mirina bavê, Îbiş Şewqî û bi-rayî xu Hemîd him îşê bavê, danustandina bi kerwana heştira dewam dikirin, him jî îşê xêrê, parastina cami û mescita dikirin, e ku ji hêla Osman Efendî va hatibûn avakirin.

Wî ji têrika bi keçika Bîcan Beg, Zeyneb xatunê va zewacik kiriwû û ji wê jî du lawike xu biwûn. Le Xadê li paşpêşî hev him herdu zarye wî û him jî jina wî ji wî hilgirtin. Ew bî ma.

Li du wê, ji apani xu keçika Xefê, Xefî İsmail Axa va zewicandin. Ji wê jî lawkî wî bû. Navê bavî xu lêkir; Os!, Osman!

Ku Os hat dune, çû li ber guhkî wî duaye xêrê xwend, kelimeyî şehadet anî û ji Xadê xwest ku ew jî mîna Kalî xu Osman Efendi bi serkeve û navî bera wana berdewam ke. Ji bavê odek mawû, ku zivistan dihat, karê gundîya nedima, ji yayla dadiketin, bi êvara mêre êlê di wir da berhev diwûn. Yek cara ku dengbêjik dihat gund ew ber-

nedidan, ew dengbêja heta doya zivistanê li wir dima û ji wan ra stranê kurmancî, çirok û mesel digotin.

Pirranîya dengbêja ji Kurdistana qadîm, ji welatî kal û bava dihatin, ji alî serhedê!

Wana pirranî ji Feqîyê Teyra şîir dixandin, ji Şêx Ehmedê Xanî kitêbe bi desta nivîsandî li ba wan bûn. Wî dixwand, gundîya jî bi heyranî guh didan ser wî.

Yek şeva helaw çêdikirin, yek şeva poşmanî. Hîn cara jî kestene diavêtin ser zoba ji tenka.

Ji ber kişandina titunê da di odê da, çav çava ne didî. Hîn cara jî ku pezek nexaş ket, ew serjê dikirin, dan, bilxur dikelandin, ro ser nanî hişkeva dikirin û hîn cara bi pariya li ber şivê disekinîn.

Berdevî zivistanekê ji aliyê gundî basika da xortekî hîn 18 salî hat gund. Li işkî, şivantîyê digerya. Yekî bejn qut, sor, serçav bi deq-deqî, çav zer, çavên ji kûrahîyê da li meriya mêzedikirin...

Lê bê ruh, bê manê! Meriya tiştik jê dernedixist. Li odê şûn dan wî, li wir radiket û dixwar. Ku êvar bû, mêre gund li piştî limiya şevê (Nimêj) dihatin odê, ew li ber dêri, bêdeng rûdinîşt û him gûh dida wana, him jî ku xizmet lazim bû, hema bazdida, hizmeta wana dikir.

Îbiş Şewqî jê pirsî;

– Xorto hele xu bide nasîn! Tu kî ye, çi ye, ji me çi dixwaze?

Mêra berê xu çex wî kirin, heta nika wî tu bala kesî nekşandî wû.

Ew tenê paqijek bû, paqijekî bê nav û bê deng.

Wî di tariya odê da bi dengêkî qeliştî, wekî mahrikî dikir tise tis destpê kir;

– Ez ji Basika me, lawê Xefur! Ji xu ra li işkî digirim. Dizanim ku li Mikaila Axa pirr in, beg pirr in, hûne karekî bi min din!

Qirka xuyî zirav carekê daqul-tand, kuxya û sere xu dîsa berjêr kir, guhke xu vekirin û li benda bersiva wan ma. Hîn ku Şewqî Axa destbi bersivê nekir, ji mala topo Efdî Axa jê pirsî;

– Xorto navî te çi yî? Tu zewicîyî? Zav zêç hene?

Hînik ji gundîya bi ew pirsên wî di berhev da bi hev ra kenyan, li çavên hev nêrîn.

Ji ber ku niyeta wî, merama wî dizanîn.

Efdî Axayî Mala Topo çend keçike xuyî di malda mayî hewûn, keçik di wextê da bi xazgîncîya razînewûn, qayîl newûwûn, le piştî wê jî nave wan derket û kesî ew nexwastin. E ku di odê da xewaxî biwûn jî bi va şora wî heşarî bûn, çav û guh vekirin, li benda bersiva vî xortî xerîw sekinîn.

Wî bersivand;

– Navî min Eli yi, ezew im.

Mêra giştika bi hev ra; Ooo Maşalah, Maşalah!

Xadê mirazîkî bi xêr nesîw te ke!

Efdî Axa hinkî bi çavên tiji hêrs li gundîya mêzekir;

– Mubalaxa nekin looo.!

Çex Elî bû;

– Elî kurê min, lawê min! Siwê wari mala me, li ba min ji te ra îş heyî! Eli pirr şa bû, hema bazda pê, çû herdu deste wî paşkirin.

– Xadê ji te razî wi, omrî te dirêj ki!

Gundîya bi hevra gotin; “Amîn, amîn!” Û gî bi hevra kenyan.

Dû ra wek her şev dest bi qala henek û yaranîya kirin. Elî wê şevê qe raneket, xew nediket çava. Siwê zû rawû, desmê hilgirt û çû limiya siwê, mizgeftê. Digot, belkî Efdî

Axa jî li wir bi û ê min li wir biwîni, hîn pirrtir ji min hez bike. Lê Efdî Axa navbera xu û camiya va pîrre ne rind bû. Tenê di eyda da dihat limê! Wî dua û sure jî nedizandin. Mîna pîrranîya gundîyên din. Elî li dû limê pîrsî ka mala Efdîyî Topo li ku yî û berbi malê çû.

Mala Efdîyî Topo hema ji ser camiyê va, li pala gund bû, li ber inekê, şikewtekê ji kevra çekiriwûn. Du qat li serhev bûn.

Efdîyî lawî Efdî ji şan û şuretê hez dikir. Li ber dêri kevanîya malê Geyîya Hecî disekinî, Ji şev da mêmîkî wê ji wê ra qala Elî kiriwû, qala niyeta xu jî. Boyî vê Geyê Elî ne mina Şivankî xerîw, lê wek yekî ji malê dawetî zik malê kir.

Sifra xurînîyê hazir kiriwûn, toraq, pennêr, çorrîn, nane ser selê bi runnî kal sorkirî û bi pêner û kizêrake tijikirî, li hêla wan qawirme û mot, mote entabê.

Çay jî kelandîwûn. Şorba dêw jî hewû. Elî li taxa jêr ber bi dêri li ser juniya rûnişt, şaş û metel!

Ew xizmeta mezin ji şivankî xerîw ra? wî tu manê nedida vayê.

Gavik şunva Efdî axa jî hat. Li dû wî jî her sê keçîke wî, ê ku di malda mawûn, qert û li benda mêra wûn, gî bi hev ra li dora sifrê

rûniştin. Efdî axa got;

– Keçikno ew Elî ye, Elîyê Xefur ji gundî Basika! E ji vê şunva li mala me ra şivantîyê biki, lê wek kesekî ji malê li wî binêrin, qiymetê pêdinê!

Bi çavkî jî li Elî mêze dikir, ji bo ku bizane, ka ew ji vê kêfxweş e yan na.

Elî jê razî wû, lê hinkî fedî dikir.

Bêdeng dest bi xarinê kirin, du ra bi Elî va rawûn, çûn inê û gomê, îşe wî jê ra got.

Nedixwest bira Elî herî hêvşo, dixwest ku ew li gund li heywana mêze ke û tim li ber çavi wî bi. Boyî ku ew wî hinkî nas bike, ka ew ji keçîkî wî ra diwi mêr yan na!

Piştî çend hefta wî va niyeta xu ji Elî ra vekir, Eli bêdeng serê xu leqand, got;

– Erê, we çito minasiw diye, bira wakîna be!

Wana di nav xu da nişanek bi keçîka wî ya mezin va kirin, bi Bodê va! Gund jî li benda vê xerberê wû, herkes hat xêrkinê.

Gî şa bûn, li di nav xu da jî pê dikenyan, qerfe xu dikirin. Ber bi biharê ji bi dev û zirne dawata wan kirin.

Ji aliyê Elî kes tunnewû, Xortên gund li wî xwadî derketin, ew ji şeva gerdegê ra hazir kirin.

Ku biharê destpê kir, Elî hendu xu jî wî gundî dihesivand. Jina wî Bod jinika pirr bîaqil bû.

Ew ê çî bike, di nav mezina da çito rawi, runnê, gî ra wî dida.

Tim digot;

– Elî! Here oda gund, tim guh bîdi mezina, ji wana tiştina hu biki! Çiyî te ji wan kêmtir î! Wê Elî dihanî eşqê, lê pirr cara ew di odê mêra da diket xewê, jina wî dihat ew li piştta xu dikir û dibir mal.

Yekî çûkî sivik bû, Bod jî jinik gir û bi quvvet. Ew mina çewalekî diavêt ser piştta xu û dibir mal.

Li du mirina xenzurî xu, Elî idara malê hilgirt ser stuyî xu, yanê bu xadane malê.

Efdîyê Topo yekî dewletî bû, mal milke wî gî ji Elî ra ma. Elî piştî çend sala, ji ber ku jina wî Bodê zaryê xu newû, ji gund bi keçîkîk xort va zewicî, ji wê sê lawîk û keçîkîk xu bû.

Dîsa li gund ji bera Hecibrama lawê Hecmamed, Hecyehmed keçîkîk xu hewû, Fat. Bi Fatê va zewicî û keça xu Elus jî wek berdêl da Hecyehmed.

Yîwiş Şewqî, lawî Osman Efendi, pismamî Hecyehmed bi va zewacê ne razî bû û va yeka ji Hecyehmed ra jî got. Xûna wî tu qe

nekaliya wû ser Elî. Lê Hecyehmed zûva qerara xu dawû, wî ye keça Eli ya xort û çeleng ji xu ra wek jin bihanîya.

Li dû zewaca wan a berdêlî, navbera herdu pismama xeraw bû.

Yîwiş Şewqî ew his dikir ku Elî kesekî pirr bi hêrs, çavbirçî û ji bo ku dewletî bi, ji bo ku hîn jî bi quvvet bi, çî ji destî wî tê ye biki.

Kesekî bi tirsê wû!

Elus!

Elus di nav keçî wî da ya herî çeleng û camêr wû. Elusê du law û sê keçî xu ji Hecyehmed da hatin dunê. Elî bi aqildayîna jina wî ya mezin, Bodê li gund li derdorê gund kijan mal dewletî yi, kî bi nav û deng e, ji wana bi keçîkekê va zewicî.

Ku sale wî gihişt çelî ew hendu di nav gundi kurmanca da, di nav êla da dihat naskirinê.

Şivantiya wî zûva hatiwû ji bîr kirinê. Hendî herkesî ji wî ra jî digotin; Elî Axa! Wî mala xu barî gundekî din kir, gundekî boşnaxa.

Ji wir da mal milke xu idare dikir. Bi barkirina mala xu, bi heyeta xu ya berê va jî elaqaya xu qut dikir, wekîna difikirîya!

Keça Hecyehmed bi zaro ma, lê di ber bêrda mir. Bi cewiya bi

zaro wû. Digotin wê pîrr xûn anda kiriye û ji wê miriye, lê Elî tenê lê mêzekiriyî û ew nebiriya bajêr, nexaşxanê.

Keça wî Elûsê lawê xuyî mezin navê kalê lê kirin. Meh! Meh gir bû, bû xortikî ciwan û delal. Newiye Elî! Li gund û di nav êla da tu kesî di listika cirîdê da bi wî nedikanî.

Axatiya Eliyî Xefur

Dewleta Osmanîya rokê bi rîya begî navçê, ji türkmêna, Hatiboxlu xeber ji Hecyehmed ra şand ku bira ew wari sancaxê, Engürüyê. Hecyehmed û Hatiboxlu hevûdu berê da nasdikirin, dostê hevbûn.

Hecyehmed ereba xu qoşkir çû gundî Hatiboxli, Kargaliyê, li mala wî bû mivan. Wana qiymeteka mezin dane wî. Êvarê bi Hatiboxli va tenê man, jê pîrs kir, ka çima walîyî Alî Osmanî ban wî dike.

Hatiboxli got;

– Dewlet bi yarmetiya elmana nûva bi teşkilat diwe. Ji min pîrskirin ka kî yê kurdên vê derdorê idare biki?

Min jî navê te da wana, ji ber ku ez dizanim tu meriwêkî xwande yî, dîndar î û ji maleka mezin î. Em ê siwê herin Engürüyê ba Walî, ew ê

mohr, sancax û tuxê bi te dî. Tu yê ji heft gunda ra biwe axa, beg!

Hecyehmed şa bû, ji wî ra şahîya xu nişan da, lê di zikî xu da hinkî ditirsîya jî.

Ew karê dewletê bû, lazim bû ku ew ji dewletê ra bacê berhevke, wexta herbê eskera topke.

Ji Stenbolê ra pez, hesp hewce wû, wana bişîne û li ber derî xu jî bo yî vî karî mêrê bi sileh û çek xadî bike.

Lê ew ji maleke hecî, xoce û xwande dihat, ne maleke şerwan û şerkar!

Lê nedikarî ji begî türkmêna ra, temsilkarî Osmanîya ê va derana ra biwêje na!

Hinkî bêdil got;

– *Hay hay begim! Dewletin emri başim üstüne! Sultanım için canımız feda!* bi tirkîya Osmanî.

(Belê begî min, xwasteka dewletê ji bo yî min emir e! ji bo Padişeh canî min bira feda bi!)

Roya din berbanga siwê derketin rê, çûn Engürüyê, derketin ba Walî. Abdi Beg! Ji xencî wana ji gundi derdorê ji qasî sed kesî din hatiwûn. Kurmanc, şaxzûnî, türkmen, çerkez, teter, nogay, xay-rimuslim, rum, yêrmanî.

Tebaaya Padişahî osmaniya gî

li vê derê, top biwû. Herkesî kince xu yî bi şuret, silah û çekên xu yî dibiriqîn li xu kiriwûn, hinik bi hespa, hinik jî bi ereba hespa yan jî bi faytuna hatiwûn.

Wali bi qorik esker derket ber derî avahiya wilayetê, herkesî denge xu birrî.

Wali ji wan ra qala kar û wezîfa wan kir, dû ra memurên wî yek yek mohra wan bi xelateka ji Stenbolê va da wana.

Xelat xençerek bû, a ku di nav aleka Osmaniya da pêçayî. Ala osmanî ya bi sê hîvê spi li ser hewrişim va bi rengî kesek neqşandî.

Ku wana diçûn kar, yan jî şer ew ala didan destî xu, bilind dikirin.

Hecyehmed ew xençer bi kêfekê kir nava xu, al jî bi ereba xu va kir û bi erebecîyî xu va dîsa zivirîn gund.

Him şa diwû, him jî ditirsîya ku vî îşî nekari!

Hatina wî di nav Êlê da bû sewa şawûneka mezin. Mikailî giştik bi hilgirtina axatiya dewletê serbilind bûn.

Ew xeber di nav gundên din da jî belaw bû. Mezinên gund û êlê din, ruta, basika, canbega, sewêda, şexzinîya, reşîya, zirkîya, gî hatin ba wî. Şawûn û biata xu ji wî ra gotin. Giştik ji dewletê ditirsîyan û

dixwastin bi temsilkarî dewletê va navbera xu, dostiya xu rind bigrin, biparêzin. Giştika bi xu va çend pez jî wek xelatî dihanîn.

Lê piştî gaveka din Hecyehmed ji vî karî pirr eşiya, asê bû. Çima ku ew bixwazi yekî bişîne eskeriya Stenbolê, kesî nedixwast here. Kesên ku diçûn eskeriyê yan qe dîsa nedihatîn, yan jî piştî 15-20 salî dihatîn.

Xelkê jî kavir û pezê xu difrotin, dihanin bidin Hecyehmed ku bira ew lawî wana neşîne eskeriyê, yan jî kesekî din li şûna lawî wana bişîne eskerê.

Hîn kesên xerîw, fiqare hewûn ku, ji ber vê ji êskerê nedihatîn, tim ew dihatin şandin.

Lê Hecyehmed meriwkî dîndar bû, ji Xwadê ditirsîya, ew ruşwet dîsa çex dikir, red dikir. Ew jî diwû sebewa nerazîwûnê, hîn kesa ew li ba wilayetê gilî dikirin.

Li dû şeş meha Hecyehmed çû hindê begî turkmena, ba Hatiboxli, ji wî ra a dilê xu da vekir.

Hatiboxli got;

– Bi rastî ez bi vê şa newûm! Ê kî ye vî îşî bikî?

Di heşî Hecyehmed da zavê wî, zenzure wî, bavê Elusê, Elî hewû. Wî dizanî ku ew ê him rûşwetê hil-

giri, him jî neheqîyê pirr rehet biki!
Berî hatina xu jî li devî wî geriya
wû. Elî ji bo vê do va amade wû.

Hatiboxli bersivand;

– *Damadim, Gaffuroğlu Ali, bu işi yapabilir!* (Zavayi min Eli dikari
vî işî biki!) Hatiboxli got;

– Baş i wî bi xu ra bîne, em herin
Engürüyê, cem walî û vê gorrandinê
ji vî ra biwêjin, ka hele ew çî diwêji?
Ez nikarim tenê bi serî xu biryara
vê bidim. Hecyehmed çû gund,
ban Elî kir, bi hev ra şiv xwarin,
Qerara xu bi wî ra parve kir. Elî çû
desti wî, ew paşkirin, got;

– Te çito xwestî, ez ê wê bikim
axayê mi!

Wê şevê li mala Elî şenayî hewû,
heta siwê bi dost û hevali xu va
xwarin, vexwarin. Elî bi hevala bi
dizika yek cara şeraw jî vedixwarin,
şerawa ku yermenîyê Heymanê,
Engürüyê bi xwe bi desta çêdikirin.
Bi deng û stranên wana wê şevê
gund raneket. Va şahîya Elî hinkî
tirs û guman xist dilî Hecyehmed,
ê bi xu xu got; Gelo ecewa Îbiş
Şewqîyê pismam rastî negotî ba?

Lê ku ew pirr peşta here, tiştê
nebaş biki, ez ê ji Hatiboxli ra bi-
wêjim, wî ji axatiyê hilgirin. Lê
heta siwê kawûs dîn. Di xuyê da bû
av...

Kilamên me

Mem Xelikan

Şivan

Şivan û şivantî, di jîyana kurdan de cîhekî mezin girtîye. Di çand û gelnasî ya (folklor) kurdan de şivan, mîna sazîyekê ye. Kurdên Anatolîya Navîn (KAN) jî, di çand, gelnasî û jîyana xwe de şivan wek sazîyekê dîtine û jîyandine.

Şivan, lehengê (qehreman) wana ye. Di stranên dilan de, evîndar şivan e. Bengîn û çelengê evîndara ye. Bijêjkê derd – kul û sewdayên dildara ye. Dilgirtî û hezkirî yan destê Şivên, ji derd, kul û sewdayên xwe re melhem zanîne û pê kulên xwe derman kirine. Bi dengê billûra şivên, bîrinên xwe kewandine. Derd û kulên xwe, tim û tim bi gilî û gazinan dayîne ber şivên. Gilî û gazinên xwe, hawara xwe ji şivên re kirine. Şivanê malê, mîna merîyekî ji malê ye. Xani-

Di straneke dila de;

"Bêla bavê te hendik e

Wûne li dawî ya mala

teve min ke

Şivanî nav şêrînî ku nav Îdik e"

ma malê, keç û bûkên malê giştik Ablayê şivên in. Şivan, zanayê wana , dilgirtîyê wana û dermanê dilê wana ye. Car caran jî, derd û belayên hatine serê wan seddem şivan e. Şivan him ji malê zanîne, him jî hizan û nezan dîtine.

Evîndaran, hezkirî û dilgirtîyan pîrr caran di stranên xwe de, hezkirî û dildarên xwe şivan, xwe jî (Dildara Şivên), wek bêrîvan dane nasandin. Kar û berxên şivên, billûra şivên, deşt û banî, çol û çiyar, newal û zozanên şivan lê digere, hewşo, fêz, mexel ên pezê şivanan tim û tim di stranan de cîh girtine. Bi kurtasî, ez bêjim, pîrr caran KAN di jîyana xwe de, di çanda xwe de, derd û kulên xwe bi stranên ku ji şivên re strane anîne ziman, xelatî û şaşitî nabe.

Di vê çarîne de evîndarê xwe, Şivanê nav şêrin e.

Di çarîneke straneke din de jî;

Kuda kuda Şivan kuda

Şivên pez berdaye pêda pêda

Çavê xelkê malê dinê

Çavê min li bizbenda belek benê bi pî da

Çavên dilgirtîyê malê dinê nabînin. Malê dinê, bi bizbenda şivên diguhere. Di straneke din de, keça evîndar yar û hezkirîyê wê dîsa şivan e. Ji evîn û sewdaya xwe re ewkas fedakare ku, sîngê xwe ji pezê wî re dike mexel û fêz.

"Şivan pezê xwe areng bike

Wûne li ser sîngê min mexel bike"

Li herema me, di kilamên şîna de jî, merîyê ku mirî wek şivan bê nasandine û nîşandane. Mirîyê xwe, di kilamê de şivan e û bi şivantîya vî, ew pesandine. Li Xelikên jor (Qerecdax – Konya) şarekî, brayê xwe yî bazirgan ku pez dibire Stenbolê difiro, li mirina vî di kilama xwe de bi hevokên;

"Dem e dem e Keko dem e

Pezê kekî min diçêrê li Hewşoyê Mihkê li gerem e".

Anîye ziman û ew wek serşivanekî baş û jêhatî nîşan da ye.

Li Gundê Omê (Konya– Kulu) dayîkek, lawikê xwe yî cîvan Xelo, bi xopana şêrpençê ya bê derman wenda dike. Ew jî, Xelê xwe wek Şivan be, di kilama xwe de bi nav dike.

"Li bana li bana Xelo li bana

Tu kerîyê Şuqîrê neman hatin dana

Kerîyê Xelî min ê di fêz da man o"

Dîsa şarek, bi ser mirina miriyê xwe yî bi şevat de, wî wek şivan be dide nasandin û di kilama xwe de pezê wî radigerîne.

"Kekî min şivanê li nav xama

Qirbîyê xwe yî nasekinê li ser sima"

Strana ku bi navê şivan li herema me hatiye stran, straneke dila û gelerî ye. Li her gundekî, bi çarînen cûda tê stran. Bi dîtina min; herkesekî ew

strana wek ya xwe zanîye û li strana şivên, çarîn zêde kirine. Ji bo wê jî, stran pirr dûwdirêj e. Di wan çarînan de jî, pirr hevokên wêjeyî hene.

Dema ku kaça evîndar gotiye;

"Goma şivên li neqewê

Di ser re çex diwime mîna kewê "

Xwe mîna kewa ku li hêlîna xwe digere anîye ziman û goma şivên ji xwe re wek hêlîn dîtiye.

Sewdaya, dildaran serxoş bike, hişa li serê wan biwe û wanan raçolê xe.

"Dişe dişe şivan dişe

Hezar heftesed pezî li pîyekî didoşe

Helba şîr a li ber time boş e "

Di van hevokan de jî, stranbêj dema li ber bêrî ye çavên şivên li yarê di-keve, heş çûyîna li serê wî, bi pez berdoş dotinê tîne ziman.

Xwendekarên, zaroktîya xwe li gundan derbasbûyî yê baş bizanin. Dema ku pez tê avê, tê ser kanîyan çan û zîlên bi stuyên wan de mîna orkestrayekê deng biderdixin. Şivan jî wek maestro bi firîskîyê, tev li wê orkestraye dibe. Di strana şivên de, dildara fedakar memikên xwe, ji wê orkestrayê re dike ensturman.

"Cotek memikî min î sor û spî heye

Ji qirbîyê xwe re bi çan û zîl ke "

Ji klama şivên min, çarînen li jêr berhevkin. Dixwaze, hevalên çarînen din dizanin wana jî bişînin û ew werin zêdekin û arşîv kirin.

Şivan

Min go şivan

kerî xwe barke kerî xwe barke

Kûzî xwe tiji ava sarke

Bane kûçikê qerebeş ke

Li dawîya mala min gudarke

*De here lo lo lo şivano
Canî Cemikê xwe qurbano
(canî ablê biçûk qurbano)
De here lo lo lo şivano
Sal biçûk î dil nizano
(Dubare)*

*Pezê şivên pezê nêr e
Sirtê şivên gî qelêr e
Bi şev bişom avê sar e
Bi ro bişom ê bên yar e*

*Şivan qurban
Sibê rabûm bi qir ketim
Hawar gundo
Bi ser sewda dila ketim
Xeberdara xeber anîn
Gotin şivanî ji mala bavê te re
Şeş meheke din şivan bimê
Şevka îşev têr raketim*

*Pezê şivên pezê zayî
Şivan qurban te çêrand min av dayî
Huro şeş ro ne tu kuva çûyî
Tu wendayî lo li ku mayî*

*Goma şivên li neqewê
Di ser ra çexdiwim e mîna kewê
Heta ku li vê dinê xweş digirim
Ji te bitir ser sîngê gewrî kal kesî nakim xewê*

*Pezê şivên hûr celew e
Wê va mere ew Helew e*

Gurê buxe dizê bewe
Ê paşê bên yar sewe we
Şoferîyê meke tê bi yax bî
Rêçberîyê meke tê bi toz bî
Şivanîyê bike tê bi yar bî
Bi xudanê sîngê gewrî kal bî

Dişe dişe şivan dişe
Hezar hefsed pezî
Li piyekê didoşe
Helba şîr a li ber time boş e

Pezê şivên areng kirî
Pêş mala bavî min mexel kirî
Cotek memikî min î sor û spî heye
Ji qirbîyê xwe re bi çan û zîlkî

Şivan berjor mere berjor ba ye
Qurban berjêr were yarê va ye
Min direvînî birevîne
Narevînî navê ker şivanîyê li ser te
maye

Pezê şivên mor qoyin e
Şivan berjêr nere neçêrîne
Çoyî xwe bavê ber axê xwe
Bê here şivanekî din bivîne

Vîyê vîyê şivan vîyê
Dameweste li pî bêrîyê
Çex neke qirbî ya mîyê
Ser sîngê ablê nekeve hilma xuyê

*Safî şemirand, vexwerî durdî
Manendê durê, lîsanê kurdî
(Xanî)*

Dara Merxê çawa bû Dara Mestê? Û Hamidiye an Celikan

Durxaneyê Cellikanê

Gundê Celikan gundekî ji 400 gundên kurdan ên Navanadol"ê ye. Gundekî şimşatî ango tîpîk wek gundên din e. Di gund de têkoşîna nûjeniyê ya man û nemana li dij kapîtalîzmê û nûwênerê wê dûgela tirk heye lê ne ew hinde xurt û zexm e. Dîsa jî heyista vê koş û xiroşê hêmaya vîna jiyaneke azad û kurdewar e. Mirov divêt wê xore neke û bala hilsengîn e.

Ê ez jî wisa dikim..!

Dawer û direfşa wê gundê hêja he- ne. Yek ji wan serê hespê ye. Li ser vî navî ev qes spekulasyon ango galegal û şemate hatiye kirin ku bi vî awayê ev gundê heyidî û ji rêzê li seranserê Tirkîye"yê navdar bûye. Heman herkes wê çîrok û derkenarê dizane, a ku Demirêl gotibe "sayin Atkafalilar" ango "Serhespiyên hêja".

Bi rastî Demirêlê destbixwîn hat vî gundî ya ne ez pê niazanim?

Belam a ku ez pê dizanim ev e ku gava ku bavûkalên me li wir kon venandin li wir evrazek hebû ye ku navê wê bi tirkî "Atkafasi" bûye. Ev rastiyeke biçûk e. Divêt em werin ser rastiya mezin. Ca îcar em bi hev re wê minhoya jêrîn bixwînin ka çi dibêje; "... di 02.06.1893 ji aliyê parêzgeha Enqereyê ve hatiye daxwez kirin ku li melbenda Haymanayê li zoma Atkafasiyê, ew gelheyê ku ji Sêwas Girûnê (Sivas, Gûrûn) û ji Cebelî Bereketê ango ji parêzgehê Edeneê (Adana Vilayetî) hatine, li ev derê xanînên ava kirine û bi vî awayî gundek ava bûye. Divêt ev gund wek "Hamidiye" bê navandin û li vir destûrek bo avadankirina mizgeftêk bê standinê. Belam jibo ku gundên bi vî hawî

bên binav kirin û li nexşeyan bên çinandin, pêwîst e, neqeba wan a şehrên din ên mezin bê peytandin û pergarê wê bê hinartin."

"14.03.1956 vebestina gundê Atkafasiyê bi ser navçeya Qûlekê ya Qonyayê ve ya ku berê bi ser melbende Sindiranê ango Yenîceyê ya ku bi ser Enqereyê ve bû."

"Ev gund navê xwe ji kesekî bi nave Bektaş standiye, ku berê ew li vî gundî da maye. Li pey dukarek din tê dozandin ku navê vî gundî Celikan bûye, jiber ku ew kesên ku cara pêşîn hatibûn û li vir daniştin, ji xwemalê hoza Celikan bûn."

Ev minhoyên hanê ku min li jor ji we re zivirandin min ji xebera ta hêja ya ferzanayê hêja **Nişanyan** wergirtin.

Ev tekstan Nişanyan rastûrê ji arşîva dûgelê wergirtiye ku çewtiya wan nayê lecandin û gengeşandin. Mîrov dikare firetir û firawantir agahiyê ji malpera wî ya bi navê <http://www.nisanyanmap.com> wer bigire.

De em îcar werin ser hilsengandina vê benda jorîn ka çi agahiyên bêhempa tê de hatine veşartin.

Vê minhoyê heta niha gelekî lec û gelacî yên ku li ser damezrîna gundê Celikan bi awayekî misoger

û herzal çareser kirin. Êdî kes nikare bibêj "way gava mangeya me cewî za hat damezirandin, way gava pîrika min mir hate damezirandin". Ev gişt ji holê rabûn.

Yek:

Li wî zemanî li navçeya Haymanayê cihek bi navê Atkafasî hebûye. Di nexşe û arşîvên dûgela xanadana Osmaniyan de ev cih û zom bi navê Atakafasî hatiye bi nav kirin.

Du:

Ev gundê hêja û şîrîn ne tenê ji hêla rewendên di ser Girûna Sêwazê re hatine ve hatiye avakirin, hem vê re ji aliyê kesên di ser Edenê re hatine ve jî hatiye damezirandin. Du bir însan heryek ji aliyekî de hatine wê deverê. Hinek ji Bektaşliya kevin hinek ji di ser Cebelî Bereket ango di ser Edenê re hatine gihîştine hev û li harêma Atkafasiyê ku di nexşeya dûgela Osmaniyan de ev dever ji zû de wek serê hespê hatiye tomar kirin, gundê xwe ava kirine.

Se:

Ji sedema ku parêzgeha Enqereyê krokiya gundê Celikan nikariye derbixe û bişîne Stembolê gund bênava maye û her tim wek Atkafasî

maye. Lewma pir caran min bixwe gelekî xerîte dîtine, her gundek tê de ye lê ev gund tê da tune ye. Niha li min eyan bû ku çima wisa ye. Vê minhoyê bersîva hemû pirsan da.

Çar:

Navê gundê Celikan ê ewil jixwe Atkafasî bûye. Navê vî gundî ji ber Komara Tirkîyeyê ya xwedêgiravî hatiye tomarkirinê. Tu tékiliya navê Atkafasîyê û koş û hewla kemalîstan ku kurdan asîmîlê bikin ango bibişêvin tune ye. Kemalîstan ev nav yekser ji Osmaniyan ango Îtîhadiyan an ji misilmanîperestan kelepor wergirtine. Belam gava kemalîstên serxûr hatin ser şiyankariyê kelepora dûgela osmanî ya nemirovane tavilê werstand û sitemkariya dûgela osmaniyan hê tundtir dadûvandin. Wan dikarî navê "Celikan" venasin û ji nû ve bitomirin.

Pênc:

Peşariya tirkandin û misilman kirinê ne tenê siyaseta dûgela tirka piştî komarê bûye. Birastî ev daxweznameya parêzgerê Enqereyê xelî(pir) balkêş e. Ew dizane ku ev malbatên ku gihîştine hewêrka Atkafasîyê helbet ji hoza Celi-

kan in. Dîsa jî ew kabra pêşniyar dike ku navê Padîşahê Osmanî Ebdûlhemîdê Duyemîn li navê gundê Celikan bike û navê gund vegeêrîne Hamidiyeyê. Ev walî ango parêzgar hem şalûz e hem jî qûnalês e. Ma hûn nabînin peya çi qes li ber Padîşahê Osmaniyan xwe ditewîne û çaplûsiyê dike. Diyar e ku ev helwesta bûrokrasiya dûgela tirk hê jî dadidûvîne û dikudîne. Bi wê jî hê name ji Stembolê dixwezê mizgeftê ava bike. Ew daxweza ne ji dînevînê tê ne ji jî ji tîrsa xwedê tê. Ev rastûrê perşariya dûgela tirk e ku dixweza hem baweriyên bi misilmaniyê biberdêlîne. Ma haya wî çiyê ku ev misilman in an elewî ne? Helbet nizane. Lê ew dixweze bira gişt bi misilman bin û dîne xwe bigûhêrin. Di vê daxweznameya parêzgerê nebinavkirî diyar dibe ku siyaseta dûgela osmanî hindiktirîn di dawiya emrê xwe de, di dema Ebdûlhemîdê Duyemîn de li ser bîngeha ramanên Ziya Gokalp"ê xwenezanê ku digot; "tirkbûn, misilmanbûn û nûjenbûn" dimeşîbûye.

Şeş:

Ew jî rastiyeke herî girîng dide ber çavê me ku Ebdûlhemîdê Duyemîn di rasti xwe de Padîşahê tirkperest

bûye. Di dîroka fermî a dûgela tirk de ew wek padîşahêkî zorbaz ango mustebîd, werçerxa wî re jî wek werçerxa îstîbdad ango werçerxa zarbaziye tê dabaşandin. Lewre di dîroka nefermî a dûgela tirk de ev padîşahê hanê wek padîşahêkî misilman û sofî dihate nimandin. Wele aferî ji dûgela tirk re! Ew çî dûgeleke xurt û zexm e ku hem li ser nêvengên fermî hem jî li ser nêvengên nefermî hikûmraniya xwe diajo. Ger em dîsa bên ser mijara xwe, wisa dixuye ku ew jî ango Padîşahê Osmaniyan Ebdûlhemîdê Duyemîn jî wek paşrewên wî ên din hem tirkperest hem jî misilmanîperest bûye. Wî dixwestiye ku hemû mirov û gelên di bin serweriya Xanedana Osmaniyan de hem bitirkîne hem jî bimisilmîne.

Piştî wê û peşariya wî a gemar û gendel bi kirûran mirovên heyidî canê xwe ji dest dan.

Di tirba xwe de bi zirezir ke!

Heft:

Ev siyaseta hanê ku me behs kirî rêç û şopên xwe ta li Girûna Sêwazê jî hiştine. Li wir jî gundekî ji aliyê heman eşîretê ve hatiye damezrandinê re negotîne Celikan, lê navê wî gundî wek "Begtaşli

Atik" ango "Bektaşliya kevin" guhartine. Bi rastî û binema navê xwe Celikan bûye.

Îcar em bala xwe bidin Dara Mestê ango Dara Merxê,

Cûn û çêjteya vê darê merx e. Bi kurdî vê re dibêjin merx. Merx bi tirkî Ardiç e.

Cennetî Mestî Dûrên piştî ku zeviya binê darê ji xwe re buruntî kiriye navê darê jî hêdî hêdî bi navê wî ve tevde tê xwendinê dibe Dara Mestê. Wî ew nav dayîna heq kiriye çim ku ji vê darê berê li der dora Navanadolê û li Celikan gelek dar hebûn û ev hemî ji aliyê gundiyan ve ji bo firehandina bihostek zevî hatin rewitandin, qelihandin û kurisandin.

Ji hîngahê pê ve ye ku ev dar weke direfşa vî gundê tê nasandinê. Xuya ye ku temenê wê ji temenê gund zehftir e. Bi rastî jî divêt ev dar ji aliyê sergewreyên (rûsipîyên) gund ve tavlê bê parastin û vênêrîn.

Kifş e ku ji ber vî navî navê wê darê Dara Merxê bû. Gundiyan ji re wisa digotin. Ger fonolojiya wan ne nêzîke hev bûya wê ew navê hanê bihêsanî nedikarî bibe Dara Mestê. Kifş û bel e ku Darê Merxê di mîtolojiya kurdan de jî cih digire. Di gelek kilam û stranên de

navê vê darê radibire. Xêr ji wê jî mirovan paç û lifîk û ben di vê darê vedibestin daku dilniyazên wan bi cih bihatana! Weç e ku li ser vê darê hinekî din lêkolandinên berfirah û berkûr bên çespanandinê.

Veğerandina Navê Celikan û Stûbariya Gundiyar

Celikan, Atkafasî Yeşilyurt ev çi ne? Helbet kesek ji me nizane. Bisirûştî îro diyar e ku ev beşek ji beşa pêşnûmaya asîmîlasyon an jî bişaftina kurdan bûye. Dûgela tirk xwestiye bi hevt navên gund û şahr, çiya û baniyan, bîr û bîryariya kurdan, hiş û hişmendiya wan şelewle bike, daku ew nizanin çi tê sere wan. Naveki gunde Celikan dirokî û kevn heye, kesek nizane ji çi eslî têye. Bel e ku navê celikan ji navê bapîrê vê hoza Celikan ji "Cello" dipirêje. Celo mirovekî jîr û xurt bû, zexm û bijûn bû, çalak û çeleng bû. Bira tu kes nebêje navê Cello ji Celal tê. Sihê berevajî ye. Navê Celal ji Cello tê. Xuya ye ku navekî fire kevn e û ji kûrahiya Hengamên Neolîtîkê derdikeve.

Divê gundiyên wî gundî çawa ku li gundê xwe xwedî derdikevin, wisa ji divêtin li vî navî xwedî derkevin. Navê gundê xwe ji nû

ve bistînin û li ser hemû kaxiza bidin nivîsandinê. Wî navê ku ji bav û kalên wan de derkeftiye û bîranînê zemanên borî di nava xwe de dihevine ji nû ve vejînin. Li pey ramana min ev ne tiştekî dijwar e, tenê gundî dixwezî navê xwe ji nû ve bistînin. Êdî tu astengî li ber wan nemane. Hîç nebe wisa dixuye. Ger gundî tiştekî nekin, wê kesek ji wan re tu tiştî nakin. Tu heqî kesî tune ku navê gundekî yan ji bajarekî biguhêre. Helbet navên cihan tên guhartin, le ne bizorbazî, ne bi zeverî, li ser pêvajoyeke demokratîk an şiyangelî tên guhartin. Navê gundê hanê jî wê bê guhartin, lê dewleta tirk bi darê zorê ev nav li gund zeliqandiye û tu kes nikare xwe jê bifilitîne. Ev derawayê hanê nayê pejirandinê.

Kesek vê yekê pejir û pesind nake.

Lê belê ew xalê ku ez têngihîştîm ev e ku çima tiştê kurdan ew qes herzan e û bi hêsanî ji wan tên dizîn û tarac û tartale kirin? Çima kesekî negot em navê xwe danayin "Atkafasi". Çire kesekî serî hilneda û negot ku ev xoretî nayê paşguh kirin? Çima kesekî negot eger em navê xwe biguhêrin jî jixwe wê em ê bi-

kin "Celikan"? Çima kesek li hem- bere vê dek û firîwtiya dûgela tirk derneket? Bira kesek neangêşe ku ev ji tirsan xofa û qurfa dûgelê tê. Ev kirû vê rewşa sosret venapas e.

Em dişin bibêjin merc û hoyên berê gelek zever bûn û dewleta tirk zordest bû, bi tundî û tûjiyê bersîv dida û jiyana merivan xeter digefand. Lê belê îro çima kesek nabêje em vê xomama navê gundê xwe ji navmiyanê hilbihênin û sosret û şewleleya ser navê Celikan, ne Atkafasî yan jî Yeşilyurtê venûxêvin. Hun werin hekmeta Xwedê binêrin! Ji ber kîjan tirs û sawê ye ne kifş e. Bi rastî jî tu çalakî û berhilîstinên tebatî û lebatî ne fer in. Divê gund tenê bibêjin; qay em mirine ku navê xwe ji nû ve nestinin, ma çima? Ev

navê me ye, em çî dixwezîn bila bi me ra ew bê bilêv kirin.

Ji bo vê mirov dikare bi dirûşmeya "*navê gundê xwe dixazim, aniha!*" nefergeliyekê li dar bixe û dadnasek hilspêre, navîşan bipergihîne. Vê nefergeliyê bi riya navgînên civakî li gitiyê jî bibelêve.

Bel e ku ew nefergeliyek wisa di nava kurdan de dibe embazek ve-kurdandîna nav û nîşanên welatê kurdan.

Ev kar ev qes hêsan e.

Ji vî karî re ne egîdek, ne mêrxasek, ne jî lewendek weç e, berevajî tenê mirovinên asa, heyidî û hinekê jî bîsteh divên.

Ka ev mirovên bîsteh li ku ne ?

Ferheng:

Heyist: heyî, hebûn

Koş: têkoşîn, hewldan, berxwedan

Xiroş: qêrîn, gazîn

Xore: hûr, biçûk, pest, nizim

Hêma: nîşane, sembol

Hilsengandin: nirxandin, qîmetdan

Dawer: sîmge

Direfş: ala, sancaq

Zom: herêm, cihê ku eşîr lê konê xwe vedidin

Gelhe: şênî, nifûs

Derkenar: anekdot

Xwemal: resen, orijîn
Hoz: eşîr, êl, xêl
Lecandin: niqaşkirin
Gengenşandi: niqaşkirin
Rewend: koçer, nomade
Xwedêgiravî: goya, devalêk, sözde
Kabra: herif
Şalûz: yaxcî
Mustebîd: zorbaz, tîran, diçtator
Buruntî: tapû
Direfş: sancak, simge, sembol
Weç e: fer e, gerek e, lazim e, divê, pêwîst e
Çespandin: tatbîq kirin, îfa kirin, çêkirin
Firîwtî: dolandiricilik
Firîw: dolandirici
Kirû: vakia
sosret: ecêb, seyr
xomam: bûx, dûman
embaz: nimûne, mîsal
şimşat: tîp
dûgel: dewlet
Belam: lêbelê
Evrax: yokuş
Peytandin: tespîtkirin
Pergar: krokî

Bêhempa: bêemsal
Lec: niqaş
Gelacî: fesadî
Misoger: muhakak
Herzal: kesin
Dukar: riwayet
Tomarkirin: qeyd kirin
Bişaftin: asîmîlekirin
Şiyankarî: iktidar
Peşarî: siyaset, ramiyarî
Çaplûs: yalaka
Werçerx: dewr û dönem
Merx: Dara Merxê, ardiç agaci
Bisteh: cesûr, wêre
Heyidî: siradan
Tartale: jenosida kurdan, qirkirina kurdan nemaze ya dêrsmiyan
Tarac: talankirin
Şiyangelî: demokrasi
Berhilîstin: dîrenîş, berxwedan, berevanî, xweparasatin
Tebatî: pasîf
Lebatî: aktif
Stûbarî: mûkellefiyet
Tavilê: derhal, tavnera
Minho: alinti, tekst
Durxane: încî atolyesî

XEWA ŞEVÊN SERPAS

Xizan Şîlan

li nav bagera xewa şevên serpas
xemgîniya tîrêjên rojê
pêşwazî dikim
saetên rojên kambax
ji kezebê dinalin
arzûyên noqarê dilê rezil
di kûrahiya deryayê de
têkçûn
zewq û şadiya biharên rengîn
li ber bayê felekê
berba bûn
şewqa stêrka gelawêjê bi stûxwarî
dibirîqe
min
kilîda dergehên bihuşta xeyalan
bi sîngê şevşevokên dirinde ve
daliqand
sirrên ciwaniya salan
di keserên axa goristana bênav de
veşartin
ez
di malzaroka kovanên demê de
mezin bûm
li ber deriyê dadgeha bêdadiyê

xwe dispêrim siya hêviyên camêran
derd û kedera awirên xemkêş
li ser rûyê dilovanan
dihelînim
di axîna bilûra şivanan de
koşka şahiya şevbihêrkan
ava dikim
li xerîbiya zalim
perdeya dilê newêrek
diçirînim
encama bûyeran
di destpêka hestên kor de
dibînim
mîna çûkên azad
li ser keskesora welatê bindest
difirim
bi saya pêpelokên qencyê
ber bi fazîletê ve
hildikişim

2011-03-13

Stockholm

Roja gulanê

Seyfi Doğan

tê bîra te ew roja gulanê
baranê porê te yî reşî ku wek çemekî biharê
ku bi piştê te da diherikî şil kiri bû
û dilobên baranê yê guhangerm
bi ser levên te yê arzudar da xwûş dibûn
tê bîra te ew rojê gulanê
bayî başûr ji me re li firiskîyê azadîyê têxist
tê bîra te piştî baranê ezmanî qilîhêşin ku
îşteha me rakir ser lingan
cîvanîyê bi eşqê koç kirîye
cîvanîyê bi hêvîyan xemilandî ye
cîvanîyê bi serhildanê dewlemend e
berde
ma
ba û baran te hêmbêzke û maçke
berde
ma
eşqê dilî te yî germ xwe li dunê têbipêce.

Kilama Elê Hecî

Bavê Lezgîn - Evdî Hesqera - Ezman B

Elê Hecî ji gundê Xelika Qerejdaxê yê Kulu/Quleka Qonyê bûye. Kilama ku li ser wî hatiye gotin me ji sê kesan berhev kir: Kesê ewil Mehmê Xelî Mala Atikê, xwarziyê Elê Hecî ye. Ya duyem Elika Mala Sêdile, ya sêyem jî Sebîheya Mala Sêdile ye. Ev her sê kes jî ji malbata Elê Hecî ne. Wan jî kilam, ji devê mezinên malbatê jiber kirine.

Elê Hecî ji Mala Milosmanê Mestê bûye. Ele Hecî, Lawê Heciyê Milosmên, biraziyê Sêdile bûye. Elê Hecî di navbera salên 1903-1931ê de jiyaye.

Milosmanê Mestê û birayekî xwe li Xelikê Qerecdaxê, du birayên wî jî, li Cutkê Bozanê bicih bûne. Du lawên Milosmanê Mestê hebûne. Yek ji wan Heciyê Milosmên, yê din jî Sadileyê Milosmên bûye. El û Osman lawên Hecî bûne.

*Mala Elî mi Mala Mîr e
Berda kanî ye, paşda bîr e
Le li vê derê tewên Kûçûk Elî Efendi
[Li] qeza Enqerê, Haymanê de
Kûçûk Elî Efendi buyuk multezîr e*

Kilama Elê Hecî ji devê diya wî Husna Hec'elî hatiye gotin. Husna ku hîn zarok bûye, bavê wê hewî aniye ser diya wê. Êşa Husne ya yekem ev bûye. Ya duyem birayê wê Şêxê Hec'elî li Çanaqqaleyê şehîd ketiye. Birayê wê yê din; Xatib korocax miriye. Ev jî bûye êşa wê ya sêyemîn. Lawê wê Elê Hecî bi ciwanî miriye. Ev bûye êşa wê ya çaran. Ê herî dawî jî, lawê Elê yê biçûk Xellê jî di heft saliya xwe de jiyana xwe ji dest daye. Ê li ser van hemû derdan Husna heta dawiya emrê xwe bi êşên giran kemiliye û bûye şareyeke jêhatî.

Di kilamê de behsa herêma Haymanayê tê kirin. Wê çaxê gundên herêmê bi Haymanayê ve girêdayî bûne.

Bi qasî ku me berhev kir kilama Elê Hecî wiha ye:

Wextê kû pirtîyê¹ Malê Îdî Elî Bêzê hate dîzîne
Mihecîran li çiyê banê hev kir
Go: Lo kurno birevin, lawkê malê Milosmênî bi çûk î tê
Xofê xwe ê mîna xofê Ezrêîl e²
Bejnê Elî mi telayê hêcîrê
Ma birusta ji gomê wê va li ser devî bîrê

Mi go “Elo bes e, were cî bile yawrim
Go “Etê ez çir bikim, hundirê mi hat xwarê, bi dozde gunda bi tehşîrê
Osman Efendi tê bi Xwedê kî, bi qurşînekê li min xîni
Ku hîngê arî kezewê min vemire...

Bejnê Elî mi telayê rizê
Ê îşqîn daye ji gomê wê da teruzê
Wûnê bi Xwedê kin olçêkê bişînin Kaniyê Osmên
Ka Elê mi tune li cem baltûzê?
Rawin olçêkê bişînin yaylê Malê Atikê
Ka Elê mi tune li ba xwayîngê
Lo lo serê xwe hilîne ji vê xewê, ji vê domê

Te çi eniya mi daye lawê mera, pişta mi daye komê
Te şeş meha pêş da arê cixara xwe vemirand
Te bi kezewê diye da na, daqimê [qelûn] somê

Ew çi şitila, kû mi şitiland
Hespê Elê li Çemî Kostangîlê³ ratewiland
Wextê kû gotin “Keçê! Pismamê malê bavî te yekê çîng e
Bê, mala bavê mi şewitand, yûkinê bavê mi xeland

Hespê Elî min î nêr e
Î diçêre li ber malê, min î girêdaye bi dûx-hefsêr e
Keçê herin li etrafê, ji hev ra kat kin
Bê[ji]n bûkê bî ye, xwesîyê bi mêr e...

1 Pirtî: Tiştên malê yên wekî xalîçe, zêr û hwd.

2 Li gundê Qerejdaxê mihacirên Serhedî tiştên Mala Îd(rîs)ê Elî Bêzê diziyane. Gava Elê Hecî bi ser wan de çûye, tirsîyane û reviyane.

3 Çemê Kostangîlê sê-çar kilometreyan dûrî Qerejdaxê, li gundê Teteran e.

*Ew çi îş bû ew çi îş bû
Çîpa ku Elê mi li ser, eltrîka xwe parlemîş bû
Yûzbaşiyê ser Elê mi
Digo: Qonyali Elî Yalinqiliç çing î sûr bû*

*Ew siwek e ji siwe [sibê] zû tê
Dengê Elî mi li hewşiyê çîte, li nav qirên [pez] tê
Rehmê⁴ min çima nawe qurbana pî mawzerê
Zexê Sêdile⁵ qurban e, keklîk perçemak⁶ çi rind lê tê*

*Lo lo yawrim mere, ma Etik bi te gihê
Destî xwe bavême caxê dêst û êtege
Wextê ku Elî minî li Qonyê, ser dêpo bû⁷
Hecî Ehmedî Qertê digo “Va çi lawkî biçûk e
Min têr nexwar ji lîsanê, ji qonişmegê
Ji gomê wê de şûna xermanê
Tavik berfê dayê bi baranê
Keçkê! Rehmê Bulduq tu here ji Zêwê Îdê re bêo
Bê: “Heqsiz, çoyî xwe bişkêne
Tu nabînî tu emsalê Elî mi tunen li ûlkê û cihanê...”*

*Bejnê Elî mi dara memaxê
Ma birûsta ji gomê wê da, li wê aralixê
Gundo qe nek Elê mi miriye,
Î li yayla Malê Oskê, li ba baltûzê...
Mihî Hemê go Elî Efendi tu çir dikî?
Go welle Miho a minê êdî derbas bûye
Ma Xwedê bi we de beden saxlixê...*

*Lo lo ji kaniyê wê da rê yêk e
Lo heqsizo tu rabe merasî xwe di pê ke*

4 Xwişka Elê Hecî ye.

5 Dotmama Elê Hecî ye.

6 Keklîk perçemak: Cureyekî şhkirina perçemê

7 Wî zamanî kesên dewlemend eskerî nedikirin. Pere didan dewletê lê tene rojekê li ber depo nobet digirtin. Elê Hecî ji wisa kiriye. Bi Ehmedê Mala Qertê ve eskerî kirine. Ew kes xizmê siyasetmedarê Kurd Atilla Kart e.

Dibên Îde Elî Bêzê î tere Istembolê

Tu heqî atalixiyê xwe eda ke...

Malê Elî mi mala Mîr e

Di ber da kaniye, di paş de bîr e

Ê li vê derê dibêne Elî Efendi

Ê li Haymanê dibêne miriye Elî Efendi, baş tehsîr e

Etik bi qurbano ev sibe ye, bîna bê tê

Dengê Elê mi li hewşiyê çîtê, li nav qirên tê

Mi go Zexê Sêdîle çima nabe qurbana kêleka porenîke[tabance]

Elê Miçê çima nabe qurbana kosteka seetê

Ez bi Rehmê xwe ve çima nabin qurbana omiza sîlehê

Ez bi Rehmê te va bi qurban bin, hurba zabitlixê çing rind lê tê

Ez bi qurbana canê Elî xwe yî ku min kire binê erdê

Yawrim yawrim li dê..

Ro helatiye rû hîva berana

Şewqa xwe daye dûwarê Elê min, oda mêvana

Xocî Malê Bêrêyî zalim, zalim bimîne

Wextê ku Elî mi da ser darî tehsêrê

Eza sê cara dorê ra çex bûm, tu qisûr-mane min nedî li canê gewr e

Xuneke sor ê meyiye li dev û didana...

Çerlî hatî [hesp] Elî minî nêr e

Hûn girêdin li pêş malê Etik bi qurban biyo, bi dox-hefsêr⁸ e

Ê li gunda, li goça bani hev dikine

Dibêne: Mala Elî Efendi bûk ê bî ye, xasî ê bi mêr e...

Bê çerlî Elî minî demîrçîr e

Etik bi qurban biyo zîn û zengiyê ji bêqir e

Wextê ku mêrkê Çerkez hatin odê malê Elî Bêzê derva kirin

Li çiyê bani hev kirin, go:

Hevalno werin em birevinî

Va siwarî ku tê, xofê xwe ê mîna xofê Ezreîl e...

⁸ Kosteka ku dixin du lingên hespan e.

*Ji sê mala, malê Elî minê baş e
Etik bi qurban biyo, hevrîngê di dest qusêsiya da ê weke aş e
Keçke! Rehma minê, wextê ku tu çûyî Malê Atikê, minete îşê xwe li te kirin
Bê: Bêxûtno ji min dûr herin, qol û qenatê mi şikestine
Daxa dilê mi qardaş e...*

*Ji sê mala, malê Elî minê baş e
Hevrîngê dest qusêsiya da weke aş e
Ma li gunda banî hev kin
Birangê Rehmê [û] Osmên î miriye
Birangê Elê [û] Sêdile î xweş e...⁹*

*Go: keçke! Zêwa Xizirê, wextê ku tu çûyî wê derê
Tu bi Xwedê kê xweyng û birê minê delal ê li wir in
Ma ji Elî mi ra dawestî li selamlîxê, yawrim yawrim...*

*Tila tila Elê min tila
Çer lêhatê Elî min jêr va têye, yan dikule
Go, Osmanî Xellê¹⁰ tu bi Xwedê kê
Wextê ku tu çûyî gundî Cutka ji te pirs kirin
Gotin, delalî malê bavê te yekê çing e?*

*Bê, delalî malê bavê min emsalê Temir paşeyê Milî ye
Yawrim yawrim...*

*Stêrk li rûyê ezmana pîrr in, Etik bi qurban biyo, çil û çend in
Gîştik ê bi kostek in, bi sîlebend in
Hecî Malê Milosmên ji ber camiyê de hato, ku î digriyo¹¹
Mi go, heqsîzo çima tu digirî?*

*Go keçkê! Te dî ku malê 'Umê li mi çi kir
Wan dengê sîlehan di ser mi ra kir*

9 Ango Elê Hecî miriye lê bavê wî Heciyê Milosmên; birayê Sêdile û Elê î sax e.

10 Osmanî Xelê, pismamê bavê Elê Hecî ye.

11 Mala 'Umê pismamên Husna Hec'elî ne. Malbata Milosmên xalanên wan in. Dotmama Elê, Zexa Sêdile bûka wan e. Lê dev ji mêrê xwe berdide. Dihere bi birayê Zêwa Îdê re dizewice. Mala 'Umê jî ji qehra wê re, di daweta xwe de li daholê dixin, tîfîngan diteqînin. Bavê Elê bi vê yekê diêşe û digirî. Husna jî bi vê bendê li ber dilê mêrê xwe dide û gazinca ji malbavanên xwe dike.

*Mi go lo bêxûto, tu çima xwe pê dêşînî
Tu nizanî ku ew gîştik li erdê Elî mi îzbend¹² in...
Hestirkê li rû ezmana çel û çend in
Yek kosteka bi mermend in*

*Malê 'Umê li dolê hatin ber malê Asiyê, li dolê xistin
Law qurşînê xwe di ser mi ra avêtin
Mi go: Xage xagno! Wûn gî li erdê Elî mi îzbend in...*

*Lawo li dê, lawo li dê
Dê bimire, dê di erdê
Çima nabime qurbana roka ku li malê apê, li paş perde¹³
Ku dê bimire, dê di erdê
Ku canê Elî minî gewr kirine erdê...*

*Çemê Tetera bişewite yawrim çoleke dûz e
Pozê Qerecdaxa xopan bi ser de xûz e
Rehmê minê dibê; anê çima tu li şûnê bavî mi nemirî?
Bavî minî bi qolincî, bi juniyê dûz e, yawrim yawrim bi juniyê dûz e...
Çem e çem e Elê mi çem e
Mehîn diçêre, cahniyê li cem e
Xocî malê Bêrêyî zalim, zalim bimîne
Wextê ku Elê mi da ser darî tehsêrê
Eza sê cara dorê ra çex bûm, tu qisûr mane mi nedîn li canê gewr e
Elî minî hîn î bi Awrupayî perçem e...*

*Te çi ez usan kirime Etik bi qurban biyo ji vê xewê, ji vê domê
Dengê nêne mino li serê çiyê Enqerê ji guregura qamyona, ji renga rengê
Î ki Etikê xwe qurban biyo, çi iro dozde ne te eniya mi daye cimeatê
Ji dest Elî mi ketiye daqimê somê*

*Bejnê Elî mi telaye rizê
Ma birûsta ji gomê wê da, li wê dûzê*

12 Îzbend: Pezê jar û nexweş.

13 Li gorî edetên Kurdên Anadola Navîn bûkê ji şefeqê de ji mala bavê siwar dikin û tînin li mala ciranekî zavê peya dikin. Heta êvarê bûk li wir dimîne. Di daweta Elê de ji bûk li mala apê wî yê Sadile maye. Ev bend behsa wê rojê dike.

*Gundo qe nek Elê mi miriye
Î li yayla Mala Osmanê Elî Bêzê, li ba baltûzê...
Va siwarana heke hek e
Siwarê diholê malê Elî Bêzê derketin tek bi tek e
Eza çima nabime qurbana wê royê
Ku bûk bi zêve va çûne diholê malê Elî Bêzê
Lawkê xalkî min Eptilê Malê Hemzê
Go, xwarzê tu bajo duwarê odê mino
Tu yî zayîf î, li xwe ke yamçiyê mino...¹⁴*

*Helatiye hîva berana
Şewqa xwe da oda Elî minî mîvana
Ez hatim Osmanê min piyê xwe ê di ber xwe va kirine heta enîşka
Go Etê Etê! Go, Et kor bibe, qol û qenatê minê şikestine
Piştbazê minî di nav ciya da ye*

*Ez sibe da çûm ku xwîneke sor ê meyaye li dev didana
Mi go wê mal şewitand li xwedana...*

*Çer lêhatê Elê min demirqir e
Zîn û zengûyê ji bêqir e
Ez hatim ku Osmanê minî li ber qêpi rûniştiye
Mi go, qurşînekê berde mina
Ka alafê canî Elî mi venamire...
Yawrim yawrim yawrim li dê...*

*Ew çi şitila ku şitiland
Çer lêhato Çemî Çerkeza ratewiland
Ela Xelê! Li gundê Cutka ku gotin, Va mirî malê bavî te yekî çing e?
Wî yekûna mala bavê mi şewitand
Çira du gunda, wî vemirand...¹⁵*

14 Heckûşê Malê Îdê ji bavê de birayê Zêwê ye. Elê Hecî û jina xwe diçin daweta wî. Ew diçin Xelkê Doldirme ku bûkê bînin. Eptilê Malê Hemzê jî ji Doldirme ye. Çaxa ew tê şîna Elê Hecî, Husna Hec'elî bi van gotinana kilamê li hev tîne. Navên ku di kilamê de tînin gotin, ji bo qîmet-dayîna mêvanan hatine gotin. Bi vî awayî şare qedra mêvanan didê.

15 Ela Xelê dotmama bavê Elê Hecî ye. Ji gundê Cutka ye.

*Elî mi go Etê ezî ku herime Malê Kekê
Çer lêhato ê li ber malê girêdaye bi yan kostekê
Osmanî Xelêo tu çima çûyî
Însanê sê mala li Elê min civîn
Yekî bi şa nekir ku çex ke li ser kêlekê...
Li dê yawrim li dê...*

Ji Elê Hecî bi şûn de lawê wî Xelê Elê jî miriye. Ev bend Zêwa Îdê li ser Xellê Elê gotiye:

*Li min wê da, li te wê da
Xelik, ez a bûma Erebeke jî Erebe geçî walî qotik bi pi da
Xelik (lawo) te mala mi şewitand
Mala mezin anîn li mala biçûk qelivandin¹⁶
Ev bend jî Husna Hec'elî li ser Xellê Elê gotiye:*

*Ê helatiye hîva berana
Şewqa xwe da oda Elî minê mîvana
Ji Elê mi da tişt neşehitî
Xellê mi xeland sêrê kûlûna¹⁷*

Piştî ku Elê Hecî mir, nexweşiya jina wî Zêwa Îdê jî giran bûye. Birayê wê Mehmedê Îdê, xwişka xwe ji bo ku lê binêre biriye mala xwe. Li zozana Mala Mihtopolê jê re xaniyek ava kiriye. Ew li wir bicih kiriye. Çûyîna Zêwê li Husna Hec'elî pirr bi qehir hatiye. Lê Zêwê dîsa jî nefilitiye. Husna Hec'elî ev bend jî li ser vê meseleyê gotiye:

*Zêwê min ji xanima, xanima Bursê
Dev û didanê Zêwê min ê tev dibrûsê
Şûkir Îdî Elî Bêzê¹⁸ a te nehat şûnê
Zêwa min di dest te de bû awa¹⁹ asê*

16 Osmanê Hecî birayê mezin bû. Ji ber ku zewicîbû ew jî malê cihê bûbû. Mala Elê di nav mala bavê de bû. Piştî ku Elê Hecî mir, mala Osmên anîn tevî mala bavê kirin. Ev bend li ser wê hatiye gotin.

17 Kûlûn: Cihê ku cihêzê bûkan didin ser.

18 Kesê ku Zêwê dibe, birayê wê Mehmedê Îdê ye. Lê di vir de wekî ku Îdê bi xwe Zêwê biribe hatiye gotin. Ev şaş e. Lewre Îdê Elî Bêzê beriya mirina Zêwê çûye Stenbolê û li wir jiyana xwe ji dest daye.

19 Awa asê: Nêçîr ango seyda dijwar.

Gelkujîya ermenîyan gelkujîya êzdîyan jî bû

Xwezî kurd di hindava dijminên xwe da wek ermenîyan bûna...

Têmûrê Xelîl

Îro salvegera gelkujîya ermenîyan e li Împêratorîya Osmanîyê. Wek tê gotin, ew gelkujîya here mezin e li cihanê. Piştî wê gelkujîyê heta roja îro tu ermenîyekî negotîye, ku ew û tirk birayên hev in. Wana xwe ji tirkan şuştin û ji ber wê jî pêş ketin, ji ber wê jî cihan di wê pîrsê da pišta ermenîyan digire û tirkan sûcdar dike, gelek welatan ew bûyer qebûl kirin wek gelkujî. Hîç kurdekî êzdî jî heta niha negotîye, ku em û tirk birayên hev in (ew jî di gelkujîya ermenîyan da ketine ber devê şûrê tirkan), ji ber wê jî di hêla çand û edebîyeta kurdî da li cihanê deng dane. Ermenîyan û kurdên Ermenîstanê bi hev ra gotine em cînarên hev in, em dostên hev in, em xêrxwezên hev in, em hevalên hev in, lê hîç caran ji hev ra negotine, ku ew birayên hev in. Ji bo wê jî herdu millet bi serî xwe pêş ketin. Herwiha ermenîyan hîç caran ji me ra negotine bibe ermenî, an jî were ser dînê me, çimkî dînê me heq e. Ji ber ku gotineke wisa di hindava hemû milletan da heqaret e. Lê bo çi

îro bi mîlyonan kurdên bakur xwe heyrana bavkuştîyên xwe, zevtkarên welatê xwe dikin, ev yek nakeve serê ermenîyan û kurdên êzdî?

Îro gelek kurd jî wê rojê wek Roja Gelkujîya ermenîyan dibînin, xemgîn dibin, nivîsan belav dikin. Ya ecêb jî ew e, ku tu kes bîr nayne, ku di wê gelkujîyê da bi hezaran kurdên êzdî jî hatine qirê. Bi awayekî din, ew qesabxaneya ku Tirkîyê berî zêdeyî 100 salan saz kir, ne tenê di hindava ermenîyan da bû, lê dijî hemû gelên ne musulman da bû, di nav wan da êzdîyan jî.

Ermenî ne tenê heta îro jî bi tirkên hov ra dijminayê dajon, lê herwiha her firsendek bi kar anîne bona bi her awahî heyfa xwe ji tirkan hilînin. Ev gotara han ya bi sernivîsara “Heyfhildan” ya nivîskarê rûs Pavel Şêxtman, ku min ji rûsî wergerandîye kurdî, derheqa nimûneyeke wê heyfhildanê da ye, ku çawa ermenîyekî welatparêz yek ji mirovên sereke yê di gelkujîya ermenîyan da gunehkar – Talat Paşa kuştîye û hatîye efûkirinê.

HEYFHILDAN

15ê adarê sala 1921ê li Berlînê, li kolana Hardenberg-strasse, mirovekî kincên germ lê, lihevhatî derketibû seyranê. Ji nişkê va yekî qirme danî ber qirka wî û gulle berdayê. Ew mirovê qerase qirçilî, bû repîna cendekê wî, ket, li erdê vegevizî, di xwînê da mewicî û can da. Mirovên der û dorê êrîşî xort kirin...

Xort bi almanîyekî şikestî kire qêrîn: -Ez ermenî me, ew tirk e, tu zirara almanan di vî karî da tune.

Ew dane ber derban û birine polîsxaneyê.

Zûtirekê mehkemeya Soxomon Têylêryanê 25 salî kirin. Ew bi kuştina wezîrê Tirkîyê yê berê Talat Paşa dihate gunehkarkirin.

-Gelo hûn xwe gunehkar dibînin? – dadwer jê pirsî.

-Na,- Têylêryan got û di ser da zêde kir, -ez xwe gunehkar nabînim, ji ber ku wijdana min paqij e. Min mirovek kuştîye, lê ez xwe mirovkuj nahesibînim.

Wezîrê karên der yê Tirkîyê, yê berê Talat paşa wek karmendekî postexaneyê dest bi karê xwe kiribû. Ew di dema Ebdulhemîd da bû, ku navê "Sultanê xwînxwer" lê kiribûn û di dema dewrana zêrandîna hovane, fanatîzma sedsalên navîn

û qirkirina xaçparêzan da bû. Talatê genc dikeve nava rêxistina surîya contirkan "Ittihat ve Terakî" (Yekîtî û Pêşveçûn). Wî digrin û sirgûnî Makedonîyayê dikin. Li wir ew dibe organîzatorekî wê serhildana ku contirk bi saya serê wê di sala 1908an da hatine ser hukum. Sala 1909an dibe wezîrê karên der.

Şoreşa sala 1908an bû cejineke bi heytehol. Te digot qey li Tirkîyê dewraneke nû dest pê dibû. Dewsa mirovên berê yê hov, mirovên dema nû û pêşketî hatin. Li ser alayên wan "Azadî, wekhevî, biratî" hatibûn nivîsar. Milet digot qey dawîya zordestîyê, dijminaya dînî, şêlandin û şuhurandinê hatîye. Li her cîyan behsa wekehevtîya gelan dikirin. Li kûçeyan hemû milletên ji dînê cihê-cihê bi hev ra şa dibûn.

Lê, dema her tişt hate parzûnkirin û zelalkirin, desthilatdarên nû "wekehevtî" bi awayê xwe derc dikirin. Ber milletên mayîn (em destnîşan bikin, ku ew ji tirkan kevintir û medenîtir bûn) pêşnîyar hate kirinê, ku bi lez hemû dest ji milletîya xwe bikişînin û bibin "miletê osmanî". "Hûn dikarin dînê xwe biparêzin, lê zimanê xwe nîkarin", ji silavîyan û huruman

(yûnanî), ermenîyan û mexînan (aşûrî) ra dihate gotin.

Lê ne silavî, ne hurum, lo hela ne jî alban û erebên ku dîne wan û tirkan yek bû, qe jî nedixwestin dest ji miletîya xwe bikişînin. Û gava dest bi şerê bi Îtalîyayê û dewletên Balkanan ra bû, wana bi awayekî hêsa "xayîntî" ji "welatê xwe yê Osmanî" ra kirin. Împêratorîya sedsalên navîn, ku bi saya serê hovîtîyê xwe li ser text digirt, ber çavan ji hev diçû, difelişî... Çarneçar contirkan dest avîtine bîr û bawerîyên nû – Panturkîzmê.

"Osmanîyan" ji nişkêva diyar kirin (ji pirtûkên Ewropîyan), ku ew turk in (ne tirk), ji zureta koçerên ji berrîya "Tûrana Mezin". Destpêkirin pesin û payê mêrxasên "ji Tûranê" – Atilla û Cengizxan dan. Bi pêşketina xwe va wan turkan xwe li ser îngilîsan û firansizan ra digirtin. Îdêya wan a pêşin ew bû, ku Împêratorîya Panturkîzmê saz bikin. Sînorên wê digîhandine hetanî Monxolîyayê û Mançyûrîyayê, heta bê bigihîje Okêana Aştî. Bona pêkanîna vê armanca mezin gerekê Împêratorîya Osmanîyê bihata qewînkirin... Bi saya wê yekê, ku hemû miletên misilman bikirana turk, lê miletên ne misilman qir

bikirana. Wana xwesma diranên xwe li ermenîyan tûj kiribûn, wana xaçparêz wek "kula piçengê" didîtin û bi bawerîya wan, ermenîyan ne dihîşt turk bigihîjine birayên xwe yên Kavkazê û di alîkî va jî herdem firsend didane Ewropayê, ku tevî karên wan bibin. Biryara derheqa qirkirin û tunekirina ermenîyan da hela di sala 1911an da hate qebûlkirin (li kongrêya Salonîkê); tenê li benda firsendê bûn.

Û dest bi şerê hemcihanê bû. Wisa xuya bû, ku xeyala tirkan zûtirîn wext wê pêk bê. Wana dixwest bi lez ermenîyan ji holê rakin. Lê berîya wê hewil didan wana bi kar bînin. Hema di rojên şer yên pêşin da endamên komîtêya "Itihat ve Terakî" li Erzurumê rastî serokên partîya ermenîyan "Daşnaktsûtyûn" hatin. Ber ermenîyan pêşniyar kirin: -Ermenî gerekê dijî rûsan serhildanê bikin û bi wî awahî alî tirkan bikin bona ew Kavkazê zevt bikin. Ber wê va tirk wê otonomî bidana ermenîyan. Ermenîyan ber-siveke ha dan: -Ewê erkê xwe ber "wetenê Osmanîyê" pêk bînin, lê wê dernekevîne dijî rûsan.

Bi vê bersîvê qedera ermenîyan hate biryarkirin. Biryara derheqa destpêka xezakirin-qirkirina er-

menîyan da li şêwrdarîya li mala Talat paşa hate qebûkirin. Rêvebirê civînê doktor Nazim bû, yê ku got:

”Ermenî wek birîna kêmgirtî bi xeter in. Pêwîst e bi lez kar bikin û çareyekê bibînin. Eger em hinek kesan ji wan qir bikin... ewê zirarê ji me ra bîne, ji ber ku bi wê yekê emê wan kesan hişyar bikin, ku em dixwezî di paşdemê da wana jî ji ser rîya xwe rakin. Ew ereb û kurd in. Gelê ermenî gerekê bi kokê va bê qirkirin, gerekê ji rûbarê cihanê hilînin, ku yek jî ji wan nemîne. Ez dixwezî li ser vî erdî tirk û tenê tirk bijîn û xwedî-xudantî bikin. Bira hemû gelên ne tirk bicehimin, herin, ji kîjan mîletî û ji kîjan dînî dibe, bira bibe. Dînê me hemûyan Tûran e”.

Belê, ”Sultanê xwînxwer” bi hovîtiya xwe va ber contirka ne tişteke bû. Wana qirkirina 2 mîlyon ermenîyan bi zanyarî û bikaranîna hemû destkeftiyên sedsala 20î dane organîzekirinê. Li bajaran tu ermenîyekî ne dikuştin, ku mirovên biyanî wê yekê nebînin. Hate biryarkirinê, ku xudêgiravî wê ermenîyan ”cîguhastî” cîyekî din bikin û di bin wê perdeyê da daxweza wan ew bû, ku wana kok-bir bikin.


”Mafê ermenîyan yê jîyan û karkirinê li Tirkîyê qedexe ye! – Talat derheqa vê yekê da ji hemû wilayetan ra têlêgram şand. –Hukumetê emir kirîye hîç zarokê jî di landikan da nehêlin”.

Şeva 24ê nîsanê sala 1915an li Konstantînopolê 600 ronakbîrên ermenî girtin. Gelkujî dest pê bû.

Haya Soxomon Têylêryanê 17 salî ji vê yekê tunebû. Ew bi wê hêvîyê çûbû Ewrupayê, ku li Ûnîversîteyekê bixwîne. Paşê, dema behsa qirkirina gelê wî dikeve guhan, dilezîne mal. Ew bi dijwarîyeke mezin va digihîje mala xwe ya li Erzîncanê. Û dibîne, ku mala wan hilweşandine û ji wî tenê kelefê mane. Paşê pê dihesa, ku ji 20 hezar ermenîyên deverê tenê 20 kes mane.

Ji wî ra gotin, ku di destpêka sala 1915an mirovxurek mîlet berevî meydana sûkê kirîye û ji wan ra ev fermana derheqa ermenîyan da xwendîye: ”Filan rojê hazir bibin bona we cîguhastî warekî din bikin. Pere û xemil-xîşirên xwe yên giranbuha dikarin bidine hukumetê, bona paşê bikaribin wana paşda bistînin”.

Sê rojan ser hev ermenî deste-deste terka bajêr dikirin. Cendirmeyan



û leşkeran berê ew dibirine Gelyê Kemaxê, ku ber devê Diclê ye. Li wir gişkan qir kirin.

Piştî sê rojan tu ermenîyek li Erzîncanê nema. Lê gelek ermenîyên din dianîn vî bajarî û berê wan didane wî gelyî... ”Zarokên ku nikaribûn rê biçûyana, qalpaxê serê wan dişkênandin, davîtine gêlî, li gundên ser riya xwe gundî dişêlandin û keç û jinan dişuhurandin”. –Ev gotinên cendirmeyekî tirkan in, ku ewî ji hemşîreyên nexweşxaneke Almanîyayê ya li Erzîncanê ra gotine. Paşê di mehkemeya Bêrlînê da van hemşîreyan şehadet dane. Wana derheqa wehîştîya tirkan da gilî dikirin û nimûneyek anîn, ku çawa jinebîyeke ermenî, ku hema bêje hişê xwe winda kiribû, dikire hewar-gazî: ”Em amade ne bib-

in misilman, em amade ne bibin alman, tenê me ji vê xezebê xilaz bikin. Ewê niha me bibine gelyê Kemaxê û li wir wê gewrîyên me jêkin”. Û gava alman mecbûr bûn ji bajêr derkevin, ewana xwe ji rê didane alîkî, ku desteyên ermenyan yên nû derbaz bibin:

”Di nav wan da çend mêr hebûn, yên din jin û zaro bûn, yên bi porên zer û çavên şîn û wisa guneh û bi dêmê aqil li me dinihêrîn, ku kizîn li dilê me dihat, dil-hinavên me tevlihev dibû. Hemû ermenî bi kindirekî dirêj va bi hevdu ra girê dabûn, ku paşê bikaribin wan bi hêsanî ji girekî bilind bavêjine çemê Ava Mezin, ku li rex besta Kemax Boxazê bû”.

Hurumeke (jineke yûnanî) porkuruşkî şirove dikir: ”Em di cîyê

xwe da bûne risas... Cendirmeyekî digot, ku berî çend rojan ewî komi-keke ji 3 hezar jin û zarokan birîye wir. Û gişkan jî kuştine".

30ê çirîya pêşin sala 1918an Tirkîye di şerê bi Rûsîyayê ra bi sosretî da der, ango têk çû. Serokên wan jî welêt revîn. Têylêryan tê Konstantînopolê bona derheqa mirovên xwe da malûmatîyan bi-hese. Û pê dihese, ku ji 84 mirovên wî tenê 3 kes jî wê qetilê filitîne. Ew, Mîsakê birayê wî û birazîya wî. Û wî çaxî fikirek dikeve serê wî: Celadê sereke bibîne û bikuje. Ew li Ewropayê ji welatekî diçe welatekî din û dû Talat digere. Û li Bêrlînê rast pê tê.


Mehkemeyê Têylêryan efû kir. Piştî girtinê Têylêryan yekser gotibû, ku bi taybetî hatibû Bêrlînê bona Talat bikuje. Avûqatan digotin, ku ew xwemukurhatin wî ber bi dardakirinê dibe (cezayê "kuştin bi zanebûn" îdamkirin e), lê wî karibû wisa bigota, ku ewî bin tesîra bîranînên tal û reş da ew kuştîye (cezayekî mezin nadine kuştineke wisa).

Lê Têylêryan li mehkemeyê çîrokek ji ber xwe va derxist û got, ku xudêgiravî ew jî ketîye ber devê şûrê tirkan, birîndar bûye û *xwe* cem kurdan veşartîye, xwe parastîye. "...*Ew kurd mirovên gelekî camêr û dilpak bûn, wana alî min kirin, ku ez derbazî Farizistanê bibim. Cilên kurdî dane min, ji ber ku kincên min hemî di nav xwîne da mabûn...*".

Evê yekê ermenî ruhdar kirin. Di navbera salên 1921-1922an da wana piranîya serokên contirka kuştin. Wezîrê Tirkîyê yê parastinê yê berê Enver Paşa, ku paşê bûbû serekê basmaçan, bi destî ermenîyekî di artêşa Rûsîyayê da hate kuştin. Soxomon Têylêryan, ku di nav miletê xwe da bûbû efsane, sala 1968an li San-Fransîskoyê mir. Lê hest-pestên Talat sala 1943an li Stembolê bi heytehol hatine binaxkirinê. Û hetanî niha jî navê Talat paşayê xwînxwer di nav wan mêrxasan da ne, ku Tirkîye bi wan serbilind e.

Belê, her welatek xwedî mêrxasên hinkûfî xwe ye...

Berhemeka nû ji weşanxaneyê APECê



”Ev pirtûk ji du beşan pêk tê. Di beşê yekem de ez li ser prosesa nivîsînê radiwestim û hewl didim ku ji hin çavkanîyên nivîskî û ji pratîka me girîngîya vê prosesê îzeh bikim. Herwisa ez di vir de behsa rewşa zimanê xwendekarên me û di perwerdeya zimên de feydeya bikaranîna tekstên xwendekaran dikim.

Têkiliyên zimanê piranî û hindikayîyê (eqelîyetê), merhaleyên prosesa nivîsînê, realîzekerîna vê prosesê û bikaranîna produksîyona nivîskî babetên din yê vî beşê ne. Ji ber ku pirtûk berhemek ji perwerdeya zimanê zikmakî yê Swêdê ye, ez li ser perwerdeya zimanê zikmakî hin agahdariyên kronolojîk jî didim.

Di beşê duyem de tekstên xwendekaran cih digirin. Cureyên (genreyê) tekstan ji hev cihê ne û herweha temenê ”nivîskaran” jî. Portre, gername, hevpeyvîn, çîrok, name, nirxandin û danasîna pirtûkan û vegotin yan novel cureyên nivîsên xwendekaran in.

... Armanc ji weşandina vê pirtûkê ev e ku ev tekstên otantîk yên xwendekaran di dersdayînê de mîna modelan bînan bikaranînin. Û ev model di prosesa nivîsînê de ji bo mînaqêşeyan bibin bingeş, îlaham bidin xwendekaran, wan teşwîq bikin û li ba wan prosesa hizirkirinê bîrê bixin.”

Ji pêşgotinê



Child and a Helicopter 20 x 16 inch, Canvas
Lukman Ahmed, 2013